

K.T.

Zanîngeha Mardin Artukluyê
Enstîtuya Zimanên Zindîyên li Tirkîyeyê
Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

**BERAWIRDKIRINA SÊ BERHEMÊN
RASTNIVÎSÎNA KURMANCÎ**

**(BINGEHÊN RASTNIVÎSÎNA KURDIYÊ YA ARIF ZÊREVAN -RÊBERA
RASTNIVÎSÎNÊ YA MISTEFA AYDOGAN- RÊBERA RASTNIVÎSÎNÊ YA
KOMXEBATA KURMANCIYÊ)**

Abdulsittar ÖZMEN
13711030

Şêwirmend
Doç. Mustafa ÖZTÜRK

Mêrdîn, 2019

TAAHHÜTNAME

TÜRKİYE'DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜ'NE

Mardin Artuklu Üniversitesi Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum “*Berawirdkirina Sê Berhemên Rastnivîsîna Kurmancî (Bingehên Rastnivîsîna Kurdiyê ya Arîf Zêrevan-Rêbera Rastnivîsînê ya Mistefa Aydogan-Rêbera Rastnivîsînê ya Komxebata Kurmanciyê)*” adlı tezin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve tez yazım kılavuzuna uygun olarak hazırladığımı taahhüt eder, tezimin kağıt ve elektronik kopyalarının Mardin Artuklu Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım. Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

- Tezimin tamamı her yerden erişime açılabilir.
- Tezim sadece Mardin Artuklu Üniversitesi yerleşkelerinden erişime açılabilir.
- Tezimin... yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezimin tamamı her yerden erişime açılabilir.

18/06/2019

Abdulsıttar ÖZMEN

KABUL VE ONAY

Abdulsittar ÖZMEN tarafından hazırlanan “Berawirdkirina Sê Berhemên Rastnivîsîna Kurmancî (Bingehên Rastnivîsîna Kurdiyê ya Arif Zêrevan-Rêbera Rastnivîsînê ya Mistefa Aydogan-Rêbera Rastnivîsînê ya Komxebata Kurmanciyê)” adındaki çalışma, 25.06.2019 tarihinde yapılan savunma sınavı sonucunda jürimiz tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilimi dalında YÜKSEK LİSANS TEZİ olarak oy birliği ile kabul edilmiştir.

Danışman : Doç. Dr. Mustafa ÖZTÜRK

Üye : Prof. Dr. Abdurrahman ADAK

Üye : Dr. Öğr. Üyesi Osman ASLANOĞLU

Yukarıdaki imzaların, adı geçen öğretim üyelerine ait olduğunu onaylarım.

Doç. Dr. Yunus CENGİZ

Mardin Artuklu Üniversitesi

Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü Müdürü

PÊŞGOTIN

Heta niha gelek pênaseyan zimên hatine kirin. Ji van pênaseyan ya herî ku tê zanîn ew e ku ziman amûra ragihandinê ye. Bi riya zimên mirov, hest û ramanên xwe parve dikin, kar û barê xwe sivik dikin û bo pêşerojê mîrasekê dihêlin, têkiliya navnifşî pêk tînin. Wekî gelek zimanan kurdî jî dabeşî çend zaravayan dibe. Herçiqasî lihevhatineke giştî li ser çendaniya wan nebe jî behsa çarên sereke tê kirin ku ew jî kurmançiya jorîn, kurmançiya jêrîn (sorani), goranî û kirmanckî (dimilî) ne. Mijara xebata me rastnivîsîna kurmançî ye.

Herwiha wekî ku tê zanîn kurmançî bi awayekî fermî nebûye zimanê perwerdehiyê. Heta ziman nebe yê perwerdehiyê jî pîrsgirêkên nivîsîna zimên zû biz û ji holê ranabin û nemaze ji aliyê dengnasiyê ve ev pîrsgirêk tesîrê li sazkirina ravekan û taybetiyên zimên (tewang, zayend) yên din jî dike.

Di mijara rastnivîsîna kurmançî de kêşeyeke mezin ew e ku li jorê hat behskirin. Nivîsa kurmançiya bi tîpên latînî di Hawarê de geş bû lêbelê bo zimanekî –nejixwe ku mirov bixwaze bingehek ava bibe- kovarek an du sê kovar gelekî hindik in. Piştî Hawarê jixwe heta salên heştêyî li Tirkiyeyê tu xebatên berbiçav yên nivîsîna bi kurdî nabin. Yên li ser rastnivîsînê jixwe qet nabin.

Piştî salên heştêyî Ensîtuya Kurdî ya Parîsê ava dibe û sala 1987an bi navê “Kurmançî” rojnameyekê diweşîne ku bi giştî bo rêzimana kurmançî bi taybetî jî bo rastnivîsîna kurmançî bûye mîraseke giranbiha. Helbet piştî wê jî çî li diyasporayê çî li Tirkiyeyê kes û saziyan xebatên curbicur meşandin.

Ev xebat jî yek ji wan e ku li ser rastnivîsîna kurmançî hûr dibe. Xebat ji du beş û destpêkekê pêk hatiye. Di destpêkê de li gel nêrîneke giştî li zimên û rastnivîsînê sînore xebatê tê destnîşankirin û mijar, armanc û girîngî û rêbaza xebatê jî tê pêşkêşkirin. Beşa yekem bo berhemên li ser rastnivîsînê hatiye veqetandin. Di beşa duyem de her sê berhemên mijara xebatê bi nimûneyan hatine berawirdkirin û nirxandinên ku ji paşxaneyê rastnivîsîna kurmançî sûd werdigirin, hatine kirin. Di dawiya her du beşan de encam û hin pêşniyarên me cih digirin. Xebat bi sedema ku berawirdkirina sê berhemên bi hûrgilî dike dikare bo kesên têkildar û lêkolîner bibe çavkaniyek jî.

Bo vê xebatê pêşî ez spasdarê Dr. Ramazan Pertev im ku berê min da xwendina masterê û cesaret da min. Dr. Necat Keskîn, her kêlî her saet karê min anî bîra min, belkî ne ji wî ba ev xebat nebûya, ez bo wî jî spasdar im. Siyabend Aslan û M. Ali Erol û Samet Doğan derbasî kompîtûrê kirin lewra min bi destan nivîsî, sed carî mala wan ava. Kenan Örmek bi sererastkirin û xwendina xebatê gelekî alîkariya min kir, spasiyek bo wî jî Spasiyeke taybet bo şêwirmendê min Doç. Dr. Mustafa Öztürk ku bi vê xebatê serê xwe êşand û rê û rêbaz nîşanî min dan. Spasiyek bo hevsera min Demet, lawê min Ronî û keçika min Lorîn jî. Ev xebat diyarî ye bo wan.

Abdulsittar ÖZMEN

Mêrdîn, 2019



KURTE

Ev xebat dixwaze sê berhemên kurmancî yê li ser rastnivîsînê berawird bike. Rastnivîsîn bo standardîzasyonê xwedî roleke sereke ye. Derbarê vê mijarê tevliheviyek heye ku serê nivîskar û xwendevanan diêşîne. Helbet derbarê vê mijarê xebat hatine kirin lê berhemên mijara xebata me “Rêbera Rastnivîsandina Kurdiyê (kirmancî)” ya Arif Zêrevan, “Rêbera Rastnivîsînê” ya Mistefa Aydogan û “Rêbera Rastnivîsînê” ya Weqfa Mezopotamyayê ne. Ji bilî berawirdkirina berheman mijarên ziman û girîngiya zimên, zimanê nivîskî, zimanê devkî, zimanê standard û hwd jî cih digirin.

Bêjeyên Sereke: Rastnivîs, ziman, standardîzasyon, zimên, Aydogan, Komxebat, Zêrevan.

ÖZET

Bu çalışmayla amaçlanan Kùrtçenin Kurmanci lehçesinin yazımını konu edinen üç eserin karşılaştırılmasıdır. Yazım, dilin standartlaşmasında önemli bir yer tutuyor. Kurmanci lehçesinde bu konuda büyük bir karışıklık vardır ki yazıyla ilgili kişiler için sorun yaratmaktadır. Elbette bu konu hakkında birçok çalışma vardır ancak bu çalışmada Arif Zêrevan'ın “Bingehên Rastnîvîsandina Kurdiyê/kirmancî (Kùrtçe Kurmanci Lehçesinin Yazım Temelleri), Mistefa Aydoğan'ın “Rêbera Rastnivîsînê (İmla Klavuzu) ile yine bir komisyon tarafından hazırlanan ve aynı ismi taşıyan Mezopotamya Vakfı (Weqfa Mezopotamyayê) çalışması konu edinmektedir. Çalışmada eserlerin karşılaştırılması dışında, dil ve dilin önemi, yazım dili, standart dil vb yer almaktadır.

Anahtar sözcükler: Yazım, dil, dilin standartizasyonu, Aydoğan, Komxebat, Zêrevan.

ABSTRACT

The aim of this study is to compare the three works on the Kurmanci dialect of Kurdish. Spelling plays an important role in the standardization of language. There is a confusion about this issue in the Kurmanci dialect, which creates problems for people who are interested in writing. Of course there are many studies on this topic, but subjects for this study are Arif Zêrevan's Basics of Kurdish Kurmanci Dialect (Bingehên Rastnivîsandina Kurdîyê/Kirmancî), Mistefa Aydogan's Spelling Guide (Rêbera Rastnivîsînê) and the Mesopotamia Foundation (Weqfa Mezopotamyayê) work which was prepared by a commission and carries the same name. Apart from the comparison of the works, the importance of language and language, writing language, standard language etc. are included in the study.

Key Words: Spelling (orthography), language, standardization of language, Aydogan, Komxebat, Zêrevan.

İÇİNDEKİLER

PÊŞGOTIN	I
KURTE	III
ÖZET	IV
ABSTRACT	V
DESTPÊK	1
1. Mijara Lêkolînê	8
2. Armanc û Girîngiya Xebatê	9
3. Sînorê Xebatê	9
4. Rêbaza Xebatê	9
BEŞA YEKEM	11
DANASÎNA BERHEMÊN RASTNIVÎSÎNÊ	11
1. DANASÎNA BERHEMÊN RASTNIVÎSÎNÊ	12
1.1 Bingehên Rastnivîsandina Kurdiyê (kirmancî)	12
1.2 Rêbera Rastnivîsînê ya Mistefa Aydoğan	13
1.3 Rêbera Rastnivîsînê ya Komxebata Kurmanciyê	14
1.4 Hin Xebatên Din Yê Rastnivîsînê	17
1.4.1 Bingehên Gramera Kurdmanciyê	18
1.4.2 Kürtçe Gramer (Rêzimana Kurdî)	18
1.4.3 Rojnameya Kurmancî	18
1.4.4 Kovara Bergehê	19
1.4.5 Zimanê Kurdî/Rênivîs	19
1.4.6 Rêzimana Kurmancî	19
1.4.7 Rêzimana Kurmancî	20
1.4.8 Destpêka Rastnivîsa Kurdî	20
1.4.9 Waneyên Rêziman û Rastnivîsa Kurmancî	20
1.4.10 Dersên Hînbûna Rêzimana Kurdî (Kurmancî)	21
1.4.11 Rastnivîsîna Kurdî	21
BEŞA DUYEM	22
BERAWIRDKIRINA SÊ BERHEMÊN RASTNIVÎSÎNA KURMANCÎ	22
2. BERAWIRDKIRINA SÊ BERHEMÊN RASTNIVÎSÎNA KURMANCÎ	23
2.1. Alfabe	23
2.2 Kîtekirin	25
2.2.1 Kîtekirina peyvên sade li gor prensîba yeknedengdêrî	25

2.2.2 Kîtekirina peyvên sade li gor prensîba movika bêjeyan.....	26
2.2.3 Kîtekirina bêjeyên hevedudanî	27
2.2.4 Cihê ku kîtekirin lê nabe.....	27
2.3 Navê Bajarên Kurdistanê.....	28
2.3.1 Bajarên Kurdistana Bakurî.....	28
2.3.2 Bajarên Kurdistana Başûrî.....	29
2.3.3 Bajarên Kurdistana Rojhilatî.....	29
2.3.4 Bajarên Kurdistana Başûrê Rojavayî	30
2.4 Navên welat, paytext û yekîneyên pereyan.....	30
2.5 Navên gel/netewe û zimanan	31
2.6. Navên Hêlan.....	32
2.8 Navên Demsalan	34
2.9 Navên mehan	35
2.10. Tîpa Ducare	37
2.10.1 Tîpa ducare di kurmançî de.....	37
2.10.3 Tîpên ducare yên bêjeyên ji zimanên ewropayî	38
2.10.4 Rewşên ku divê rehmoformên bê parastin.....	38
2.10.5 Gava ku ji du bêjeyan bêjeyeke hevedudanî bê çêkirin.....	38
2.10.6 Nivîsîna navdêrên lêkerî û tîpên ducare	39
2.11 Nivîsîna bêjeyên ku bi “-stan”ê tên çêkirin.....	39
2.12 Pirsê bêjeyên ku bi “i”yê dest pê dikin û bi “î”yê diqedin.....	39
2.13 Nivîsîna hin bêjeyên ku di kîteya wan ya dawiyê de “i” heye.....	40
2.14 Nivîsîna “i”ya berî “y”yê.....	40
2.15 Nivîsîna “ê”ya berî “y”yê.....	41
2.16 Peyvên dunavdêrî	42
2.17 Nivîsîna serenavên biyanî yên kes, bajar û deveran	42
2.17.1 Nivîsîna sernivîsên an navdêrên taybetî yên bi tîpên latînî	42
2.17.2 Nivîsîna serenavên bi tîpên nelatînî.....	43
2.17.2.1 Nivîsîna serenavên bi tîpên kirîlî	43
2.17.2.2 Nivîsîna serenavên bi tîpên yûnanî.....	44
2.17.2.3 Nivîsîna serenavên çînî, japonî û koreyî.....	44
2.17.2.4 Nivîsîna serenavên hindî	44
2.17.2.5 Nivîsîna serenavên erebî.....	44
2.17.2.6. Nivîsîna serenavên farisî	45

2.18 Nivîsîna hin bêjeyên biyanî	45
2.18.1. Nivîsîna “-ium”ê	45
2.18.2. Nivîsîna “-ia”yê.....	46
2.18.3. Nivîsîna “-io”yê	46
2.18.4. Nivîsîna “-io” ya dawîya bêjeyan.....	46
2.18.5. Nivîsîna “-oi”yê	46
2.18.6. Nivîsîna diftonga “-ou”yê.....	47
2.18.7. Nivîsîna “-tion”ê di dawîya bêjeyên biyanî de	47
2.18.8. Nivîsîna bêjeyên ku bi “in-”ê dest pê dikin	47
2.18.9. Nivîsîna bêjeyên ku bi “im-”ê dest pê dikin	47
2.18.10. Nivîsîna bêjeyên ku di dawîya wan de “-isme” heye	47
2.18.11. Nivîsîna “-s-”yê di navbera du dengdêran de	48
2.18.12. Nivîsîna tîpa “-g-”yê di kêteya dawîyê de	48
2.18.13. Nivîsîna tîpa “g”yê ya ku wekî xwe tê nivîsîn	48
2.18.14. Nivîsîna diftonga “au-”yê	48
2.18.15. Zayenda bêjeyên biyanî	49
2.18.16. Nivîsîna “x”a latînî:.....	49
2.18.17. Nivîsîna “k”ya bêjeyên biyanî.....	49
2.18.18. Nivîsîna “q”ya bêjeyên biyanî	49
2.18.19. Nivîsîna “b”ya eslî ya zimanên biyanî.....	50
2.18.20. Nivîsîna “p”ya eslî ya zimanên biyanî.....	50
2.18.21. Nivîsîna “d”ya eslî ya zimanên biyanî.....	50
2.18.22. Nivîsîna bêjeyên ku bi “sk-”, “sp-” û “st-”yê dest pê dikin.....	50
2.18.23. Nivîsîna bêjeyên ji zimanê erebî yên bi “demme”yê	51
2.19. Girdek û hûrdek	51
2.19.1. Rewşên ku girdek tên bikaranîn.....	52
2.19.1.2. Kurtkirinên bi girdekan tên nivîsîn	52
2.19.1.3. Piştî cotxalê	52
2.19.1.4. Nav û paşnavên kesên.....	52
2.19.1.5. Nasnav û leqeb.....	52
2.19.1.6. Navên qehremanên çîrokan.....	53
2.19.1.7. Navên xweda, ferîşte, pêxember, pirtûkên pîroz û cihên dînî.....	53
2.19.1.8. Navên welat û dewletan	53
2.19.1.9. Navên bajar, bajarok û gundan.....	53

2.19.1.10 Navên tax, kolan û meydana	53
2.19.1.11 Navên parzemînan	53
2.19.1.12 Navên okyanûs, derya û tengavan	54
2.19.1.13 Navên çeman	54
2.19.1.14 Navên deştan	54
2.19.1.15 Navên çiyayan	54
2.19.1.16 Navên birc, keleh, Seray, koşk, pir, stadyûm, park û hwd.	54
2.19.1.17 Navên stêr û gerestêran	54
2.19.1.18 Navên bankayan	54
2.19.1.19 Navên kovar, rojname, pirtûk û nivîsan/gotaran	54
2.19.1.20 Navên peyman, şer û serdemên dîrokî	54
2.19.1.21 Tîpa rêzên helbestan ya destpêkê	54
2.19.1.22 Nameyên ku bi bêjeyên heval, dost, bira, xwîşk û hwd dest pê dikin	55
2.19.1.23 Nivîsîna navên wezaretan, komîsyonên parlamentoyan, dezgehên dewletî yê din, belediye, unîversîte, şirket, baro, komele û rêxistinên din	55
2.19.2 Rewşên ku hurdek tên bikaranîn	57
2.19.2.1 Hemû hevenav	57
2.19.2.2 Bêjeyên ku ji navên kesan hatine çêkirin	57
2.19.2.3 Bêjeyên ku ji navên deveran yê xweser hatine çêkirin	57
2.19.2.4. Navên gel û neteweyan	57
2.19.2.5 Tîpa ziman, zarava û devokan ya destpêkê	57
2.19.2.6 Navên dîn û mezheban û mensûbên wan	57
2.19.2.7 Navên organên ku bi hûrdekan tên nivîsîn	57
2.19.2.8 Bêjeyên nava bendikan gava ku ne serenav bin	57
2.19.2.9 Komeka ku bi reqeman dest pê dika	58
2.19.2.10. Navên hêlan	58
2.20 Kurtkirin	59
2.20.1 Kurtkirinên ku bi tîpên destpêkê	59
2.20.1.1 Kurtkirinên ku tîp bi tîp tên bilêvkirin	59
2.20.1.2 Kurtkirinên tîp bi tîp yê ku wekî bêjeyan tên nivîsîn	60
2.20.2 Cureyeke din, kurtkirinên ku wekî bêjeyan tên bilêvkirin	60
2.20.3 Birîn (kurtkirinên birî)	60
2.20.4 Kurtkirina têgihên rêzimanî yê kurdî, yê latînî û navên zimanan	61
2.20.5 Kurtkirinên civandî	61
2.20.6 Kurtkirinên navên pîvanan	62

2.20.7 Di kurtkirinê de xalên ku divê mirov bala xwe bide wan	62
2.21 Tewang.....	64
2.21.1 Tewanga navdêrên nêr yên yekhejmar	64
2.21.2 Tewanga navdêrên mê yên yekhejmar.....	65
2.21.3 Tewanga navdêrên her du zayendan yên pirhejmar	65
2.21.4 Navdêrên ji yek mêjerê lê ji zayendên cuda	66
2.21.5 Navdêrê ji yek mêjer û zayendê.....	66
2.21.6 Navdêrên mêjercuda	66
2.21.7 Bêjeyên ku bi “-an”ê diqedin	67
2.21.8 Bêjeyên ku xwediyên referantên cuda	67
2.21.9 Bêjeyên zayendnêr gava bibin navên rojname û kovaran	68
2.21.10 Bêjeyên ji cureyên wekî navên rojname û kovaran	68
2.22 Veqetandek.....	71
2.23 Di navdêran de parastina koka bêjeyê.....	73
2.24 Nivîsîna Cînavan	73
2.25 Nivîsîna rengdêran	74
2.26 Nivîsîna lêkeran.....	75
2.26.1 Nivîsîna lêkerên sade	75
2.26.2 Nivîsîna lêkerên hevedudanî.....	75
2.26.3 Lêkerên hevedudanî yên ku ji hevdû cuda tên nivîsîn	76
2.26.4 Nivîsîna “bi” yê di deman bê de.....	76
2.26.5 Nivîsîna dema bê.....	77
2.26.6 Nivîsîna “di-“ya dema niha.....	77
2.26.7 Nivîsîna morfema neyîniyê	78
2.26.7.1 Nivîsîna morfema neyîniyê bi lêkerên hevedudanî re	78
2.26.8 Nivîsîna lêkera tebatî	79
2.26.9 Nivîsîna parengên dema borî.....	79
2.26.10 Nivîsîna dema borî ya nediyar.....	79
2.26.11 Nivîsîna “hatin” û “anîn”ê	80
2.26.12 Nivîsîna navdêrên lêkerî.....	81
2.26.13 Tewanga navdêrên lêkerî û veqetandek û navdêrên lêkerî.....	82
2.27 Nivîsîna daçekan	82
2.27.1 Nivîsîna pêşdaçekên kurmancî.....	83
2.27.2 Nivîsîna bazinedaçekên kurmancî.....	83

2.28 Nivîsîna hejmarnavan.....	84
2.28.1 Grûpkirina hejmarnavên bi reqeman nivîsandî	86
2.28.2 Nivîsîna hejmarên telefonê.....	86
2.28.3 Nivîsîna saet, deqîqe, saniye û salîseyê	87
2.28.4 Xêzik di nivîsîna demê de.....	88
2.28.5 Hejmarnavên bingehîn.....	88
2.28.6 Tewanga hejmarnavan.....	89
2.28.7 Nivîsîna pirtika tewangê.....	91
2.28.8 Nivîsîna veqetandekê ya li gel hejmarnavan.....	91
2.28.9 Hejmarnavên rêzîn.....	92
2.28.10 Nivîsîna hejmarnavên dehekî, sedekî, hezarekî, dabeşî û peyvên duhejmarî	92
2.28.11 Reqemên romayî.....	93
2.29 Nivîsîna tarîxê.....	98
2.30 Xalbandî	99
ENCAM	101
ÇAVKANÎ.....	103

DESTPÊK

Celadet Elî Bedirxan, yek ji wan kesan e ku her xebata li ser zimên bi awayekî pê ve tê girêdan. Ev xebata me ji aliyekî ve bi wî re têkildar e. Lewra kurmanciya bi tîpên latînî bi Celadet berbelav bûye. Celadet gava behsa armanc û nivîsandina Hawarê dike dibêje, “Hawara me berî her tiştî heyîna zmanê me dê bide nasqirin. Lewma qo zman şerta heyînê a pêşîn e.”¹ Di dewamê de jî amaje bi wê dike ku kurmancziman e, zimanê xwe rind dizane, bi heft heşt zimanê din re daye ber hev û kîtekîten wî hûr hûnandine.

Çima me bi vê dest pê kir? Sedem nivîsîn e, nivîsîna kurmancî ye û mijara xebata me jî jixwe ev e. Lê helbet ziman ne tenê nivîsîn e û curbecur pênaseyên ziman hatine kirin. Walter Porzig dibêje: “Ê ku rûdanên derûnî dixwe jiyana mirov û civata mirovî ya ku bingeha çanda mirov afirandiye, ziman e.”² Doğan Aksan, zimên wekî heyîneke efsûnkar, pirhêl û xwedî taybetmendiyên curbicur pênase dike.³

Di van pênaseyên navborî de tiştê hevpar ew e ku ziman û heyîn/hebûn ji hev cuda nabin. Mirov, xwe bi zimên ava dike, derd û kulên xwe, evîna xwe, tinazên xwe bi zimên derdibirîne. Bê çawa li cîhanê bi sedan civat hene ewqas ziman jî hene. Lê zimanê her miletekî jî ne yekser e. Her ziman di nav xwe de hin binbeşan jî vedihewîne. Devok, zimanê takekesî, zarava hin binbeşên zimên in.

Devok cihêrengiya dengî ya di navbera herêman de ye ku bi zimanê axaftinê ve girêdayiye. Zimanê takekesî bi mirovan bi xwe re têkildar e. Lewra her mirov li gor cihê lê mezin bûye, pîşe, derdor, temen, zayend û perwerdehiya xwe, zimên xweyî dike û renekî didiyê. Zarava jî ew jêrşaxa zimên e ku guherînen dengî peyvrêzî, morfolojîk û semantîk nîşan dike û di belgeyên nivîskî de tê xuyakirin.⁴ Gava em van ji piçûkiyê berev firehiyê rave bikin tabloyek wisa derdikeve pêşberî me:

¹ Hawar, Belkî, 2012, r. 10.

² Walter Porzig, **Dil Denen Mucize I**, wer: Prof. Dr. Vural Ülkü, Kültür ve Turizm Bakanlığı Yayınları, Ankara, 1985, r. 13.

³ Doğan Aksan, **Her Yönüyle Dil Ana Çizgileriyle Dilbilim**, Türk Dil Kurumu Yayınları, 1. Cilt, Ankara, 1998, r. 11.

⁴ Zeynel Kıran-Ayşe Eziler Kıran, **Dilbilime Giriş**, Seçkin, 5. Baskı, Ankara, 2018, r. 135.

Zimanê takekesî – Devok – Zarava – Ziman

Zimanê takekesî bi takekes ve, yê din bi civakê ve girêdayî ne.

Gava li gor vê em li kurdî dinêrin em dibînin ku çar zaravayên sereke hene û ev zarava jî devokên wekî botanî, badînanî, hekarî, silêmanî, germiyanî, feylî, lekî, goranî, hewramî û hwd vedihewînin.⁵

Herweha ziman bi çend cureyan tên dabeşkirin. Zimanê dayîkê, zimanê duyem, zimanê biyanî, zimanê standard, zimanê axaftinê û zimanê nivîskî û hwd. Bi sedema ku bi xebata me re têkildar e divê em ji van, behsa zimanê standard, zimanê axaftinê û zimanê nivîskî jî bikin.

a-Zimanê Standard

Wekî zimanê hevpar jî tê binavkirin. “Li welatekî ji nav devok û zaravayan kîjan berbelav û serdest bibe ew dibe zimanê standard.”⁶

Wekî ku tê zanîn, kêşana lêkeran, bilêvkirina bêjeyan li gor herêman diguhere. Awayê axaftinê û qaîdeyên rêzimanî gelek caran hevdû nagirin. Bo nimûne gava em diaxivin, em cînavên kesî weke “mi, ti...” bilêv dikin lê di nivîsînê de ev bi awayê “min, tu...” derdikevin pêşberî me. Ev nîşana zimanê standard e. Zimanê standard bi piranî jî hêla desthilatê ve li ser welatîyan tê ferzkirin.⁷

Dogan Aksan dibêje “attikê” ku ji zaraveyên yewnan ê kevn e ji nav zaravayên “arkadya” û “dor” derketiye pêş û bûye zimanê hevpar. Lewra ew zaraveyê birêvebiriya welêt û navenda çandî bû.⁸

Li Tirkîyeyê jî rewşa zimên bi heman awayî ye. Sala 1911an Ömer Seyfettin gotarekê di Kovara Genç Kalemler (Pênûsên Ciwan) de diweşîne. Di vê gotara bi navê “Yeni Lisan” (Zimanê Nû) de balê dikişîne ser devoka Stenbolê. Gotar li gel vê behsa wê dike ku tirkan di edebiyatê de pêşî berê xwe dane Rojhilat û paşê jî Rojava û ziman ketiye bin tesîra wan û bi vê sedemê edebiyateke neteweyî derneketiye holê ji ber ku bo edebiyateke neteweyî pêşî zimanekî neteweyî pêwîst e. Herweha li gor

⁵ Kadri Yıldırım, **Kürtçe Dilbilgisi (Kurmanji Lehçesi)**, Artuklu Üniversitesi Yayınları, İstanbul, 2012, r. 25.

⁶ Aksan, **Her Yönüyle Dil Ana Çizgileriyle Dilbilim**, r. 83.

⁷ Ümran Altıncılık, **Waneyên Ziman**, Lîs, Çapa yekem, Diyarbakır, 2016, r. 84.

⁸ Aksan, **Her Yönüyle Dil Ana Çizgileriyle Dilbilim**, r. 83.

Ömer Seyfettin zimanê berê nexweş e û ev nexweşî jî kaîdeyên biyanî yên ne lazim in ku tê de cih girtine.⁹

Piştî vê hewlê bi çend salan jixwe komar ava dibe û weke gelek saziyan “Saziya Zimanê Tirkî (Türk Dil Kurumu)” jî dest bi xebatan dike. Sazî şêwezarê Stenbolê weke zimanê standard dipejirîne û dibêje zimanê perwerdehî û nivîsînê ew e.¹⁰

b-Zimanê Axaftinê

Yekîneyên zimên in ku bi nivîsînê re peywendiya wan tune ye û curbicur taybetmendiyên bilêvkirinê vedihewînin.¹¹ Bi vê pênaseyê re Aksan balê dikişîne ser wê ku divê bingeha nivîsê zimanê axaftinê be lewra nivîs gelekî dawiyê derketiye holê.

c-Zimanê Nivîskî

Zimanê nivîskî ji aliyekî ve bi zimanê standard (hevpar) û yê edebî yê hin nivîskaran rehevate ye. Dogan Aksan vî zimanî wisa pênase dike. Zimanê hevpar ku li ser zaraveyekî ava bûye gava di nivîsê de, di kitêbên dersê de bê bikaranîn û berhemên hunerî zanistî pê bîn nivîsîn ew zimanê nivîskî ye.¹²

Piştî vê encameke wisa derdikeve pêşberî me. Zimanê axaftinê li gor zimanê nivîskî zû diguhere, geş dibe. Lewra mirov berê xwe dide kurtkirinê, li gor derûniya xwe hin bêjeya diguvêşe, hinan nerm hinan hişk bi lêv dike û her tim sivikayiyê tercîh dike.

Zimanê nivîskî xwedî qaîde ye. Kêşana lêkeran, ravek, tewang –heke hebe-, ergativî bi qaîdeyan rengê xwe distîne û rengê sar e. Gelek caran dilê mirov rehet nake. Ev hem ji aliyê bilêvkirina bêjeyan hem ji aliyê peyvrêzî û hem ji aliyê watenasiyê ve jî wisa ye. Bo nimûne, li derdora Mêrdînê an Torê em bêjin, gava lêker di dema niha de tîn kişandin li gor kesê sêyem: “Ew diçê, ew dixwê, ew dirazê û hwd tê gotin.” Lê li gor kitêbên rêzimanê ku bingeha xwe bêhtir ji zimanê Hawarê

⁹ Ömer Seyfettin, **Yeni Lisan**, <http://edebiyatsultani.com/yeni-lisan-makalesi-omer-seyfettin/> Nêrîna Dawî: 04.05.2019.

¹⁰ Altinkılıç, **Waneyên Ziman**, r. 85.

¹¹ Aksan, **Her Yönüyle Dil Ana Çizgileriyle Dilbilim**, r. 85.

¹² Aksan, **Her Yönüyle Dil Ana Çizgileriyle Dilbilim**, r. 86.

distînin divê em bêjin; “Ew diçe, ew dixwe, ew radize û hwd.” Dîsa di kurmançiya Deregeza Xorasanê de, hevokeke bi awayê “Xwengê tu le vira çi dekî?”¹³ divê bi awayê “Xwengê tu li vir çi dikî?” bê nivîsîn.

Derbarê zimanê standard Ana Deumert û Wim Vandenbussche di gotareke xwe de dibêjin: “Di texayûla populer detarîxa zimanên standard bi tevgerên (activities) takekesî û sazî ve bi awayekî aloz girêdayîye. A rastî jî perestgehên (pantheon) zimannasiyê yê populer bi navên kesên standardker (standardizers) dagirtî ne ku dixwazin zimanê xwe yê dayîkê saz bikin û kodan jê re çêbikin.”¹⁴ Ev jî nîşaneyê ku standardasyon bi endîşeyêke rêvebirinê re têkildar e û qaîdeyan li axevêran bar dike.

Bo kurmançî rewş çawa ye? Ji “armanc û girîngiya” Hawarê diyar e ku berî her tiştî berê xwe daye zimên û bi endîşeyêke zimanî derketiye. Çîrokan, helbestan, agahiyên erdnîgarî, werger, qaîdeyên kurmançî û hwd têra xwe tê de cih digirin. Ji hejmara 27an pê ve bi navê “Bingehên Gramera Kurmançî” rêzenivîsek dest pê dike ku qaîdeyên kurmançî rave dike. Salên 80yî ku edebiyata kurdî (kurmançî) li diyasporayê geş dibe jî gava mirov analîzekê bike xuyaye ku bi giştî ji Hawarê sûd hatiye wergirtin. Ji ber vê mirov dikare bibêje ku standardîzasyona nivîsîna bi kurmançî piranî xwe dispêre Hawarê. Berhema rastnivîsê ya Arif Zêrevan (di mijara rastnivîsê de yekem kitêb e) vê rewşê nîşan dide û jixwe ew jî di pêşgotinê de vê venaşêre.¹⁵

Naxwe divê çi bê kirin. Berî her tiştî biryarek lazim e. Rêziman an zimannasî. Rêziman belam qaîdeyên hişk nîşan dide; xwendevan, axêver û kesên bi nivîsê re eleqedar gelek caran ji zimên sar dike. Zimannasî xwe dispêre zimanê axaftinê û bi ya min bo rênîşankirina nivîsê bêhtir karîger e.

Ferdinand de Saussure derbarê rêzimanê dibêje: “Pêşî xebatên rêzimanê hatin kirin. Yewnaniyên kevin dest pê kir û nemaze fransîzan dewama wê anî û xebatên

¹³ Mehdî Jaferzadeh, **Analîza Kurmançiya Deregeza Xorasanê li gor Hêmanên Zimannasiyê**, Yüksek Lisans Tezi, Mardin Artuklu Üniversitesi, Yaşayan Diller Enstitüsü, Mardin, 2017, r. 46.

¹⁴ Ana Deumert and Wim Vandenbussche, **Research directions in the study of language standardization**, <https://pdfs.semanticscholar.org/ae6d/7b6d23faace417b9e485278f86e7a6b60ac7.pdf> Nêrîna Dawî: 03.04.2019.

¹⁵ Arif Zêrevan, **Bingehên Rastnivîsandina Kurdiyê (Kirmancî)**, Çapa Yekem, Nefel, Stockholm, 1997, r. 13-15.

rêzimanê xwe dispêrin mantiqê û ji nêrînên zanistî yên bifêde û karîger yên têkildarî zimên dûr in. Armanca rêzimanê ew e ku qaîdeyên rastî û xelet ji hev veqetîne û zimên bixe qalibekî teng.”¹⁶

Herweha Remezan Alan jî balê dikşîne ser nêrînên zimannasiyê û dibêje: “Qeydên nivîskî ji axaftinê hêdî hêdî dûr dibin û li ser ‘zimanekî sentetîk’ lîs digirin.”¹⁷ Endîşeya wî ew e ku zimanê axaftinê roj bi roj winda dibe û li gor rêzimanê zimanekî nû û bêrîh cihê wî digire.

Derbarê zimanê nivîskî û zimanê axaftinê sala 1911an Ömer Seyfettin di gotara xwe ya bi navê “Yeni Lisan” de hin pêşniyar û nêrînên xwe wisa rêz dike:

- a- Zimanê ku em pê diaxivin, tirkîya Stenbolê, zimanê herî jidil e.
- b- Gava em zimanê axaftinê û yê nivîskî bikin yek em dê edebiyata xwe ihya û îcad bikin.
- c- Mirov dikare bi qaîdeyên tirkî îzafeyan çêbike lê qaîdeyên farisî û erebî bo xemlê ne, divê em dev ji wan berdî û hwd.¹⁸

Di heman gotarê de Ömer Seyfettin dibêje gava em vê bikin em dê ji tehekûma pênc şeş nivîskarên jî xelas bibin û divê bo vî karî em ne li benda hikûmetê bin û karê zimên ne ew kar e ku tenê wezareta perwerdehiyê pê mijûl bibe.¹⁹

Helbet kurd ne mecbûr in bi vî awayî tevbigerin. Her welat pîrsgirêkên zimanê xwe, bi xwe divê çareser bike. Lê ya rastî tecribeya tirkî ne tecribeyek e xirab e. Lewra îrroj nivîskarên tirkî Xelata Nobelê (O. Pamuk) distînin, berhemên wan bo bi dehan zimanan tên wergerandin (Yaşar Kemal, Nazım Hikmet, Aziz Nesin û hwd). Li gor me sedema vê, pariyekî jî tecribeya “Yeni Lisan”ê ye.

Herweha piştî avakirina “Saziya Zimanê Tirkî” (Türk Dil Kurumu), tirkî li ser zimanê xwe gelek xebat kirin, ferheng amade kirin, rastnivîs nîşan kirin, kovar û kitêb li ser zimên weşandin. Helbet ji aliyê dewletê ve piştgiriya saziyê hat/tê kirin û

¹⁶ Fernande de Saussure, **Genel Dilbilim Dersleri**, Wergêr: Berke Vardar, Multilingual, 1. Baskı, İstanbul, 1998, r. 27.

¹⁷ RemezanAlan, **Bendname**, Avesta, Çapa Yekem, Stenbol, 2009, r. 82.

¹⁸ Seyfettin, **Yeni Lisan**, <http://edebiyatsultani.com/yeni-lisan-makalesi-omer-seyfettin/> Nêrîna Dawî: 04.05.2019.

¹⁹ Seyfettin, **Yeni Lisan**, <http://edebiyatsultani.com/yeni-lisan-makalesi-omer-seyfettin/> Nêrîna Dawî: 04.05.2019.

li gor desthilatê jî carinan tevgera wê diguhere. Karek ji yê saziyê amadekirina “Yazım Kılavuzu” (Rêbera Nivîsînê) ye ku her tim “Yeni” (Nû) pê ve dikirin. Ji van rêberan em dixwazin balê bikşînin çapa wê rêberê ya 1977an. Lewra serokê saziyê yê şaxa rêzimanê Doğan Aksan e û gelek xebat kirine, bi nav û deng e di warê ziman û zimannasiyê de. Rêber çend xalan nîşan dide bo amadekirina rêberê:

- a- Armanc ne hilweşandina tiştê heyî ye, divê xebat qet’i, hevger û zelal be.
- b- Divê pêgiriye bike ku yekitiya zimên ava bike û hewceyê pê nemîne ku çapên nû her kêlî bîn amadekirin.
- c- Qaîde bi zelalî bîn dayîn û mirov tê de neteqîne û herweha ji nakokiyan dûr be.
- d- Divê hay ji geşedanên zimên hebe, hêmanên ku nû ketine zimên vehewîne û yên wînda hew bi kar bîne.²⁰

Em veşandin xebata li ser kurmancî. Wekî me gotibû xebata li ser kurmancî bi Hawarê û Celadet dest pê kir. Piştî Hawarê gelek sal divêbûn ku xebatên rastnivîsînê dest pê bikin. Li diyasporayê herçî berî Enstîtuya Kurdî ya Parîsê kovar, pirtûk bîn weşandin jî xebatên li ser rêzimanê û rastnivîsê bi Enstîtuyê geş dibin. Di vê çarçoveyê de ji her çar parçeyên welêt; lêkolîner, zimanzan dicivin li ser terman, li ser qaîdeyên zimên dinivîsin û di rojnameya “Kurmancî” de diweşînin. Piştî wê, sala 1997an Arif Zêrevan “Bingehên Rastnivîsandina Kurdiyê (kurmancî) dinivîse ku yekem kiteba rastnivîsê ye. Xebatên bi vî rengî –çi rasterast bi serê xwe çî di nav kitêbên rêzimanê de- berdewam in û rêberên rastnivîsînê yên Aydogan û Komxebatê ji du berhemên salên dawî ne.

Herweha divê em hinekî li ser rêbazên van xebatan jî biaxivin. Çiqasî berê xwe didin rastnivîsê, çiqasî bi rêbazên rêzimanî tevdigerin?

Pêşî em li gor rêbazên zimannasiyê lê binêrin: Zimanê nivîskî û axaftinê gelekî ji hev dûr e. Zimanê nivîskî “zimanekî sentetîk” e. Weke ku tê zanîn herçiqasî bi tesîra erûzê, serwayê di berhemên klasîk yên kurdî de ziman ketibe dirûvekî din de jî şa’irên weke Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî, Feqiyê Teyran û hwd berê xwe ji “zimanê axaftinê” neguhertine. Bo nimûne Mela gava dibêje:

²⁰ **Yeni Yazım Kılavuzu**, Türk Dil Kurumu Yayınları, Dokuzuncu Baskı, Ankara, 1977.

Suhbeta çerx û sema tê wek Melê sed mubtela tê

Zemzem û ava heyatê muşterî sed şeyx û şox²¹

Navê xwe li gor qaîdeyên rêzimanî natewîne û bi awayê “Melayî” ditewîne. Lewra ew ji devoka botan dûr nakeve. Çawa rehet be wisa bi kar tîne. Lê li gor gelek xebatên me yên rastnivîsînê hewce ye mirov bêje “Melayî”. Dev ji vê berde vê qaîdeyê li hemû axêverên kurmancî jî bar dikin.

Xaleke din jî pejirandina devokekê ye. Bo zimanekî standard –pêdiviya vî zimanî li dera ha- berî her tiştî divê devokek bê tercîhkirin. Celadet wekî ku tê zanîn çî bi zanebûn çî bi awayekî din bêhtir berê xwe daye Botan û di gelek nivîsên wî de ev berbiçav e. Piştî salên 80yî li diyasporayê jî gelek kesan xwe spartin Celadet û Hawarê. Bi me ev şert bû jî. Lêbelê van salên dawî tê dîtîn ku her kes ji aliyekî ve behsa devoka xwe dike û dibêje çima ne bi awayê min e.

Divê neyê jibîrkirin ku tercîhkirina devokekê ne meseleya rastî û xeletiya wê devokê ye. Mesele standardbûn e. “Wilo”, “wisa”, “welê”, “wanî”, “werrê” û hwd hemû rast in. Di nav gel de bi rehetî tîk bikaranîn. Jixwe divê wisa be jî. Lê gava em bêjin ileh bila filan bêje bê bikaranîn û ev li ser hemû kesî bê ferzkirin pirsgirêk rû didin. Ev bo axaftinê wisa ye lê bo zimanê nivîskî rewş diguhere. Heke armanc standardîzasyona zimên be kes li hember vê dernakeve. Dibe ku di axaftinê de mirov bêjeya “wilo”yê bi kar bîne. Lê mafê wî nîne ku di nivîsê de ya xwe li yên din bar bike.

Karê xebatkar û kedkarên rêzimanê jî gelek caran wisa ye. Daçekên “bi...re”, “di...de” bi eslê xwe “bi...ra”, “di...da” jî bin bi salan e di gelek kovar, rojname û kovaran de bi awayên xwe yên “bi...re”, “di...de” hatin nivîsîn û bi me rûniştin. Piştî vê gava bi sedema ku li Serhedê tîk bikaranîn û axaftin qaîde li gor wê bîk danîn dê ziman bêhtir tevlihev bibe bi nêrîna me. Ango tê wateyê ku tradîsyona nivîsînê bi destê “perestgehên zimên” bê hilweşandin. Bo nimûne, helbesta Osman Mehmed:

“tu ê gul û gul derbas bibî

²¹ Mela Ehmedê Zivingî, **Gerdeniya Gewherî (Şerha Dîwana Melayê Cizîrî)**, Cild I, Çapa Yekem, Avesta, Stembol, 2013, r. 333.

di borêkî zemên re”²²

Gava li gor qaîdeyên zimên ku Komxebata Kurmanciyê dipejirîne bê nivîsîn hewce ye bi vî rengî biguhere:

“tu dê gul û gul derbas bibî

di borekî zemanî ra”

Wekî ku tê dîtin di helbestê de hem aheng hem wate guherî, “borê zemên” bû “borê zemanî” ku “zeman” ji navdêriyê derket bû rengdêr, wate jî guherî borê ku yê berî gelek salan e.

Di mijara xebatên rastnivîsînê de xaleke din jî zelaliya ravekirina qaîdeyan e. Heger amadekarên berhemê di cihê bêjeyên têrnas de bêjeyên kêmnas bi kar bînin dê qaîde neyên fêmkirin û dê xwendevan nikaribe ji wan sûd wergire. Berhemên rastnivîsînê qaîdeyan bi zelalî pêşkêş dikin. Ravekirin karê rêzimannasan e. Ango di berhemeke rastnivîsînê de mirov dikare bêje peyv li gor tewangê tîn nivîsîn û nimûneyan bide lê gava tewang xal bi xal bê ravekirin bi ya me ew dibe sedema tevliheviyê.

Rêberên rastnivîsînê rê li ber xwendevan, nivîsevan vedikin. Li ku girdek, li ku hûrdek tîn bikaranîn, peyvên hevedudanî çawa tîn nivîsîn, nivîsîna tarîxê, hejmaran û her wekî din. Li gel vê di her zimanî de îstîfsna jî hene û divê li ber çavan bên girtin. Bo nimûne mirov dê lêkera “parve kirin”ê li gor çî binivîse. Li gor lêkerên sade yan yê hevedudanî? Mirov sade bifikire gerek bi awayê, “Min parvekir” binivîse lê heke hevedudanî be divê bi awayê, “Min par ve kir” bê nivîsîn. Lê gava bi hûngulî lê bê nêrîn li yekê ji wan jî rûnane û pêdivî bi îstîfsnayekê heye.

1. Mijara Lêkolînê

Mijara vê xebatê berawirdkirina sê berhemên rastnivîsînê ye. Berhemên ku hatine berawirdkirin; “Bingehên Rastnivîsandina Kurdiyê (kurmancî)” ya Arif Zêrevan, “Rêbera Rastnivîsînê” ya Mistefa Aydogan û Rêbera Rastnivîsînê” ya Komxebata Kurmanciyê ku ji aliyê komîsyonekê ve hatiye amadekirin in. Pirs

²² Osman Mehmed, **Gulûcinûkavil**, Avesta, Çapa Yekem, Stenbol, 2002, r. 11.

sereke jî ew e ku bê destnîşankirin ka derbarê rastnivîsînê çî hatiye nivîsîn, cudahî û wekhevîyên navbera her sê berheman bên destnîşankirin.

Wekî ku tê zanîn rastnivîsîn di kurmancî de gelek caran dibe sedema tevliheviyê. Di nivîsînê de standardek ava nebûye. Xebat di heman demê de serê xwe bi standardîzasyonê jî diêşîne û xalên pêwîst diyar dike.

2. Armanc û Girîngiya Xebatê

Rastnivîsîn di kurmancî de mijareke sereke ye û gelek kêşeyên wê hene. Xebatên ku hatine kirin pir nayên nasîn û di nivîsê de mirov di cihê ku li gor qaîdeyan herin li gor devoka xwe dinivîsin. Ev jî dibe sedema tevliheviyê û carinan tê wê radeyê ku xwendevan di metnê nagihîje. Loma jî girîng e ku xebatên bi vî rengî bên kirin û bi çavekî objektîf bên şîrovekirin.

Têkildarî van xalên jorîn armanca sereke ji xebatê ew e ku berhemên rastnivîsînê yên ku mijara xebatê ne bi naveroka xwe ve bên destnîşankirin û xalên muşkîlsaz bên pêşkêşkirin.

Di vê xebatê de armanceke din ku pêwîst e li ser bê rawestî ew e ku herçiqasî hewldan hebe jî standardek ava nebûye loma bo vê çend xalên girîng bên nîşandan.

3. Sînorê Xebatê

Bi vê xebatê me hewl daye ku rêberên rastnivîsîna kurmancî yên bi tîpên latînî berawird bikin. Rastnivîsîn qadeke berfireh e û hem kitêb hem gotar li ser hatine nivîsîn. Ji ber vê jî me xebata xwe bi sê berheman sînor kiriye. Berhemên mijara xebata me, “Bingehên Rastnivîsandina Kurdiyê (kurmancî)” ya Arif Zêrevan, “Rêbera Rastnivîsînê” ya Mistefa Aydogan û Rêbera Rastnivîsînê” ya Komxebata Kurmancîyê ku ji aliyê komîsyonekê ve hatiye amadekirin in. Herçiqasî di şîrovekirinê de me berê xwe dabe gelek çavkaniyan jî di berawerdikirinê de tenê sê berhem li ber çavan hatine girtin.

4. Rêbaza Xebatê

Di vê xebatê de, sê berhemên rastnivîsînê pêşî bi naveroka xwe û nimûnedayînê hatine destnîşankirin. Di rêzkirinê de me berhema Mistefa Aydogan

weke bingeh girt û xal li gor wê diyar kirin. Lewra di berhema Zêrevan de hemû xalan cih negirtiye û jixwe berhema Komxebatê jî Aydogan ji xwe re kiriye bingeh. Gava me mînak dane bi sedema ku rêbera Aydogan û ya Komxebatê bi giştî weke hev in, nimûne ji yekê hatin hilbijartin û bi jêrenotekê hatin destnîşankirin. Herçî berhema Zêrevan e cih nedaye gelek xalan. Di xalên ku Zêrevan li ser wan rawestiyaye de nimûneyên wî jî hatine pêşkêşkirin.

Di nirxandin û şîroveya xalan de ji rêzimanê bêhtir me berê xwe daye rastnivîsînê û ji “rênivîsa tenik” sûd wergirtiye.

Di warê rastnivîsîna vê xebatê de me bi hin qaîdeyên berhemên mijara xebatê re berê xwe daye gelek çavkaniyên din yê rêzimanê jî.

Xaleke din ku divê em bînin zimên ew e ku me pêdivî bi berawerdkirina mijara xalbendiyê nedît. Lewra di rastnivîsînê de ne mijarek e ku nîqaş li ser çêdibin.



BEŞA YEKEM

DANASÎNA BERHEMÊN RASTNIVÎSÎNÊ

1. DANASÎNA BERHEMÊN RASTNIVÎSÎNÊ

Wekî ku me li jorê jî gotibû mijara vê xebatê berawirdkirina sê berhemên rastnivîsînê ye. Loma pêdivî bi danasîna van berheman jî heye bê ka kengî, çawa, li ku derê çap bûne, li ser çi rawestiyane û hwd. Di vê beşê de em ê pêşî li gor tarîxa çapbûna wan bi rêzê berhemên mijara xebatê, piştê jî berhemên din bidin nasîn ku ew jî ev in:

- 1- Bingehên Rastnivîsandina Kurdiyê (kirmancî), Arif Zêrevan
- 2- Rêbera Rastnivîsînê, Mistefa Aydogan
- 3- Rêbera Rastnivîsînê, Komîsyona Komxebata Kurmanciyê

1.1 Bingehên Rastnivîsandina Kurdiyê (kirmancî)

Ev rêber, di sala 1997an de ji aliyê Arif Zêrevan ve hatiye nivîsîn. Ji weşanxaneya Nefelê derçûye û li Stockholmê hatiye çapkirin. Li gor Ergin Öpengin jî dibêje “yekemîn xebata xweser e ku bi rengê rêbereke rênivîsê” derçûye.²³

Kitêb 160 rûpel e. Li gel pêşgotina Michael Chyet ji çar beşên sereke pêk tê. Beşa yekem ji “raçandina tekstê”, ya duyem ji “nivîsandina navên kesan, girdek, hûrek, hejmar, tewang, veqetandek û kurtekan” pêk tê. Beşa sêyem “niqteşanî” û ya çarem jî “servehî” ye. Bi van re ferhengok, serkanî û endeks jî di berhemê de cih digirin.

Jixwe wekî ku me gotibû beşa yekem “raçandina tekstê” ye ku bo nivîsîna metnekê rê nîşan dide ango mijarên kompozîsyona metnê destnîşan dike. Beşa duyem hem agahiyên rêzimanî hem qaîdeyên rastnivîsînê vedihewîne. Di vê beşê de bi sernivîsên “navên kesan, girdek yan hûrdek, hejmar, kurtek” li ser rastnivîsînê; bi sernivîsên “tewang, veqetandek”ê li ser rêzimanê radiweste. Di beşa sêyem de li gel nîşandekên xalbendiyê yên giştî cih dide “hinek nîşandekên dî (nîşandeka “û”yê, nîşandeka dolarê emerîkî) û nîşandekên matematîkî jî. Di beşa çarem ku navê wê “servehî” ye de cih dide “herfên translîterasyonê” û nîşandekên serrastkirinê.”

²³ Ergin Öpengin, **Pirsên Rênivîsa Kurmancî: Pêdeçûneke Rexneyî li ser Rêbera Rastnivîsînê ya Mistefa Aydogan**, Derwaze, Hejmar 1, İstanbul, 2017, r. 181.

Zêrevan heman demê ferhengokek jî amade kiriye ku bi giştî têgihên rêzimanê yên bi “kurdî, îngilîzî, swêdî û tirkî” vedihewîne.

Herweha Zêrevan çavkanî (serkanî) jî nîşan dane ku ji gelek berhemên kurdî, îngilîzî, swêdî, tirkî sûd wergirtiye.

Zêrevan di “pêşgotina nivîskarî” ya berhemê de dibêje ku di warê rastnivîsînê de tevlihevyek heye û gelek kes weke hev nanivîsin û her nivîskar bingehên rastnivîsîna zimanê biyanî weke ku dizanin bi kar tînin û wî ji ber vê di sala 1995an de dest bi xebatê kiriye. Li gel vê Zêrevan diyar dike ku wî termînolojiya Celadet Alî Bedir – Xan bi kar aniyê û heta wê demê kesek nediye ku bingehê weke wî serrast bi kar tîne.²⁴

Ya rastî jî ji aliyê tercîhkirina bêjeyan ve zêde mihefezakar e û nimûneyên wekî “ko, derêxistin, zêdehî, servehî, serkanî, divet, wekî êk, gohortin û hwd” nîşaneyên vê ne.

1.2 Rêbera Rastnivîsînê ya Mistefa Aydoğan

Ev rêber ji aliyê Mistefa Aydoğan ve bi koordînasyona Malmîsanîj hatiye amadekirin. Ji weşanxaneyê Rûpelê derçûye û li Stenbolê, di sala 2012an de hatiye çapkirin.

Berhem 298 rûpel e. Li gel pêşgotineke nivîskar, ji sîh û du beşên mijarên rastnivîsînê, ferhengokeke termên rêzimanê, çavkanî û îndeksê pêk tê. Beş bi rêzê wekî alfabe, alfabeya herfgotinê, kêtekirin, navên bajarên Kurdistanê, navên welat, paytext û yekîneyên pereyan, navên gel, netewe û zimanan, navên hêlan, navên rojan, navên demsalan, herfa ducare, nivîsîna bêjeyê ku bi “stan”ê tên çêkirin, pîrsa bêjeyên ku bi “î”yê dest pê dikin û bi “î”yê diqedin, nivîsîna hin bêjeyên ku di kêteya wan ya dawî de “î” heye, nivîsîna “î”ya berî “y”yê, nivîsîna “ê”ya berî “y”yê, peyvêndunavdêrî, nivîsîna sernavên biyanî yên kes, bajar û deveran, nivîsîna hin bêjeyên biyanî, girdek û hûrdek, kurtkirin, tewang, veqetandek, di navdêran de parastina koka bêjeyê, nivîsîna cînavan, nivîsîna rengdêran, nivîsîna lêkeran, nivîsîna daçekan, nivîsîna hejmarnavan, nivîsîna tarîxê, xalbendî, hin nîşandekên cuda, ferhengok û çavkanî hatine binavkirin.

²⁴ Zêrevan, *Bingehên Rastnivîsandîna Kurdiyê (Kirmancî)*, r. 14.

Wekî ku ji navan jî diyar e Aydogan ne tenê qaîdeyên rastnivîsînê yek bi yek bi hûrgilî dane, ketiye sînorê rêzimanê û qaîdeyên zimanî jî rave kirine. Tewang û veqedandek û di sernivîsa “nivîsîna lêkeran” de hin xal bi rêzimanê ve girêdayî ne.

Di pêşgotinê de Aydogan dibêje ku bo nivîseke baş, birêkûpêk, fêambar û herweha bo rêlibergirtina tevlihevî û sergêjiyan qaîdeyên zelal -dixwaze xwe bispêrin rêzimanê dixwaze li ser lihevkirinekê bi awayê hevfiqrî çêbibin- şert in.

Lê gava em bi giştî li berhemê dinêrin tê dît in ku amadekarê rêberê ji hevfiqrî û lihevhatinê bêhtir li gor rêzimanê tevgeriyaye. Bikaranîna û nîşandana lêkera “hatin”ê li gor awayê bi rist veqetandek, tewandina navê zimanan û hwd ew xal in ku nivîskar di wan de berê xwe daye qaîdeyên rêzimanê.

Tevî vê xebat, di qada rastnivîsînê de berhemeke di ser xwe re ye. Lewra cara yekem xebateke bi vî rengî hatiye amadekirin. Berhem encama kedeke giranbiha ye.

Di pêşgotina berhemê de Aydogan armanca xwe jî diyar dike ku dixwaze rêya li ber standardbûna kurmancî xweştir bike lê em bo hin xalan reşbîn in lewra îstîsnayên bikaranînê li ber çavan nehatine girtin û di nivîsîna hin peyvên de rengê sar berçav dibe.

1.3 Rêbera Rastnivîsînê ya Komxebata Kurmanciyê

Ev berhem ji aliyê Komxebata Kurmanciyê ve ku di bin banê Weqfa Mezopotamyayê de xebitiye, hatiye amadekirin. Weşangerê berhemê jî Weqfa Mezopotamyayê ye û li Stenbolê, di sala 2019an de hatiye çapkirin.

Xebata li ser berhemê Adara 2015an dest pê kiriye û heta sala 2017an bi encama heft civînan rengê xwe standiye. Di serê berhemê de weke danasînekê serboriya xebatê hatiye pêşkêşkirin ku dibêje nûneriya çar parçeyên Kurdistanê li ber çavan hatiye girtin û hewl dane Komxebat ji pisporên zimanê kurdî pêk bê.

Navên beşdarên Komxebatê li gel pisporî, herêm û hejmara wan ya beşdariyê wisa ye ku li jêr hatiye rêzkirin:

- Dr Bahîz Omer Ehmed (zimannas, Zanîngeha Dihokê, Başûr-6)
- Bahoz Baran (zimannas, Bakur-7)

- Behrûz Şucaî (zimannas, Rojhilat-6)
- Deham Evdîlfetah (zimannas, Rojava-5)
- Dilawer Zeraq (lêkolîner, Bakur-7)
- Dr Dilbirîn Evdîla, (zimannas, Zanîngeha Zaxoyê, Başûr-4)
- Dr Evdilwehab Xalid Mûsa, (zimannas, Zanîngeha Zaxoyê, Başûr-6)
- Dr M. Malmîsanîj (zimannas, Zanîngeha Artukluyê, Bakur-7)
- Mahmûd Lewendî (lêkolîner, Bakur-5)
- Mehdî Jaferzadeh (lêkolîner, Rojhilat-7)
- Mihemed Teqewî (lêkolîner, Rojhilat-5)
- Mistefa Aydogan (zimannas, Bakur-7)
- Dr Mîkaîl Bilbil (zimannas, Bakur-7)
- Newzad Hirorî (zimannas, Başûr-5)
- Samî Tan (zimannas, Bakur-6)
- Dr Şoreşvan Adil (zimannas, Zanîngeha Zaxoyê, Başûr-3)
- Zana Farqînî (zimannas, Bakur-7)
- Dr Zulkuf Ergun (lêkolîner, Zanîngeha Artukluyê ya Mêrdînê, Bakur-7)

Berhem 229 rûpel e, li gel danasîn û awayê xebata Komxebata kurmanciyê û pêşgotineke bi înzaya Komxebata Kurmanciyê, 31 beşên sereke û ferhengokek di pirtûkê de cih digire. Di pirtûkê de îndeks nîne û pêwistî bi çavkaniyan jî nehatiye dîtîn. 31 yek beşên sereke li gor “Rêbera Rastnivîsînê” ya Mistefa Aydogan hatine rêzkirin ku ew jî ev in:

- 1- Alfabe
- 2- Alfabeya herfgotinê
- 3- Kitekirin
- 4- Navên bajarên Kurdistanê

- 5- Navên welat, paytext û yekîneyên pereyan
- 6- Navê gel/netewe û zimanan
- 7- Navên helan
- 8- Navên rojan
- 9- Navên demsalan
- 10- Navên mehan
- 11- Tîpa ducare
- 12- Nivîsîna bêjeyên ku bi –“stan”ê tên çêkirin
- 13- Pirsê bêjeyên ku bi “î”yê dest pê dikin û bi “i”yê diqedin
- 14- Nivîsîna hin bêjeyên biyanî yên yekkiteyî ku di kurmanciyê da dibin dukiteyî
- 15- Nivîsîna “î”ya berî “y”yê
- 16- Nivîsîna “ê”ya berî “y”yê
- 17- Nivîsîna navdêrên taybetî yên biyanî, kes, bajar û deveran
- 18- Peyvên dunavdêrî
- 19- Nivîsîna hin bêjeyên biyanî û îranî
- 20- Girdek û hûrdek
- 21- Kurtkirin
- 22- Tewang
- 23- Îzafe
- 24- Parastina awayê leksanî di navdêran da
- 25- Nivîsîna cihnavan
- 26- Nivîsîna rengdêran
- 27- Nivîsîna lêkeran

28- Nivîsîna daçekan

29- Nivîsîna hejmarnavan

30- Nivîsîna tarîxê

31- Xalbendî

Di sazkirina berhemê de tiştê rehet bê xuyakirin ew e ku ji bilî bikaranîna çend daçekan pê ve di navbera “rêbera Aydogan û Komxebatê de ferq tune ye. Aydogan “herf” gotiye, Komxebatê “tîp” bi kar aniye; Aydogan “parastina koka bêjeyê” gotiye, daçeka “de”yê bi kar aniye, Komxebatê “parastina awayê lêksemî” gotiye û “da tercîh kiriye ku ev jî ne ferqên cidî ne.

Lêbelê divê bê gotin ku jixwe bingeha rêbera Komxebatê pirtûka Mistefa Aydogan a bi navê “Rêbera Rastnivîsînê” ye û ev xal di pêşgotinê de hatiye destnîşankirin.²⁵

Rêbera Rastnivîsînê jî ne tene qaîdeyên rastnivîsînê dide. Tewang, veqetandek mijarên rêzimanî ne û têra xwe cih girtine di xebatê de.

Kitêb -belkî gotineke giran be- lê ji bilî naveroka xwe bi pêşgotinê jî ji ya Aydogan ne cuda ye û gava mirov li paragrafa yekem, duyem, pêncem binêre ev rewş xweş diyar dibe.

Di heman demê de divê bê gotin ku “Rêbera Rastnivîsînê” ya Komxebatê di nav xwendevan, nivîsevanan de deng veda û gelek nivîs li ser hatin nivîsîn.

1.4 Hin Xebatên Din Yên Rastnivîsînê

Gava em bi giştî li xebatên li ser rastnivîsînê binêrin, em dibînin ku bi du awayan berhem derdikevin pêşberî me. Awayekî xebatê rasterast li ser rastnivîsînê - xebatên mijara me bi vî awayî ne- ye, awayekî din jî cihdana xalên rastnivîsînê ye di kitêbên rêzimanê de. Xebatên ku em ê niha behsa wan bikin dikevin koma duyem.

²⁵ Komxebata Kurmancîyê, **Rêbera Rastnivîsînê**, Weqfa Mezopotamyayê, Stenbol, 2019, r. 18.

1.4.1 Bingehên Gramera Kurdmanciyê

Di nav van xebatan de ya ku divê em pêşî behsa wê bikin xebata Celadet e. Celadet ji hemarên Hawarê ya 27an pê ve dest bi rêzenivîsekê dike û heta hejmarê 54an 22 beşan dinivîse. Navê vê nivîsê “Bingehên Gramera Kurdmanciyê” ye. Di nivîsan de Celadet herçiqasî rasterast ne li ser rastnivîsîna bêjeya raweste jî di ravekirina mijarên rêzimanê de tercîha wî heşkere dibe. Çend mijarên ku Celadet li ser wan sekiniye tîp, tîpa dubare, niqteşanî, guherbariya navdêran, zayend, mêjer, pronav (cînav), rengdêr, bikaranîna “nîv”, “yek” û “hezar”ê û hwd in.

1.4.2 Kûrtçe Gramer (Rêzimana Kurdî)

Ev kitêb ji aliyê Celadet Ali Bedirhan û Roger Lescot ve hatiye nivîsîn. Ji weşanxaneyê Avestayê derketiye û li Stenbolê di sala 2004an de çapa wê ya duyem hatiye kirin. Zimanê kitêbê yê orjînal Fransî ye. Di pêşgotinê de Kendal Nezan dibêjê pêşî di sala 1970yî de bi navê “Grammaire Kurde (Dialecte Kurmandjî)” ji aliyê weşanxaneyê Librarie d’Amérique et d’Orient ve hatiye weşandin û ji ber qiymetê wê yê zanistî me kitêb wergerand kurdî.

Berhem 371 rûpel e. Bi pêşgotina Kendal Nezan dest pê dike û bi navê destpêkê nivîseke Roger Lescot di kitêbê de cih digire. Kitêb ji sê beşên sereke pêk tê ku ew jî “alfabe û fonetîk”, morfolojî û peyvîrêzî ne. Li gel van beşan di dawiya kitêbê de listeyê xebatên li ser rêziman û ferhengên kurdî hatiye dayîn û endeks jî cih digire.

Di berhemê de rasterast li ser rastnivîsînê nayê rawestin. Ji ravekirina qaîdeyên rêzimanê nêrîna nivîskarên a li rastnivîsînê tê xuyakirin.

1.4.3 Rojnameya Kurmancî

Derbarê rastnivîsînê xebata Enstîtûya Kurdî ya Parîsê jî xebateke berbiçav e. Enstîtû sala 1987an rojnameyekê bi navê “Kurmancî” diweşîne û bo xebatê jî ji çar aliyên welêt pîspor û zimannasan tîne cem hev û carinan bi înzeya rojnameyê, carinan bi navê kesan cih dide mijarên rêzimanê û rastnivîsînê jî. Enstîtû hêj jî xebatên xwe didomîne û di rojnameya “Kurmancî” de cih dide encamên xebatê. Rastnivîsîna jîmaran, binavkirina jîmarên rêzê, rastnivîsîna hin daçek û hokeran

(Reşo Zîlan) û hwd. Rojname herweha cih dide termen gelek şaxên zanistî û peyvên klasîkên kurdî, gotinên di stranên de û devokên kurmancî jî.

1.4.4 Kovara Bergehê

Xebateke din ku li ser rastnivîsîn û rêzimanê hatiye kirin jî di şeş hejmarên kovara “Bergeh”ê de cih digirin. Bergeh sala 1929an li Swêdê bi tirkî û kurdî çap dibe. Di kovarê de bi navê “Reformek Pêwîst e (Hin bîr û hizrên li ser pirsên rêzimanî û rastnivîsîna kurdî)” Reşo Zîlan rêzenivîsekê diweşîne. Wekî ku ji navê nivîsê jî diyar e di nav mijarên rêzimanê de behsa qaîdeyên rastnivîsînê jî dike.

1.4.5 Zimanê Kurdî/Rênivîs

Ev kitêb ji aliyê Deham Ebdulfettah ve hatiye nivîsîn. Ji weşanxanêya “Kawa-bo rewşenbîriya Kurdî” derçûye û sala 1998an li Beyrûtê hatiye çapkirin.

Kitêb 150 rûpel e û weke “lêkolîn”ê hatiye binavkirin. Di serê kitêbê de li gel pêşgotina nivîskar Deham Ebdulfettah, bi navê “Gotinek ji Dil” Rezoyê Osê jî nivîsek nivîsiye. Tarîxa van nivîsan 1997 e û ev jî dide xuyakirin ku kitêb sala 1997an hatiye amadekirin. Li gel van her du nivîsên pêşekî kitêb, ji 19 beşan pêk tê. Nivîskar piştî ku “elfabeya zimanê kurdî” pêşkeş dike, li ser mijarên tîpên gîrnivîs û hûrnivîs, zêder, xaleşanî, jêketina tîpan, hevguhêrîna tîpan, nivîsîna peyvan di navbera lêvkirin û wateyan de, tîpên dubara, navdêrên hevbend, lêker, hevdengiya lêker û navan, nivîsîna “her”ê, nivîsîna “tu”ya bi wateya “hîç, kok, bintar”ê, mandebêj, verês, bendik û peyvên hevgirêdayî radiweste.

Derbarê vê berhemê tiştêkî din ku divê bê gotin ew e ku weke gelek kitêbên rastnivîsînê Deham Ebdulfettah jî berê xwe daye rêzimanê û xalên rastnivîsînê pê re rave kirine. Nivîsîna “her”ê û “tu”yê ku di gelek kitêbên rastnivîsînê de tune ye di vê berhemê de xalên bi serê xwe ne.

Herweha di çapkirina berhemê de şaşî di rêzkirina rûpelan de çêbûye û bi navê “latika şaşî û rastiyên naverokê” listeyek li berhemê hatiye zêdekirin.

1.4.6 Rêzimana Kurmancî

Xebateke din ku beşa rastnivîsînê vedihewîne berhema Samî Tan ya bi navê “Rêzimana Kurmancî” ye. Kitêb sala 2011an çapa duyem dike. Çapa yekem bi navê

“Rêziman û Rastnivîsa Zaravayê Kurmancî”, sala 2005an digihîje ber desten xwendevanan. Wekî ku ji navê kitêbê jî diyar e, mijarên bingehîn li ser rêzimanê ne lê beşekê ji rastnivîsînê re jî vediqetîne û cih dide xalbendiyê jî. Xalên rastnivîsînê yên ku Samî Tan cih dide wan “fonetîka kurdî û rastnivîs, neyîniya lêkera axaftinê, qertafên “bi” û “bê”yê, guherîn û veguherîna deng, dengdêrên dubare, kurtkirina bêjeyan, alfabe û rastnivîs, rastnivîsîna hejmaran û hwd in.

1.4.7 Rêzimana Kurmancî

Li gel xebatên jorîn Mikaîl Bilbil-Bahoz Baran “Rêzimana Kurmancî” jî cih dide beşa rastnivîsînê. Berhem sala 2008an, ji aliyê Enstîtûya Kurdî ya Amedê ve tê weşandin. Di berhemê de çend xalên rastnivîsînê yên ku cih digirin ev in: Nivîsîna tîpên piçûk û mezin, nivîsîna peyvên dîrokê, nivîsîna lêkeran, nivîsîna hejmaran û hwd. Kitêb piştî bi awayekî li ser navê Bahoz Baran tenê derdikeve. Bi vî awayî çapa wê ya yekem di sala 2012an de ji aliyê ‘Belkî’yê û ya duyem jî sala 2018an de ji aliyê “Wardozi”ê ve digihîje ber destê xwendevanan.

1.4.8 Destpêka Rastnivîsa Kurdî

Li gel van hemû xebatan Kadri Yıldırım bi navê “Destpêka Rastnivîsa Kurdî” notên derse amade dike û berhem di çaxê ku Zanîngeha Artûklûyê ya Mêrdînê bi sedan xwendekarên kurdî perwerde dikirin wekî kitêba derse di destê hin mamosteyan de bû. Kitêb jî 187 rûpelan û çar beşan pêk tê. Herweha destpêkek jî hatiye nivîsîn ku cih dide dîrokçeya rastnivîsa kurdî. Beşa yekem bo mijarên alfabe, deng û tîpan, ya duyem bo mijarên beş û binbeşên bêjeyan, ya sêyem bo hin hejmarên din, ya çarem bo xalbendiyê hatiye veqetandin.

1.4.9 Waneyên Rêziman û Rastnivîsa Kurmancî

Ev kitêba rêziman ji aliyê Çetin TAŞ ve hatiye nivîsîn. Ji weşanxaneyê Dîwanê derçûye û li Stenbolê; di sibata 2013an de çapa yekem, di îlona 2013an de çapa duyem hatiye kirin. Kitêb bi armanca ku xwendekaran amadeyî ezmûnan bike hatiye amadekirin.

Herweha kitêb jî bîst dersên hîndariyê pêk tê. Dersên pêşî mijarên rêzimanê ne, dersa 20an xalbendî ye û dersa 19 an bo rastnivîsîna hatiye veqetandin.

Pevguherîna dengdêran; î'ya beriya “y”yê, “û”ya beriya “w”yê, şedde, kurtkirina bêjeyan, rastnivîsîna pêşgir, hejmar, daçek, cînavk, lêkerên hevedudanî, gihanek, hevalnav, qertafên neyîniyê û bikaranîna tîpên mezin û piçûk ew xal in ku nivîskar li ser wan sekiniye. Li gel van nivîskar di dawiya kitêbê de cih dayê “Ferhengok” û “çavkanîyê” jî.

1.4.10 Dersên Hînbûna Rêzimana Kurdî (Kurmancî)

Weke ku ji navê berhemê jî diyar e, berhem bo hînbûnê hatiye amadekirin. Nivîskarê berhemê Fevzî Özmen e. Ji aliyê “Weşanên Înstîtûta Kurdî ji bo Lêkolîn û Zanist” bi hevkarîya sentera Margîret, sala 2012an li Almaniya çapa yekem û sala 2013an li Herêma Kurdistanê çapa duyem hatiye kirin.

Berhema ku ji 449 rûpelî pêk tê, cih dide mijarên rêzimanê yên wekî navdêr, cînav, lêkêr, rengdêr, daçek, hoker û gihanekan.

Berhem bi awayê çar beşan hatiye amadekirin ku li jêr hatine pêşkêşkirin:

- a. Beşa waneyan: Rêziman, mînak û pêhînî
- b. Bersivdanka pêhîniyên
- c. Xwendin: Wejeya kurdî ya klasîk û nûjen
- d. Tablo, Ferhengokên têgînên rêzimanî û lêkeran.

Herweha behrem bi pêşgotinekê dest pê dike û di serî de derbarê kom û malbatên zimanan bi navê “Çend gotin li ser Kom û Malbatên Zimanan” agahî û grafîk cih digirin û alfabeya kurdî tê rêzkirin. Berhema Fevzî Özmen jî wekî gelek behremên din yên rêzimanê cih dide rastnivîsê jî. Agahiyên derbarê rastnivîsînê di rûpelên 274-277an de cih girtine. Guherîn û veguherîna dangan, piçûk an mezin nivîsandin, bi hev an cuda nivîsandin, ew mijar in ku li ser wan hatiye rawestîn.

1.4.11 Rastnivîsîna Kurdî

“Rastnivîsîna Kurdî” ya ku ji aliyê Nîzametî Akkurt ve derketiye jî kitêbek ji yên rêzimanê ye. Kitêbê weke beşekê cih nedaye xalên rastnivîsînê. Hemû mijarên rêzimanê ne. Li bi sedema ku di navê wê de “rastnivîsîn” derbas dibe, me behsa wê kir lewra dibe ku gelek kes bere xwe bidinê û destvala vegerin.



BEŞA DUYEM

BERAWIRDKIRINA SÊ BERHEMÊN RASTNIVÎSÎNA KURMANCÎ

2. BERAWIRDKIRINA SÊ BERHEMÊN RASTNIVÎSÎNA KURMANCÎ

Wekî ku di destpêkê de hatibû diyarkirin em dê sê berhemên rastnivîsê berawird bikin da ku bi giştî cudayeti an jî wekheviya van berheman bê raçavkirin. Ji berawirdkirinê armanc ne ew e ku em li kêmasiyan bigerin û berçav bikin lê heke hebin helbet em dê di ser re neqevizin. Gava em li navên berheman dinêrin hêj di serî de dixuye ku li ser peyva rastnivîsînê bixwe gengeşî heye: Herçiqasî M. Aydogan û Komxebatê “rastnivîsîn” tercîh kiribe, A. Zêrevan “rastnivîsandin”ê tercîh dike û bi wî awayî bi kar tîne. Ji bilî vê tiştê din ku di navê berheman de balê dikişîne peyva “kurdî” û “kurmancî” ye. Aydogan û Komxebatê “Rêbera Rastnivîsînê” bi kar tînin. Zêrevan, berhem bi “Bingehên Rastnivîsandina Kurdiyê (kurmancî)” bi nav kiriye.

Xaleke din a ku divê bi giştî li ser her sê berheman bê gotin ew e ku Aydogan û Komxebatê bi hûrgilî -çiqasî bişibin hev jî- hema bêje hemû xal dane ber xwe lê A. Zêrevan li gel rastnivîsînê bo vegotinê jî rê nîşan dide û beşeke berhema xwe ji “raçandina tekstê” re vediqetîne.

Bi van xalên li jor hatine vegotin xaleke din a girîng ku divê em lê rawestin wekheviya berhema M. Aydogan û a Komxebatê ye. Komxebatê bi rêzkirina naverokê, bi diyarkirina sernivîs, binnivîsan jî wekî kopiyeye berhema Aydogan e ku mirov bivênevê derbarê wê difikire. Lêbelê li gel vê rewşê li gor ku me di rêbaza vê tezê de jî gotibû niha em dê dest bi berawirdkirina xalên rastnivîsînê bikin û di dawiya berawirdkirina van xalan de çend gotinan derbarê her sê berheman pêşkeş bikin.

2.1. Alfabe

Alfabe ew sîsteme ku bingeha xwe ji dangan digire û di alfabayê de tîp nîşaneyên dangan in. Alfabaya her zimanekî li gor dengên wê derdikeve holê û bo nivîsê gelekî girîng e.

Heçî Zêrevan e di berhema xwe de cih nedaye alfabayê lê di servehiyê de herfên translîterasyonê” di listeyekê de li gor telafiza erebî, herfeên erebî, telafiza medreseyan û herfên translîterasyonê pêşkêş dike.²⁶

²⁶ Zêrevan, *Bingehên Rastnivîsandina Kurdiyê (Kurmancî)*, r. 141.

Aydogan û Komxebat her du jî bi alfabeyê dest pê dikin. Aydogan bi pênaseya tîpan dest pê dike û dibêje ji ber ku tarîxa bikaranîna “herf”ê kevintir e lazim e herf bê bikaranîn lewre di pirtûk û kovarên kevn de tîp tune ye.²⁷

Li gel birêzkirina tîpên alfabeya kurmançî balê dikişîne ser peyvên “dengdêr û dengdar” jî ku Celadet Bedirxan jî bi kar anîne û dibêje bo ku tevlihevî çênebe hewce ye bo “vokal”ê “dengdêr” û bo “konsonant”ê jî “nedengdêr” bê bikaranîn.

Xaleke din ku Mistefa Aydogan balê dikişîne ser têkiliya alfabeyê û dengên zimên in. Bi ya Aydogan ne şert e ku berginda hemû dengên zimanekî di alfabeyê de hebin lê şert e hemû dengên zimanekî yê ku maneguhêr in di wî zimanî de bi awayekî bîn nîşandan.²⁸ Di vî warî de Aydogan serî li Celadet Bedirxan dixê û dibêje:

“Di her zimanî de herçend deng hene ewçend jî tîp peyda dibin. Ji ber ko di zimanê kurmançî de sih û yek dengên bingehîn hene ji lewre tîpên zimanê kurmançî sih û yek in.”²⁹

Lê herçiqasî Aydogan vê fikrê nepejirîne lewra fonemên maneguhêr hene û diviya bihata nîşandan dîsa jî dibêje divê tu kes li gor serê xwe alfabeyekê çêneke û 31 tîpên ku Celadet bo kurmançî kirine bingeh têra nivîsîna kurmançî dikin.³⁰

Aydogan ji bilî van xalan alfabeya herfgotinê jî rave dike û “herfgotina li gor navên merivan” di tabloyekê de zelal dike. Komxebat di mijara alfabeyê de jî Aydogan cuda nafikire lê di cihê “herf”ê de “tîp”ê tercîh dike û 31 tîpên alfabeya kurmançî pêşkêş dike û li pey wan bilêvkirina tîpên nimîndeyên nedengdêran bi tabloyekê zelal dike û hem bi xala alfabeya tîpgotinê hem bi tîpgotina li gor navên mirovan de tenê du nav cuda ne: Aydogan bo “ê”yê “Êzdîn”, bo “f”yê Ferzendê lê Komxebatê bo “ê”yê “êvar” bo “f”yê Ferzende gotiye ku sedema wê jî ne diyar e.

²⁷ Mistefa Aydogan, **Rêbera Rastnivîsînê**, Çapa Yekem, Rûpel, İstanbul, 2012, r. 25.

²⁸ Aydogan, **Rêbera Rastnivîsînê**, r. 28-29.

²⁹ C.A.BEDIR-XAN, **Bingehên Gramêra Kurmançî**, Hawar, Belkî, Çapa Duyem, İstanbul, 2012, r. 456.

³⁰ Aydogan, **Rêbera Rastnivîsînê**, r. 29-30.

2.2 Kîtekirin

Di rastnivîsînê de xalek ji xalên girîng jî kîtekirin e ku dema ku beşa bêjeyekê di rêzê de hilneyê bi bendikekê bê veqetandin û beşa veqetandî dakeve rêza jêr. Bi vî awayî xwendin herikbar dibe û kompozisyoneke nivîse çêdibe. Lê divê neyê jibîrkin ku kîtekirin ji mecbûriyetê tê kirin û heta mimkin be divê kêr bê kirin lewra li dawiya her rêzê kîtekirin xwendina nivîsê zor dike.

Wekî gelek xalên din Zêrevan di berhema xwe de cih nedaye kîtekirinê jî. Aydogan bi pênaseya kîtekirinê dest pê dike û armanc ji kîtekirinê diyar dike û balê dikişîne ser wê ku gava ne pêwîst be divê neyê kirin lewra tesîreke neyînî li xwendinê dike.³¹

Piştî qaîdeyên kîtekirinê, kîtekirina peyvên sade û hevedudanî bi mînakan pêşkêş dike û dîsa bi mînakan cihên ku kîtekirin lê neyê kirin yek bi yek raçav dike. Komxebat jî bi heman awayî li ser kîtekirinê radiweste ku weke ji pênaseyê, ji mînakan, ji sazkirina xalan diyar e carinan tenê daçekeke du diguherin wekî din her du berhem weke hev in:

Pênaseya Aydogan: “Maneya kîtekirina di nivîsê de ev e; gava ku beşê bêjeyekê di rêzê da hilneyê, bi bendikekê ve dihê veqetandin û beşê veqetandî dadikeve rêza piştî wê.”³²

Pênaseya Komxebatê: “Maneya kîtekirina di nivîsê da ev e: Gava ku beşê bêjeyekê di rêzê de hilneyê, bi bendikekê ve dihê veqetandin û beşa veqetandî dadikeve rêza piştî wê.”³³

Aydogan û Komxebat jî du qaîdeyên kîtekirinê pêşkêş dikin: Prensîba yeknedengdêrî û prensîba morfolojîk an jî prensîba movika bêjeyan.³⁴

2.2.1 Kîtekirina peyvên sade li gor prensîba yeknedengdêrî

Aydogan balê dikişîne ser wê ku di vî awayî kîtekirinê de ya bingehîn ew e ku beşa peyvê ya piştî bendikê bi nedengdêrekê dest pê bike.

³¹ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 33.

³² Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 33.

³³ Komxebat, r. 21.

³⁴ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 34; Komxebat, r. 22.

Nimûne:

zaro-kê, za-rokê, zaro-kên...³⁵

Piştî van mînanan Aydogan diyar dike ku bi vî awayî peyv carinan tixûbên xwe yên xwezayî winda dikin û gava ku mirov bixwaze tixûbên xwezayî biparêze peyvên sade li gor vê qaîdeyê neyên kîtekirin.

Nimûne:

hes-pê, miş-kê...³⁶

2.2.2 Kîtekirina peyvên sade li gor prensîba movika bêjeyan

Bi vî awayî kîtekirin ew e ku bêje li gor tixûbên morfemên xwe dabeş bibin.

Bo wê xalê Aydogan destnîşan dike ku divê mirov li avabûna peyvên binêre û peyvên sade berî pirtika tewangê yan jî veqetandekê dabeş bike:

Nimûne:

bêje-yek, bêje-yê, bêje-ya...³⁷

Li gel van tixûbên xwezayî bo pêşgir û bêjeyan jî heye û divê bi awayê li jêr dabeş bibin.

Nimûne:

da-weşîn, hil-dan, bê-bav;³⁸

Herweha Aydogan dibêje gava ku tixûbên bêje û pêşgiran diyar bin mirov dikare di navbera du herfên dengdêr de jî kîtekirinê bike.

Nimûne:

bê-êş, bê-ar û hwd.³⁹

³⁵ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 34.

³⁶ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 34.

³⁷ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 35.

³⁸ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 35.

³⁹ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 35.

Aydogan herweha dibêje ku heman prensîp bo bêje û paşgiran jî derbas e û gava tixûbên bêje û paşgiran diyar bin mirov dikare kîtekirinê di navbera du herfên dengdêr de jî bike.

Nimûne 1:

rê-baz, saz-bend, reş-bîn û hwd.

Nimûne 2:

bombe-avêj, ga-ajo, pê-alês û hwd.⁴⁰

2.2.3 Kîtekirina bêjeyên hevedudanî

Aydogan bo bêjeyên hevedudanî jî dibêje ku tixûbekî wan yê xwezayî heye û divê bi wî awayî bîn veqetandin mîna ku ne bêjeyên hevedudanî bin û bendika kîtekirinê jî piştî movika hevedudaniyê bê danîn:

Nimûne:

pêş-ketin, ser-dan, nav-no, ser-mezin û hwd.⁴¹

2.2.4 Cihê ku kîtekirin lê nabe

Di her zimanî de hin cih hene ku kîtekirin lê nabe, Aydogan bo kurmnaçî xalên jêrîn diyar dike:

Sernivîs: Pêncî û Şeş Saliya Komara Qazî Mihemedê Nemir

Serenav: Serdar, Gulistan...

Kurtkirin: YE, DVD...

Hejmar: 1639, 1957

Nivîsîna pîvanan: m/s, km/h, km²

Hejmar û nîşan bi hevdû re: %25, t35, 1000 GB

Bêjeyên yekkîteyî: derd, kurd, tirk û hwd.

⁴⁰ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 36.

⁴¹ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 36.

Nivîsîna navnîşanên posteya elektronîk: malu@un.org⁴²

Di mijara kêtekirinê de Komxebat li gor Aydogan çûye û ji bilî cihguhertina çend mînanan tiştêk lê zêde nekiriye tenê kêtekirina bêjeyên hevedudanî “kêtekirina bêjeyên nêside” gotiye. Di mijara “kêtekirin li ku nabe?” de nimûneyên Aydogan weke “Pêncî û Şeş Saliya Komara Qazî Mihemedê Nemir” û di bin re “Li Afrîkayê Xela Heye” derbas dibin. Komxebatê cihê nimûneyan guheriye û sernivîsa yekem bi awayê “Pêncî û Şeş Saliya Komara Mehabadê” daye.⁴³

2.3 Navê Bajarên Kurdistanê

Wekî gelek xalan A. Zêrevan li ser vê mijarê nesekiniye lê herçiqasî navên bajarên welêt bi giştî ne mijara rastnivîsînê bin jî hem Aydogan hem Komxebatê bi awayekî alfabetîk cih dane navên hemû bajarên welêt. Aydogan sernivîs weke “Navên Bajarên Kurdistanê” lê kiriye.⁴⁴ Di her du berheman de jî derbarê tercîhkirina vê xalê agahî nehatiye dayîn û xal nehatiye ravekirin. Bo navên çend bajarokan tercîhên her du berheman ji hev cuda ne.

2.3.1 Bajarên Kurdistanê Bakurî

Ji ber ku li ser hin bajarên Aydogan û Komxebat ne hemfîkr in em dê bi tabloyekê vê diyar bikin û pêwîst be hin tiştan lê zêde bikin:

M. Aydogan⁴⁵

Bidlîs

Elcewaz

Pulur

Dara Hênê

Êlîh (Batman)

Komxebat⁴⁶

Bedlîs

Adilcewaz

Pilûr

Dara Hênê

Batman (Êlîh)

⁴² Aydogan, **Rêbera Rastnivîsînê**, r. 37-38.

⁴³ Komxebat, r. 21-25.

⁴⁴ Aydogan, **Rêbera Rastnivîsînê**, r. 39; Komxebat, r. 27.

⁴⁵ Aydogan, **Rêbera Rastnivîsînê**, r. 40

⁴⁶ Komxebat, r. 27-28.

Qabilcewz	Qabilcewz (Sason)
Çildar	Çildir
Bardîz	Bardiz
Xorasan	Xoresan
---	Mihacir
Elbistan	Albistan
Koksen	Goksûn
Çêlikan	Cêlikan
---	Serê Golan
Misrîç	Misirc
Dîwrîgî	Dîwrig
Hafîk	Hefîk
Qenxal	Qengal
Basê	Basan
Bergir	---

2.3.2 Bajarên Kurdistana Başûrî

Aydogan heft, Komxebat şeş bajarên rêz dîke û jî aliyê bajarokan ve ferq zêdetir in. Komxebatê parêzgeha Helebçeyê li bajarên zêde kiriye lê cih nedaye Teqteqê.⁴⁷

2.3.3 Bajarên Kurdistana Rojhilafî

Aydogan jî Komxebatê jî cih dane çar bajarên, Komxebatê bajarok zêde kirine.⁴⁸

⁴⁷ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 40; Komxebat, r. 28.

⁴⁸ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 41; Komxebat, r. 29.

2.3.4 Bajarên Kurdistana Başûrê Rojavayî

Di her du berhemana de jî du bajar hene (Hisîça, Efrîn).

Aydogan bo Efrîne, bajarokê Kobanî tenê destnîşan dike lê Komxebat ji bilî Kobanê cih dide Bilbilê, Cindirês, Mabetan, Raco, Şeran, û Şîyê jî.⁴⁹

Di vê xalê de tiştê bala mirov dikişîne tewandina navên hêlan e. Kurdistana Bakurî, Kurdistana Başûrî, Kurdistana Rojhilatî û hwd mînakên vê ne. Xuyaye bêjeyên bakur, başûr û hwd wekî navdêran hatine bikaranîn. Rast e, navdêr in lê bi ya me ne her gav. Rengdêriya van peyvana hatiye paşguhkirin û bi awayekî mekanîk li wan hatiye nêrîn. Gava em li “Cambridge Dictionary” xala “south”ê ku hemwateya “başûr” e dinêrin em dibînin ku weke sê cureyan hatiye nirxandin û bo du cureyan jî mînakên bikaranîne hene.

South Africa (bo rengdêrê)

South of Africa (bo navdêrê)⁵⁰

Bikaranîna di tirkî de jî piştgirîya vê dike. Lewra di tirkî de rengdêr berî navdêran tên û curbicur taybetmendiyên wan nîşan didin.

Güney Afrika

Afrika'nın güneyi

Lê ne Aydogan ne Komxebatê ev li ber çavan girtiye û di bikaranîna “Bajarên Kurdistana Başûrî” û hwd din de bêjeyên “başûr, bakur” hatine tewandin. Ji aliyekî ve jî ew heye ku meseleyeke rêzimanê bi xeletî hatiye şîrovekirin û bo wê qaîdeyên rastnivîsînê hatine danîn.

2.4 Navên welat, paytext û yekîneyên pereyan

Di berhemên rastnivîsînê de herçiqasî qaîdeyên giştî yên li ser rastnivîsîna welat, paytext û yekîneyên pereyan hebin jî bo navê hemû welatan cih nayê dayîn lewra pirtûkên rastnivîsînê ne pirtûkên erdnîgariyê ne. Lêbelê dîsa jî hem Aydogan hem Komxebat her yek ji wan bi lîsteyeke berfireh û alfabetîk cih didin navên hemû

⁴⁹ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 41; Komxebat, r. 29.

⁵⁰ <https://dictionary.cambridge.org/tr/> Nêrîna Dawî: 04.05.2019.

welat, paytext û yekîneyên pereyan. Di nivîsînê de dixuye ku li ser hin xalan lihevkirinek tune ye. Li gorî Aydogan yekîneyên pereyan, bi tîpên girdek dest pê dikin: Wekî nimûne, “Lek, Ewro, Kwanza” û hwd.⁵¹ Lê Komxebat tîpên hurdek dipejirîne û bi awayê “lek, ewro, kwanza” bi kar tîne.⁵²

Di navbera her du berheman de (ya Aydogan û ya Komxebatê) ji bilî çend ferqên piçûk hemû nav weke hev in. Wekî mînak Aydogan “Andorra” bi du “r”yan nivîsiye lê Komxebatê “Andora” tercîh kiriye. Dîsa Aydogan “Awustralya, Awusturya, Azerbaycan, Bûlgarîstan” bi kar aniye lê Komxebatê “Awistralya, Awistiryay, Azerbeycan, Bulgarîstan” tercîh kiriye.⁵³

Ji bilî van ferqên piçûk, xaleke din di berhema Komxebatê de li ber çavan dikeve ku bi me girîng e. Komxebat ji Aydogan cuda gava yekîneyên pereyan di ravekê de bi kar tîne dibêje “pesoyê arjantînî, dolarê bermûdayî û dolarê brûneyê.”⁵⁴

Di nimûneyan de tiştê li ber çavan dikeve ew e ku “arjantînî” û “bermûdayî” weke navên neteweyan hatine qebûlkirin û bi hûrdekan hatine destpêkirin. Li gel vê “brûney” weke navê welêt hatiye pejirandin lê dîsa jî bi hûrdekê dest pê kiriye. Gava em li gor tirkî bifikirin û bêjin “Türk lirası” an jî “Amerikan doları” hewce ye bi awayê “lîreyê tirkî” an “dolarên amerîkiyan” bên nivîsîn. Herweha di îngilîzî de jî dibêjin “turkish lira” an “American dollar” ku ji tirkî ne cuda ye. Lê tercîha Komxebatê li her du zimanan jî nake. Lewra gava em bêjin “bermûdayî” ev tê wateya “kesê ji Bermûdayê” û bo yekîneyên pereyan bikaranîna bi vî rengî ne li rê ye. Herçî bikaranîna Aydogan e herçiqasî ne li gor ya îngilîzî be jî ji berk u aîdiyetê bi welêt re çêdike gava lihevhatinek li ser bibe, di cih de ye.

2.5 Navên gel/netewe û zimanan

Zêrevan derbarê vê xalê jî tiştê negotiye û wekî xalekê cih nedaye vê mijarê. Aydogan berî nimûneyan rêz bike dibêje: “Navên gel/neteweyan û zimanên wan bi

⁵¹ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 42.

⁵² Komxebat, r. 30.

⁵³ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 42; Komxebat, r. 30.

⁵⁴ Komxebat, r. 30.

hûrdekê dest pê dîkin û bi awayê gel/netewetî tîn nivîsîn.⁵⁵ Komxebat jî li gel heman tiştî bêjeyekê li ya Aydogan zêde dike û dibêje bi giştî weha tîn nivîsîn.⁵⁶

Nimûneyên ku ji aliyê her du berheman ve hatine dayîn kêm zêde weke hev in. Bo hin nimûneyan dîsa ferqên piçûk hene ku Aydogan “arnawud/arnawûdî” bi kar tîne lê Komxebat “arnawid/arnawidî” tercîh dike. Peyveke din ku balê dikişîne “ermen/ermenî” ye û “ermenî” li gor Komxebatê weke zimanê ermenan hatiye tercîhkirin lê di zimanê rojane de weke navê gel/netewe tê bikaranîn.⁵⁷

Di vir de bêjeya “ermenî” li ber çavan dikeve ku bi wê, mirov têdigihîje ku gava qaîde tîn danîn divê îstîsnayan jî vehewînin. Lewra gava “ermenî” tê gotin weke di ferhenga Îzolî de⁵⁸ diyar e “file” tê bîra gelek kesan lêbelê Komxebatê bo navê gel “ermen” bo navê zimên “ermenî” pêşniyar kiriye.⁵⁹ Herçiqasî di kovara “Kurmancî” ya 39an⁶⁰ de Têmûrê Xelîl jî peyva “ermenî” bi kar anîbe, di hejmara 41ê⁶¹ de “ermenkî” bi kar tîne û tevliheviyê ji holê radike. Bi ya min jî herçiqasî ji aliyê rêzimanî, bêjeya “ermenî” bo zimên rast be jî sedema ku rê li ber şaştgihîştinê bigire “ermenkî” rasttir û dirusttir e.

2.6. Navên Hêlan

Di nivîsê de xaleke ku serê mirov tevlihev dike jî navên hêlan in lewre navên hêlan carinan wek rengdêran jî tîn bikaranîn û bi bêjeya li pey xwe re navên cihan çêdikin. Xuyaye Aydogan jî Komxebat jî bi vê mebeste qaîdeyên nivîsana hêlan yek bi yek rave kirine. A. Zêrevan bixwe ev mijar di bin xala girdek û hûrdekan de rave kiriye û dibêje “navên aliyên cografîk” bi hûrdekê dest pê dîkin lê heger mebest jê herêmeke diyarkirî be hingê mirov bi girdekê dinivîse û bo mînakên “başûr, bakur, Kurdistana Bakur, Emerîkaya Başur û hwd dide. Zêrevan di heman demê de dibêje heger mirov cotnavê hinek cihên cografîk bi bendikê girêbide divê navê duyem bi hûrdekê bê nivîsîn:

Nimûne:

⁵⁵ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 38.

⁵⁶ Komxebat, r. 38.

⁵⁷ Komxebat, r. 38.

⁵⁸ Ferhenga D. Îzolî, *ermenî*, Deng, Çapa 8’an, Stenbol, 2013.

⁵⁹ Komxebat, r. 38.

⁶⁰ Têmûrê Xelîl, *Peyvên Kurdî û Îranî di Ermenî de*, *Rojnameya Kurmancî*, Hejmar 39, r. 1.

⁶¹ Têmûrê Xelîl, *Pêwendiyên Ermenkî û Kurdî yên Zimên*, *Rojnameya Kurmancî*, Hejmar 41, r. 5.

Rojhilata-nêve, Rojhilata-dûr û hwd.⁶²

Aydogan li gel ku navên hêlên sereke destnîşan dike dibêje divê heger ne serenav bin divê bi tîpa piçûk dest pê bikin û mînakên bakur, başûr, rojhilat û rojava dide.

Aydogan bo zayenda hêlan jî dibêje nêr in û nîşana veqetandakê ya jî bo wan “e” ye:

Nimûne:

bakurê Kurdistanê, başûrê Kurdistanê û hwd.⁶³

Aydogan derbarê çar hêlên nesereke jî bakurê rojhilatî, bakurê rojavayî, başûrê rojhilatî, başûrê rojavayî destnîşan dike lê di wê baweriyê de ye ku ji bo bilêvkirin û nivîsîna hêsan baş e wekî yektêgihê bakurrojhilat, bakurrojava, başûrrojhilat, başûrrojava bîna nivîsîn û zayenda wan jî “nêr” be. Aydogan bi jêrenotekê dixwazê pirsgirêka “î” ya dawiya hêlên nesereke rave bike û em jî dê paşê vê şîrove bikin.

Nimûne:

bakurrojhilatê Kurdistanê.⁶⁴

Komxebat di vê mijarê de jî bi heta jêrenotê jî Aydogan dubare dike û heman mînakan dide.⁶⁵

Hem Aydogan hem Komxebat di bin sernîvîsa hêlan de dibêjin gava hêl navên deveran bin divê tîpa wan ya destpêkê bi girdekê bê nivîsîn û di vê rewşê de zayenda wan mê ye:

Aydogan⁶⁶

Rojhilata Navîn

Rojhilata Dûr

Komxebat⁶⁷

Rojhilata Dûr

Rojhilata Navîn

⁶² Zêrevan, **Bingehên Rastnivîsandina Kurdiyê**, r. 56.

⁶³ Aydogan, **Rêbera Rastnivîsînê**, r. 52.

⁶⁴ Aydogan, **Rêbera Rastnivîsînê**, r. 53.

⁶⁵ Komxebat, r. 39-40

⁶⁶ Aydogan, **Rêbera Rastnivîsînê**, r. 54.

⁶⁷ Komxebat, r. 40

Aydogan û Komxebat behsa xaleke din dikin ku ew jî navdêrbûna bêjeyên “bakur, başûr” û hwd e. Dibêjin heger bêjeyên “Bakur, Başûr” navê deveran bin zayenda wan “mê” ye û divê wisa bên tewandin û her du jî bi jêrenotekê dixwazin vê xalê piştrast bikin.

Aydogan⁶⁸

Ez dê biçim Başûrê

Ez ji paytextê Başûrê hatim

Komxebat⁶⁹

Ez dê biçim Bakurê

Ez dê biçim Başûrê

2.7 Navên Rojan

Di rastnivîsînê de xaleke girîng jî navên rojan e.

Arif Zêrevan ev xal jî ji xwe re nekiriye mijar. Di vê xalê de jî hem Aydogan hem Komxebat navên rojan bi vî awayî didin û dibêjin bi heke ne rojêke taybetî be bi hûrdekan dest pê dikin:

Aydogan⁷⁰

yekşem, duşem, sêşem, çarşem, pêncşem, îni, şemî

Bo rojên taybet: Çarşema Reş

Komxebat⁷¹

yekşem, duşem, sêşem, çarşem, pêncşem îni, şemî

Bo rojên taybet: Çarşema Reş**2.8 Navên Demsalan**

Ev jî xaleke ku nîqaş li ser nabe û weke gelek xalan Zêrevan cih nade vê mijarê jî Aydogan û Komxebat piştî navê demsalan destnîşan dikin (bihar, havîn,

⁶⁸ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 54.

⁶⁹ Komxebat, r. 40

⁷⁰ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 55.

⁷¹ Komxebat, r. 41

payîz, zivistan) dibêjin heke ne navê demsaleke taybetî bin bi hûrdekê dest pê dikin.⁷²

Komxebat bo navên taybet nimûneya “Bihara Erebi” dide.⁷³ Lê em dixwazin vê bibêjin ku Erebi di vir de weke rengdêrekê jî tê fêmkirin û dibe sedema şaştêgihiştinê. Lewra hewce ye ku mirov wekî “Bihara Ereban” bi kar bîne.

2.9 Navên mehan

Di rastnivîsînê de xaleke serê mirovan tevlihev dike jî navên mehan e. Kesên bi nivîsê re eleqedar miheqeq di vî warî de dudilî dimînin û em bawerin nivîskar jî, edîtor jî berî binivîsin serî li çend çavkaniyan didin.

Xuyaye Aydogan jî bi vê mebestê ev xal bi serîlêdana gelek çavkaniyan bi berfirehî rave kiriye. Li gor Aydogan di nivîsîn an gotina navên heşt mehan de (nivîsîna hezîranê ne tê de) hevfikeyek heye û ev meh; sibat, adar, nîsan, gulan, hezîran, tîrmeh, tebax û îlon in.

Aydogan bo ravekirina çar mehên din serî li Hawarê, li Garzonî, edebiyata klasîk, romanên kurdan û folklorê dide⁷⁴ û paşê digihîje wê fikrê ku bo meha dehem çiriya pêşîn, bo ya yazdehem çiriya paşîn, bo ya dozdehem kanûna pêşîn, bo meha yekem kanûna paşîn bê gotin û heke ne navên taybet bin bi hûrdekê dest pê bikin.

Komxebat di vê xalê de ji Aydogan cuda nafikire û bêtî ku agahiyan bide navên mehan wisa rêz dike:

Kanûna paşîn, sibat, adar, nîsan, gulan, hezîran, tîrmeh, tebax, îlon, çiriya pêşîn, çiriya paşîn, kanûna pêşîn.⁷⁵

Navên mehan jî ew xal e ku gelek caran serê mirov diêşîne lewra bi awayên cuda hem di nav gel de hem di edebiyatê de hatine bikaranîn. Hawarê bixwe jî di serî de bi awayekî paşê bi awayekî nîşan kirine.

- | | |
|----------|-------|
| 1- Adar | Adar |
| 2- Nîsan | Nîsan |

⁷² Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 56; Komxebat, r.42.

⁷³ Komxebat, r.42.

⁷⁴ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 58-61.

⁷⁵ Komxebat, r. 43

3- Gulan	Gulan
4- Hizêran	Hizêran
5- Tîrmeh	Tîrmeh
6- Tebax	Tebax
7- Îlon	Îlon
8- Çiriya berî	Çiriya pêşîn
9- Çiriya paşî	Çiriya paşîn
10- Çileyaya berî	Kanûna pêşîn
11- Çileyaya paşî	Kanûna paşîn ⁷⁶
12- Sibata ⁷⁷	Sibat

Kovara “Kurmancî” jî di hejmarê yekem de dest avêtiye vê xalê û navên mehan wisa rêz dike:

(Li gor rêzkirina Hawarê)

Adar	Îlon
Nîsan	Çirî
Gulan	Teşrîn
Hezîran	Kanûn
Tîrmeh	Çile
Tebax	Sibat

Dixwazim vê bêjim bi sedema ku zimanê nivîskî rûnenîştîye helbet dê navlêkirinên cuda hebin û jixwe hene. Celadet wê demê helbet li klasîkên kurdan, li folklorê, li axaftina gel nêrî û li gor wê guhertinê kirin. Dibe ku ev, rewşa bê dîtin lêbelê îro guhertina hin tiştan, di zimên de tevliheviyekê derdixe holê. Kovara Kurmancî di bin banê saziyekê de diweşe û hin kesên di wir de cih girtine di nav Komxebatê de jî hene. Dîsa jî navên bo mehan ku di kovarê de cih girtine tînan guhertin û yê nû derdikevin pêşberî me. Madem rastnivîs lihevhatinek e vezîfeya

⁷⁶ Hawar, Belkî, Çapa Duyem, İstanbul, 2012, r. 778-779.

⁷⁷ Hawar, r. 29.

xebatkarên sehayê ye ew e ku rê li ber tevliheviyan bigirin û rêya xwendevanên wî zimanê jî paqij bikin. Ango di vê xalê de mesele ne meseleya rastî û çewtiyê ye û em bi wê re ne ku heta ji xebatkarên nivîsê bê, zimên nêzî hev bikin lewra bi salan e bi sedema ku zimanê me ne zimanê perwerdehiyê ye gelek waryantên bêjeyan derketine holê.

2.10. Tîpa Ducare

Tîpa ducare jî yek ji wan xalan e ku di nivîsê de serê mirov diêşîne. Hem bo bêjeyên kurdî hem bo bêjeyên erebî û bêjeyên ji zimanên ewropayî gelek caran dibe sedema tevliheviyê. Hem Aydogan hem Komxebat li gel xala sereke vê mijarê bi pênc binxalan (binnivîsan) destnîşan dikin. Di berhema A. Zêrevan de ev mijar jî cih nagire.

2.10.1 Tîpa ducare di kurmancî de

Aydogan di vê mijarê de balê dikişîne ser wê ku di bêjeyên kurmancî de herfa ducare tune ye û bi jêrenotekê mijarê zelal dike.⁷⁸ Û dibêje hewce ye bêjeyên mîna “ger, şer, ker, û hwd” bi awayê ku me nivîsandiye bêyî herfa dawî bê dubarekirin bîn nivîsîn.

Nimûne:

Rast	Xelet
ger	gerr
gelek	gellek
pir	pirr ⁷⁹

2.10.2 Tîpên ducare yên bêjeyên ji erebî

Bo vê xalê Aydogan listeyeke berfireh ya ji erebî rêz dike û dibêje divê tîpên ducare yên bêjeyên erebî bi tîpekê bîn nivîsîn.

Nimûne:

⁷⁸ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 63.

⁷⁹ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 63.

Awayên erebî

cebbar

cedd

cennet

cerrah û hwd.

Awayên kurmancî

cebar

ced

cenet

cerah û hwd.⁸⁰**2.10.3 Tîpên ducare yên bêjeyên ji zimanên ewropayî**

Di vê xalê jî Aydogan bo tîpên ducare yên ji bêjeyên zimanên ewropayî tîpekê dipejirîne:

Awayên biyanî

assimilasyon

intellectuel

collection

Awayên kurmancî

asîmîlasyon

entelektuel

koleksîyon⁸¹**2.10.4 Rewşên ku divê rehmoformem bê parastin**

Ev ew rewş in ku divê bêje bixwe bê parastin.

Li gor Aydogan gava bi pêşgirekê bêjeyeke nû bê çêkirin û ew pêşgir bi tîpa destpêka bêjeyê biqede û li gel paşgira danberheviyê divê tîpa ducare bê parastin.

Nimûne:

Bê+êm – bêêm

Bê+êş – bêêş

Xurt+tir – xurttir

Rast+tir – rasttir⁸²**2.10.5 Gava ku ji du bêjeyan bêjeyeke hevedudanî bê çêkirin**

Di vê xalê de jî Aydogan li gel wê ye ku koka bêjeya pêşî bê parastin û tîp ducare bê nivîsîn.

⁸⁰ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 64-65.

⁸¹ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 66.

⁸² Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 66-67.

Nimûne:

ziman+nasî – zimannasî

kiras+sor – kirassor⁸³**2.10.6 Nivîsîna navdêrên lêkerî û tîpên ducare**

Aydogan bo vê xalê jî li aliyê parastina tîpa ducare ye û bi van mînakên mijarê zelal dike:

Nimûne:

şer rawestandî – şerrawestandî

agir rijandî – agirrijandî⁸⁴

Komxebat dîsa di vê mijarê de, ji Aydogan cuda nafikire û hema bêje bi heman agahî û mînakên berhema Aydogan û ya Komxebatê weke hev in.⁸⁵

2.11 Nivîsîna bêjeyên ku bi “-stan”ê tîpên çêkirin

“-stan” paşgîrek e ku navên gelek welatan jî tê de bêjeyên nû çêdike. Aydogan û Komxebat bi sedema ku ew paşgir bi “s”yê diqede û gava bi vî awayî tê paşiya bêjeyê xwendinê zor dike divê li pêşiya wê “i” jî bê bikaranîn û bilêvkirina bêjeyê hêsantir bibe. Di her du berhemên de jî mînak yek in:

Kurd+stan – Kurdistan – Kurdistan

Awayên rast

Bûlgaristan

Efxanistan

Awayên nerast

Bûlgarîstan

Efxanîstan⁸⁶**2.12 Pirsên bêjeyên ku bi “i”yê dest pê dikin û bi “i”yê diqedin**

Pirseke din ji rastnivîsînê pirsên “i”yê ye lewra wekî ku Celadet jî⁸⁷ dibêje û Aydogan jî vê qaîdeyê jê digire bêjeyên kurmancî ji bilî çend daçekan (“bi”, “ji”, “li”) bi “i”yê dest pê nakin û bilêvkirina wan di serî de hinekî zehmet e.

⁸³ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 68.⁸⁴ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 68.⁸⁵ Komxebat, r. 44-49.⁸⁶ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 69; Komxebat, r. 50.

Bi vê sedemê Aydogan jî û Komxebat jî li gel wê ne ku divê bêjeyên mîna “Îhsan, Îsmaîl, Însan” bi awayê “Îhsan, Îsmaîl, Îbrahîm û Însan...” bîn nivîsîn.⁸⁸

Bo vê pirsê tiştekî din ku divê bê gotin şîroveya Komxebatê ye ku dibêje hinek kurmancîxêv navên mirovan yên wekî “Îbrahîm, Îhsan, Îsmaîl” weha jî bi lêv dikin û dinivîsin: Birahîm, Hisan û Smaîl.⁸⁹ Helbet wisa ye lê ev nav bi halên xwe yên dawî bûne malê kurmancî wekî gelek navên din û bê çawa hatine pejirandin di nav gel de weha tên bilêvkirin û nivîsîn.

2.13 Nivîsîna hin bêjeyên ku di kêteya wan ya dawiyê de “î” heye

Herçiqasî ku Aydogan û Komxebat di binavkirina vê xalê de li hev nekin* jî di awayê nivîsînê de hemfikir in. Û li gor wan bêjeyên wekî “aql, fikr, qebr û hwd” hem bi serê xwe hem di ravekê de (aqilê min, fikira min...) û hem di bêjeyên nesade de jî (fikirpak, qedirgiran...) “î” bê parastin.⁹⁰

2.14 Nivîsîna “î”ya berî “y”yê

Weke gelek xalên din Zêrevan cih nade vê mijarê jî di xebata xwe de. Aydogan bi hûrgilî li ser vê xalê radiweste û ta bi derziyê vedike. Li gor wî ew e ku di kurmancî de “î” ji bilî çend daçekan ne di serî de ne di dawî de tune ye û divê “î”ya dawîya peyvê bi çî awayî be, bê parastin û bo mînak “derziya min” bi awayê “derziya min” bê nivîsîn. Herweha Aydogan cih dide çend foksionên “î”yê ku di rehmoforman de “î” heye (jîyan, vîyan...), “î” partîsîpên dema bihûrî çêdike (firo+î, keland+î...), navên dever, gel, eşîr û hwd çêdike (Muşî, deşîf, kurdî û hwd) û ji rengdêran navdêrên razber çêdike (başî, serxweşî).⁹¹ Aydogan bi van hemû mînanan dixwaze ev xal di serê mirov de bicemide û her “î” bê parastin.

Komxebat di vê xalê de weke Aydogan difikire û tenê pênc mînanan dide.

Nimûne:

(gundî) gundîyên me

⁸⁷ Hawar, r. 472.

⁸⁸ Aydogan, **Rêbera Rastnivîsînê**, r. 71-72; Komxebat, r. 50-51.

⁸⁹ Komxebat, r. 51.

* Komxebat “nivîsîna hin bêjeyên biyanî yên yekkîteyî ku di kurmancîyê de dibin dukîteyî” tercîh dike.

⁹⁰ Aydogan, **Rêbera Rastnivîsînê**, r. 73-74; Komxebat, r. 52-53.

⁹¹ Aydogan, **Rêbera Rastnivîsînê**, r. 77.

(kuştî) kuştîyên me⁹²

Wekî ku Öpengîn jî⁹³ dibêje “î”ya berî “y”yê jî pirsgirêkeke girîng e û Celadet ji hejmara 27an ya Hawarê pê ve “î”ya berî “y”yê kiriye “î”. Îroroj gava em lê dinêrin em dibînin ku ev terz têra xwe rûniştîye û yên ku pegirîya vê qaîdeyê nekirine jî piştî demekê “î”ya berî “y”yê kirine “î” û di bilevkirinê de jî jixwe bi vî rengî ye. Di vî warî de hem Aydogan hem Komxebat xwe dispêrin qaîdeyên rêzimanê û bi vî awayî paşxaneyê heyî jî paşguh dikin, di cihê ku zimanê nivîsê siviktir bikin giran dikin ku ev dijberî rêbaza zimannasiyê “qanûna hewldana kêmtirîn”e jî.

2.15 Nivîsîna “ê”ya berî “y”yê

Di rastnivîsînê de xaleke din ku tevliheviyê çêdike pirsgirêka “ê”ya berî “y”yê ye. Zêrevan herçiqasî cih nede vê mijarê jî Aydogan û Komxebat di wê baweriyê de ne ku divê tu carî ê”ya berî “y”yê weke “î”yê neyê nivîsîn.⁹⁴

Çend nimûne ji komxebatê

Awayên rast

dêya min

pêyên min

Awayên xelet

diya min

piyên min⁹⁵

Aydogan sedema bikaranîna “ê”yê rave dike lê Komxebat tenê mînakên dide.

Di vê xalê de Aydogan û Komxebat dijberî qaîdeya Celadet û Lescot ku dibêjin gava bêje bi “ê”yê biqedin û pirtikeke bi “y”yê li pey wan were divê “ê” weke “e” bê nivîsîn li gel wê ne ku koka bêjeyê neyê guhertin.

Nimûne

(dê) dêya min

(pê) pêyên min

(rê) rêya dirêj⁹⁶

⁹² Komxebat, r. 54.

⁹³ Öpengin, *Pirsên Rênivîsa Kurmancî: Pêdeçûneke Rexneyî li ser Rêbera Rastnivîsînê ya Mistefa Aydogan*, r. 189.

⁹⁴ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 80; Komxebat, r. 55.

⁹⁵ Komxebat, r. 55.

Aydogan derbarê vê, nimûneya “jina bêyar” dide û dixwaze dîtina xwe piştrast bike lewra gava “ê” biguhere dê bibe “jina beyar” û wate biguhere bibe sedema tevliheviyê.⁹⁷

2.16 Peyvên dunavdêrî

Weke ku Aydogan û Komxebat jî pênase dikin bêjeyên dunavdêrî ew curepeyv in ku ji du navdêran pêk tên û li dû hev tên gotin. Di vî warî de hem Aydogan hem Komxebat di wê baweriyê de ne ku bêjeya kîtekem pêşî û ya din li pey wê bê nivîsîn û gîhanek bikeve navbera wan:

Di her du berheman de jî nimûne hema bêje weke hev in;

ar û agir, ar û namûs, dem û dewran, dek û dolab û hwd.⁹⁸

2.17 Nivîsîna serenavên biyanî yênkes, bajar û deveran

Ev mijarek e ku gelek binxalên wê hene. Zêrevan di vê mijarê de jî tiştekî nabêje. Wekî din derbarê binavkirinê Aydogan û Komxebat dîsa ne hemfikir in lê di rêzkirina xalan de di navbera her du berheman de ferq tune ye. Mînak kêma zêde weke hev in.

2.17.1 Nivîsîna sernivîsên an navdêrên taybetî yên bi tîpên latînî

a-Li gor Aydogan serenavên kes, bajar ku bi alfabeya latînî hatine nivîsîn ji bilî yên ku di kurmancî de bi cih bûne baştir e ku bi awayên orîjînal bên nivîsîn

Nimûne:

William Shakespeare, James Joyce û hwd.

b-Heger serenavekî de tîpên derî alfabeya kurmancî hebin hewce ye bi tîpên kurmancî bên nivîsîn:

Nimûne:

⁹⁶ Komxebat, r. 55.

⁹⁷ Aydogan, **Rêbera Rastnivîsînê**, r. 81.

⁹⁸ Aydogan, **Rêbera Rastnivîsînê**, r. 82; Komxebat, r. 56.

Göteborg – Goteborg

Øvre Richter Frich – Ovre Richter Frich û hwd.

c-Serenavên bi tîpên latîni yê ku ji awayên xwe yê orîjînal cuda tên nivîsîn:

Nimûne:

Zimanê orîjînal	Nivîsîna kurmancî
Napoléon Bonaparte	Napolyon Bonapart
Magalhães	Marelan û hwd. ⁹⁹

2.17.2 Nivîsîna serenavên bi tîpên nelatîni

Bo vê xalê Aydogan bêyî ku mînakan bide bo nivîsîna wan a di kurmancî de, bilêvkirinê dike bingeh û dibêje divê bi tîpên kurmancî ku dikarin di cihên wan de bê bikaranîn bên nivîsîn.¹⁰⁰

2.17.2.1 Nivîsîna serenavên bi tîpên kirîlî

Aydogan bo vê jî li gor bilêvkirinê tîpên kurmancî dipejirîne û dibêje divê weha bên nivîsîn:

Nimûne:

Yewgenî Aleksandrovîç Yevtuşenko, Aleksandr Îsayevîç Soljenitsin

Aydogan bo dengê “x”ya orîjînal jî dibêje divê bi awayê “h”yê neyê nivîsîn.

Nimûne:

Çexov, Mixayil, ne Çehov û Mîhaîl

Ji bilî van hi nav hene ku bi “y”yê bên nivîsîn.

Nimûne:

Dostoyevskiy – Dostoyevskî¹⁰¹

⁹⁹ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 85.

¹⁰⁰ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 86.

2.17.2.2 Nivîsîna serenavên bi tîpên yûnanî

Bo vê xalê jî Aydogan li gor bilêvkirinê tîpên kurmancî nîşan dide lê bi jêrenotekê bo navên bicihbûyî kevanekekê vedike.

Nimûne:

Platon, Ksenefon û hwd.

Bo yêna bicihbûyî nimûne: Aristoteles – Arîsto¹⁰²

2.17.2.3 Nivîsîna serenavên çînî, japonî û koreyî

Aydogan wekî xalên din bo van navan jî awayê bilêvkirinê û latînzekirina navnetewî nîşan dide.

Nimûne:

Konfiçyus, Mao Zedung, Yasunarî Kawabata û hwd.¹⁰³

2.17.2.4 Nivîsîna serenavên hindî

Bo vê xalê jî bilêvkirin û tîpên kurmancî pêwîst dibîne Aydogan.

Nimûne:

Okyanûsa Hindê, Hindistan û hwd.¹⁰⁴

2.17.2.5 Nivîsîna serenavên erebî

Di vê xalê de jî Aydogan balê dikişîne ser wê ku hinek dengên erebî di kurmancî de tune ne û divê heta ku alfabe ev alfabe be hewce ye mirov li gor alfabe ya kurmancî binivîse û pêgiriya vê yekê bike.

Nimûne:

Meaş, Elî, Mesûd herçiqasî tîpa “ع”(eyn) vehewînin jî ne hewce ye di kurmancî de bê bikaranîn¹⁰⁵

Aydogan li gor vê balê dikişîne ser navên bicihbûyî jî û dibêje divê bi awayê bicihbûyî bînin nivîsîn.

¹⁰¹ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 87.

¹⁰² Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 88.

¹⁰³ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 89.

¹⁰⁴ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r.89.

¹⁰⁵ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 90.

Nimûne:

Baqî, Bedir, Behrî, Binyamîn û hwd.¹⁰⁶

2.17.2.6. Nivîsîna serenavên farisî

Bo vê xalê jî Aydogan hewcedariyê bi alfabeya kurmancî dibîne û dibêje ya rast ew e ku bi awayê “Xumeynî, Xamêneyî û hwd” bèn nivîsîn.

Aydogan bo navên hem farisî hem kurdî jî bilêvkirina kurmancî tercîh dike.

Nimûne:

Bihar, Bilend, Cemşîd û hwd.¹⁰⁷

Berhema komxebatê jî bo xala jor di rûpelên 57-63yan de dide xuyakirin ku dîsa hem bi agahî hem bi mînakan bi Aydogan re ye. Jixwe ji ber vê jî me hewcedarî pê nedît ku heman mînakan dîsa binivîsin.

2.18 Nivîsîna hin bêjeyên biyanî

Wekî ku Aydogan jî amaje pê dikedi kurmancî de di warê nivîsîna bêjeyên biyanî de tevliheviyeke zêde heye. Gelek caran mirov di nivîsînê de dudilî dimîne û nizane bi çi awayî binivîse. Aydogan bo vê xalê jî kîjan zimanî be bilêvkirinê dike bingeh û çar qaîdeyên giştî pêşkêş dike. Ev qaîde jî ew in ku divê tîp ducare nebin, tîpa “e”ya dawîya bêjeyên fransîzî neyê bilêvkirin û nivîsîna “ph”yê bi awayê “f”yê bê bilêvkirin û nivîsîn û “que”ya dawîya bêjeyan bi awauê “k”yê bê nivîsîn. Bo vê xalê jî mînak dê ji berhema Aydogan bèn hilbijartin û ji ber ku Komxebat heman tiştî dibêje¹⁰⁸ dê mînak bo wê neyên dayîn lêbelê heke ferq hebe li ser bê rawestîn.¹⁰⁹

2.18.1. Nivîsîna “-ium”ê

Divê “-ium” bi awayê “-yûm” bê nivîsîn

Nimûne:

aluminium – alumînyûm

¹⁰⁶ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 91.

¹⁰⁷ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 93.

¹⁰⁸ Komxebat, r. 64-65.

¹⁰⁹ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 94.

aquarium – akvaryûm¹¹⁰

2.18.2. Nivîsîna “-ia”yê

“-ia” bi awayê “-îya” diguhere.

Nimûne:

dialogue – dîyalog

diabête – dîyabet¹¹¹

2.18.3. Nivîsîna “-io”yê

“-io” vediguhere “-îyo”

Nimûne:

biologie – bîyolojî

bionique – bîyonîk¹¹²

2.18.4. Nivîsîna “-io” ya dawîya bêjeyan

“-io” ya dawîya bêjeyan bi awayê “-yo” tê pejirandin.

Nimûne:

radio – radyo

vision – vîzyon¹¹³

2.18.5. Nivîsîna “-oi”yê

Di nivîsê de “-oi” wekî “-uwa” tê pêşkêşkirin

Nimûne:

toilette – tuwalet

laboratoire – laboratuwar¹¹⁴

¹¹⁰ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 95.

¹¹¹ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 95.

¹¹² Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 96.

¹¹³ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 96.

¹¹⁴ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 97.

2.18.6. Nivîsîna diftonga “-ou”yê

Bo vê xalê jî Aydogan di cihê “-ou”yê de “-û” pêşkêş dike.

Nimûne:

doublage – dûblaj

camouflage – kamûflaj¹¹⁵

2.18.7. Nivîsîna “-tion”ê di dawîya bêjeyên biyanî de

Bo vê xalê jî Aydogan heke tîpa berî “-tion”ê dengdêr be “-syon”ê, heke tîpa berî “-tion”ê tîpeke nimînendeya nedengdêrekê be “-sîyon”ê tercîh dike.

Nimûne:

adaptation – adaptasyon

action – aksîyon¹¹⁶

2.18.8. Nivîsîna bêjeyên ku bi “in-”ê dest pê dikin

Bo vê xalê pêşniyara Aydogan ew e ku “in-” bi awayê “en-”ê bê nivîsîn

Nimûne:

incest – encest

index – endeks¹¹⁷

2.18.9. Nivîsîna bêjeyên ku bi “im-”ê dest pê dikin

Pêşniyara Aydogan ew e ku “im-” bibe “em-” lê heke piştî “im-”ê tîpeke dengdêr hebe yan jî “-m-”yeke din hebe “-im” bibe “îm”

Nimûne:

imperial – emperyal

imitation – îmitasyon¹¹⁸

2.18.10. Nivîsîna bêjeyên ku di dawîya wan de “-isme” heye

Pêşniyar bo vê xalê jî ew e ku “-isme” bibe “-îzm”

¹¹⁵ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 98.

¹¹⁶ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 98.

¹¹⁷ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 101.

¹¹⁸ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 102.

Nimûne:

capitalisme – kapîtalîzm
classicisme – klasîsîzm¹¹⁹

2.18.11. Nivîsîna “-s-”yê di navbera du dengdêran de

“-s-” li gor bilêvkirina kurmancî bi awayê “-z-”yê tê pêşniyarkirin:

Nimûne:

television – televîzyon
visuel – vîzuel¹²⁰

2.18.12. Nivîsîna tîpa “-g-”yê di kîteya dawîyê de

Dîsa Aydogan li gor bilêvkirina kurmancî bo “-g-”yê “-j-”yê pêşniyar dike:

Nimûne:

average – averaj
baggage – bagaj¹²¹

2.18.13. Nivîsîna tîpa “g”yê ya ku wekî xwe tê nivîsîn

Bo vê xalê Aydogan çardeh bêjeyan rêz dike û dibêje divê “g” weke xwe bimîne.

Nimûne:

cografya – cografya
dîyalog – dîyalog û hwd.¹²²

2.18.14. Nivîsîna dîftonga “au-”yê

Bo dîftonga “au-”yê jî pêşniyara Aydogan ew e ku “au-” weke “o-“ bê nivîsîn

Nimûne:

auto – oto

¹¹⁹ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 102.

¹²⁰ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 103.

¹²¹ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 103.

¹²² Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 104.

autocrate – otokrat¹²³

2.18.15. Zayenda bêjeyên biyanî

Li gor Aydogan zayenda bêjeyên biyanî (adaptasyon, averaj, baraj û hwd) bi giştî mê ye lê heger di kurmancî de hevmaneya bêjeyêke biyanî hebe zayenda bêjeya kurmancî tê wergirtin.

Nimûne:

Kar di kurmancî de nêr e ji ber wê “îş, emel, şixul” jî nêr tên bikaranîn. Di heman demê ji ber ku bersiv di kurmancî de “mê” ye “cewab”a erebî jî mê tê bikaranîn.¹²⁴

2.18.16. Nivîsîna “x”a latînî:

Li gor Aydogan divê di kurmancî de “x”ya ku dengê “ks” dide divê bi heman dengî bê bilêvkin û nivîsîn.

Nimûne: Box – boks

Export – eksport¹²⁵

2.18.17. Nivîsîna “k”ya bêjeyên biyanî

Li gor Aydogan hewce ye “k” nebe “q” angê bêjeyên mîna “bakterî, bank û hwd” bi awayê “baqterî, banq û hwd” neyên nivîsîn û lîsteyêke berfireh pêşkêş dike.¹²⁶

2.18.18. Nivîsîna “q”ya bêjeyên biyanî

Aydogan bo vê xalê jî mîna ya jorîn di wê baweriyê de ye ku “q” nebe “k”

Nimûne:

Awayê rast

Awayê nerast

¹²³ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 105.

¹²⁴ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 105.

¹²⁵ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 107.

¹²⁶ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 108.

Înqîlab
Qafile

înkîlab
kafile¹²⁷

2.18.19. Nivîsîna “b”ya eslî ya zimanên biyanî

Dîsa Aydogan bo vê xalê jî dibêje ku divê mirov bi meyla tirkî “b”ya eslî neke “p”.

Nimûne:

Awayên rast

Awayên nerast

Erbab

erbap

Hesab

hesap¹²⁸

2.18.20. Nivîsîna “p”ya eslî ya zimanên biyanî

Bo vê xalê jî pêşniyara Aydogan ew e ku “grûp” bi awayê “grûb” an “prensîp” bi awayê “prensîb” neyê nivîsîn.¹²⁹

2.18.21. Nivîsîna “d”ya eslî ya zimanên biyanî

Derbarê mijara “d”ya eslî jî Aydogan li gel pasrastina “d”yê ye.

Nimûne:

Awayên rast

Awayên nerast

celad

celat

cîhad

cîhat¹³⁰

2.18.22. Nivîsîna bêjeyên ku bi “sk-“, “sp-“ û “st-“yê dest pê dikin

Bo vê xalê jî pêşniyar ew e ku “sk-“, “sp-“ û “st-“ weke xwe bimînin.

Nimûne:

Stasyon, skelet, skandal, spîrto, Spanya û hwd.¹³¹

¹²⁷ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 113.

¹²⁸ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 113.

¹²⁹ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 114.

¹³⁰ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 115.

2.18.23. Nivîsîna bêjeyên ji zimanê erebî yên bi “demme”yê

Di vê mijarê de Aydogan xwe dispêre Celadet û dibêje heke li biniya “deme”yê “و” (waw) tune be divê bi “î”yê bîn nivîsîn û listeyeke berfireh pêşkêş dike.

Nimûne:

Awayên rast

bilûx

binye

Birhan

Awayên nerast

bulûx

bunye

Burhan¹³²

Komxebata Kurmanciyê derbarê vê xalê ya bi navê “Nivîsîna hin bêjeyên biyanî hema bêje heman rêbaz pejirandiye. Di serî de bo qaîdeyên giştî ku Aydogan rêz kiribûn mînak jî dane, binnivîsek lê zêdekirine [“d”ya bêjeyên kurdî û îranî ya esilî’yî neke “t”]¹³³ û bo nivîsîna “-oi”ya di zimanê biyanî de jî di cihê “-uwa” de ku Aydogan pêşniyar kiribû “-iwar-“ pêşniyar dike.

Nimûne:

conservatoire – konservatiwar

laboratoire – laboratiwar û hwd.¹³⁴

Komxebatê ji bilî van her du xalan tiştêkî ji Aydogan cuda pêşniyar nekiriye û awayê nivîsîna mijarê di rûpelên di navbera 64-89an de pêşkêş kirine. Heçî Zêrevan e li ser vê xalê jî ranewestiye.

2.19. Girdek û hûrdek¹³⁵

Girdek û hûrdek jî di nivîsîne de mijarek e ku serê yên bi nivîsê re eleqedar tevlihev dike. Di her zimanê de bi awayekî tîn nivîsîn û nivîsîna wan di berhemên

¹³¹ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 117.

¹³² Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 118-121.

¹³³ Komxebat, r.83.

¹³⁴ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 97.

¹³⁵ Di vê mijarê de, bo ku jêrenotên me dubare nebin me pêdivî bi vê tîbîniyê dît. Bo hemû mînak binêrin: Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 124-139; Komxebat, r. 90-105.

rastnivîsînê de tê diyarkirin ku di nivîsê de standardek ava bibe û her kes li gor wê tevbigere.

Di vê xalê de herçiqasî berhema Zêrevan ne gelekî bi berfirehî jî be Aydogan û Komxebat yek bi yek hemû xalan diyar dikin û li gor wê mînakên rêz dikin.

Bo vê xalê em ê li gor Aydogan cihên ku girdek yan hûrdek tînan bikaranîn xal bi xal rêz bikin û mînakên jî ji berhema wî hîlbijêrin lewra berhema Komxebatê hem ji aliyê rêzkerina xalan ve hem ji aliyê mînakên ve ji ya Aydogan ne cuda ye. Piştî vê em dê nêrîna Zêrevan jî pêşkêş bikin û heke pewîst be bi mînakên mijarê zelal bikin.

2.19.1. Rewşên ku girdek tînan bikaranîn

2.19.1.1 Di destpêka komekê de

Min bêriya welatê xwe kiriye.

Gava ku ez pir aciz dibim, ez li wêneyan dinêrim.

2.19.1.2. Kurtkirinên bi girdekan tînan nivîsîn

Modem roj bi rojê erzantir dibin.

Hîv viruseka pir xeternak e.

2.19.1.3. Piştî cotxalê

Şîreta Celadet ev e: “Kurdino, xwe binasin!”

Slogana wan ne xerab bû: Bimire koletî!

2.19.1.4. Nav û paşnavên kesan

a-Navên kesan

Azad, Hêlîn, Çeto

b-Paşnavên kesan

Ehmedê Xanî, Melayê Cizîrî, Evdalê Zeynikê

2.19.1.5 Nasnav û leqeb

Behramê Kej, Dildarê Cegerpola, Skenderê Zulqerneyn

2.19.1.6 Navên qehremanên çîrokan

Mîr Mihemed, Keçika Kumsor, Keçika Kibrîtîfiroş

2.19.1.7 Navên xweda, ferîşte, pêxember, pirtûkên pîroz û cihên dînî

a- Navên Xwedayan

Li gor baweriya misilmanan, Xweda di Quranê de dibêje; Ev pirtûkeka weha ye ku şik jê nabe.”

Yezdan dibêje ku wî însan ji axê afirandine.

b-Navên ferîşteyan

Cebraîl, Ruhstîn (Ezraîl), Mîkaîl, Şeytan

c-Navên pêxemberan

Adem, Birahîm, Mûsa, Dawid, Îsa, Mihemed, Zerdûşt, Bûda

ç-Navên pirtûkên pîroz

Mishefa Reş, Cilwe, Quran, Încîl, Tewrat, Zebûr

d-Navên cihên dînî

Mizgefta Şêx Seîdê Pîranê, Mizgefta Sûsayê, Kenîşteya Qudisê

2.19.1.8 Navên welat û dewletan

Kurdistan, Swêd, Îran, Iraq

2.19.1.9 Navên bajar, bajarok û gundan

Mehebad, Hewlêr, Qamişlo, Mêrdîn, Mûş

2.19.1.10 Navên tax, kolan û meydanan

Taxa Reşoyî, Kolana Azadîyê, Meydana Çarçirayê

2.19.1.11 Navên parzemînan

Afrîka, Ewropa, Asya, Amerîka, Okyanûsya

2.19.1.12 Navên okyanûs, derya û tengavan

Okyanûsa Hindê, Okyanûsa Mezin, Okyanûsa Atlasê

2.19.1.13 Navên çeman

Çemê Feratê, Çemê Dicleyê, Ava Şîn, Zêya Mezin

2.19.1.14 Navên deştan

Deşta Mûşê, Deşta Gewran, Berîya Mêrdînê

2.19.1.15 Navên çiyayan

Çîyayê Agirîyê, Çîyayê Herekolê, Çîyayê Nemrûdê

2.19.1.16 Navên birc, keleh, Seray, koşk, pir, stadyûm, park û hwd.

Birca Belek, Keleha Hewlêrê, Sereya Îsheq Paşayî, Koşka Serokkomariya Kurdistanê, Pira Dehderî, Stadyûma Mem û Zînê, Parka Kurdistanê

2.19.1.17 Navên stêr û gerestêran

Kadiz, Qurix, Oryon, Merkur, Venus, Dinya, Mars

2.19.1.18 Navên bankayan

Bankaya Kurdistanê ya Çandinîyê, Bankaya Kurdistanê ya Navendî

2.19.1.19 Navên kovar, rojname, pirtûk û nivîsan/gotaran

Kovara Hawarê, Rojnameya Kurdistanê, Çarînên Xeyamî, Dersên Kurdî, Nêrîneka Paşverû

2.19.1.20 Navên peyman, şer û serdemên dîrokî

Peymana Sevrê, Şerê Cîhanê yê Yekem, Serdema Kevirî

2.19.1.21 Tîpa rêzên helbestan ya destpêkê

Ev xal di berhema Komxebatê de cih nagire.

Nimûne:

Ez mame di hikmeta Xwedê da

Kirmanc-i di dewleta dinê da

Aya bi çi wechê mane mehrûm

Bilciumle ji bo çi bûne mehkûm! (E. Xanî)

2.19.1.22 Nameyên ku bi bêjeyên heval, dost, bira, xwîşk û hwd dest pê dikin

Ev xal jî di Komxebatê de cih nagire û ya rastî di destpêka nivîsê de jixwe bi girdekan tê nivîsîn û ev mijar weke xaleke ne di cih de dixuye.

Nimûne:

Hevala min ya delal

Dostê min yê Ezîz

Birayê min yê hêja

2.19.1.23 Nivîsîna navên wezaretan, komîsyonên parlamentoyan, dezgehên

dewletî yên din, belediye, unîversîte, şirket, baro, komele û rêxistinên din

Bo vê xalê Aydogan pêşî agahiyên giştî dide û dibêje heke di beşê xwe de yekane bin divê bi girdekan bên destpêkirin.

a-Navên serokiyên dewletê yên herî bilind

Serokîya Parlamentoyê, Serokkomarî, Hikûmet

b-Navên serokên dewletên yên herî bilind

Serokkomarê/a Kurdistanê, Serokê/a Parlamentoya Kurdistanê

c-Navên wezaretan

Wezaretê Aboriyê, Wezaretê Av û Daristanan, Wezaretê Çandê

ç-Navên birêvebiriyan giştî

Birêveberiya Çandê ya Giştî, Birêveberiya Dadê ya Giştî, Birêveberiya Darayîyê ya Giştî

d-Navên komîsyonên parlamentoyan

Komîsyona Aborîyê, Komîsyona Bacê, Komîsyona Bazara Karî, Komîsyona Dadê

e-Navên dadgehan

Dadgeha Bilind, Dadgeha Îdarî ya Bilind, Dadgeha Îdarî ya Îstînafê

ê-Navên partîyên siyasî

Partiya Aştî û Demokrasîyê, Partiya Azadî û Demokrasîya Kurdistanê,
Partiya Maf û Azadîyan

f-Navên belediyeyan û organên wan

Beledîyeya Mêrdînê, Beledîyeya Qamişloyê, Meclîsa Beledîyeya Êlihê

g-Navên unîversiteyan

Komxebat vê xalê bi serenavê “Fakulte û zanîngehan” dide lê mînak nayên guhertin.

Nimûne:

Unîversîteya Bedirxanîyan ya li Şernexê, Unîversîteya Edîb Karahanî ya li Mêrdînê.

h-Navên şîrketan

Şîrketa Heftbirayan ya Çîmentoyê, Şîrketa Lêgerîna Petrolê

i-Navên baroyan

Baroya Bidlîsê, Baroya Çewligê, Baroya Dîyarbekirê

î-Navên komeleyan

Komeleya Bijîşkan ya Mehebadê, Komeleya Çanda Kurdî ya Mûşê,
Komeleya Jîngehparêzan

j-Navên rêxistinên din

Enstîtûya Kurdî ya Parîsê, Enstîtûya Kurdî ya Stenbolê, Federasyona
Komeleyên Kurdistanê li Swêdê

k-Navên qanûn, destûr û biryarnameyan

Qanûna Bingehîn, Destûra Partîya Jîngehê, Biryarnameya ji bo Avakirina Birêveberîya Jîngehê ya Giştî

2.19.2 Rewşên ku hurdek tên bikaranîn

2.19.2.1 Hemû hevenav

Komxebat tenê bo hevenavê navdêrên cureyî dibêje û heman mînakan dide.

çav, bêvil, dar, diran, xanî

2.19.2.2 Bêjeyên ku ji navên kesan hatine çêkirin

marksîst, marksîzm, darwînîzm, maoîst

2.19.2.3 Bêjeyên ku ji navên deveran yê xweser hatine çêkirin

amûdî, bazidî, bidlîsî, dêrikî, dihokî

2.19.2.4. Navên gel û neteweyan

Asûrî, ereb, faris, kurd, tirk

2.19.2.5 Tîpa ziman, zarava û devokan ya destpêkê

Heger ew neçe dibistanê, **fransîzîya** wî xurt nabe.

Li gel bikaranîna hemû zimanên welatên endam yê mîna **çekî, slovakî, finî swêdî** û hwd jî di pratîkê de statuya **fransîzî, îngîlîzî û almanîyê** di YEyê de bilindtir xuya dike.

2.19.2.6 Navên dîn û mezheban û mensûbên wan

bûdîst, bûdîzm, cihû, cihûtî, elewî, elewîtî, êzîdî, êzîdîtî

2.19.2.7 Navên organên ku bi hûrdekan tên nivîsîn

birêveberîya elektrîkê, komîsyona çandê, komîsyona jîngehê

2.19.2.8 Bêjeyên nava bendikan gava ku ne serenav bin

Min par Zorava –gundekê piçûk- dît.

2.19.2.9 Komeka ku bi reqeman dest pê dike

1695 ji bo wan bû sala xêr û bereketê.

2.19.2.10. Navên hêlan

Hem Aydogan hem Komxebat bo vê xalê bêşê “Navên Hêlan” nîşan didin.

Komxebat du xalan li vê mijarê zêde dike û dibêje hewce ye navên eşîran û mensûbên wan û daçek, gîhanek û îzafeya ku cuda tê nivîsîn û di navên taybetî de tê bikaranîn bi tîpa piçûk (heke di destpêkê de be) bîn nivîsîn.

Nimûne:

bazikî, berwarî, biroki / Weqfa Çand û Lêkolînê ya Kurdî¹³⁶

Li gel Aydogan û Komxebatê Arif Zêrevan jî cih daye girdek û hûrdekan. Li gor Zêrevan di destpêka hevokê de girdek tên bikaranîn lê heke paşnavên wekî “de Goya” berî xwe kîten wekî “de, van” bistînin ev kî di serê hevokê de jî hûrdekiya xwe biparêzin. Lêbelê gava gotinên kurtkirî bikevin serê hevokê ew bi girdekê bîn nivîsîn.

Nimûne:

Van Gogh di xewnên Rehîmoyî de dijî.¹³⁷

Hjm. 25-ê Hawarê bi serê xwe xezîneyek e.¹³⁸

Zêrevan ji bilî vê bo piştî cotxalê, bo serenavan, bo paşnav, navên cîhên cografîk yê taybetî, navên rêxistin, şirket û yê wekî wan, navê daîreyan û dezgehên birêvebir, bo kurtkirinên hevenavê kesan jî girdekan pêşniyar dike.¹³⁹

Li gel van xalên jêrîn Zêrevan bi sernivîsa “di cîhên dî de” dibêje ku navên pirtûk, film, berhemên hinerî, berhemên mûsikî ekspozîsyon û yê wekî wan tenê bêjeya pêşiyê û navên kesan bi girdekê tên nivîsîn.¹⁴⁰

¹³⁶ Komxebat, r. 105.

¹³⁷ Zêrevan, **Bingehên Rastnivîsandina Kurdiyê**. r. 53.

¹³⁸ Zêrevan, **Bingehên Rastnivîsandina Kurdiyê**. r. 54.

¹³⁹ Zêrevan, **Bingehên Rastnivîsandina Kurdiyê**. r. 59-63.

¹⁴⁰ Zêrevan, **Bingehên Rastnivîsandina Kurdiyê**. r. 63.

Zêrevan bo inwan (madam Curie), bo navên aliyên cografîk (bakur), bo hevenavên heywan, netewe, ziman û hişînahiyên –famîlya, nijad, tov, cins, texlît û yên wekî wan, bo beş û parçeyên di nav heman daîreyê de, bo bêjeyên demdiyarker, peryod û bûyerên dîrokî û navê eşîran tîpên hûrdek pêşniyar dike.¹⁴¹

2.20 Kurtkirin

Ne tenê bo kurmancî bo hemû zimanan kurtkirin mijarek e ku divê standardeke wê hebe. Di nivîsan de carinan dibe ku hin bêje gelek caran derbas bibin û ev herikbariya xwendinê qels bike. Ji bo rê li ber vê bê girtin hewce ye hin bêje an fraze bi awayekî kurt bê nivîsîn ku ji vê re kurtkirin tê gotin.

Ji ber vê ye ku hem Aydogan hem Komxebat hem jî A. Zêrevan bi berfirehî agahî û pêşniyarên xwe rêz kirine.

Di vê mijarê de jî di navbera berhema Aydogan û Komxebatê de hem ji aliyê sernivîsan hem ji aliyê mînakên ve zêde ferq tune ye lê Zêrevan heman tiştî pêşniyar bike jî bi awayekî cuda rêz dike.

Ez dê bo berawirdkirineke sade dîsa sernivîsan li gor rêzkirina Aydogan bidim û mînakên jê hilbêjêrim¹⁴² û di dawiyê de nirxandina berhema A. Zêrevan bikim.

2.20.1 Kurtkirinên ku bi tîpên destpêkê

Ji tîpa her bêjeyekê ya destpêkê yan jî ji tîpa her movikeke hevedudaniyê ya destpêkê pêk tên. Du grûp in.

2.20.1.1 Kurtkirinên ku tîp bi tîp tên bilêvkirin

a- Yên ku tîp bi tîp bi girdekan tên nivîsîn

Yekîtiya Ewropayê: YE

b- Yên ku tîp bi tîp bi hûrdekan tên nivîsîn

hwd (her wekî din) wc (water closet)

¹⁴¹ Zêrevan, **Bingehên Rastnivîsandina Kurdiyê**. r. 59-69.

¹⁴² Bo nimûbeyên Komxebatê hûn dikarin li rûpelên 106-116an binêrin.

Bi ya aydogan kurtkirinên tîp bi tîp divê li gor alfabeya kurmancî bîn bilêvkin (FKK – FeKeKe), li gor zayenda mê bîn tewandin (Min ji FKKyê re nameyek şand), li gor zayenda mê veqetandekê bistînin (FKKyê par baştir bû) û bo diyarkirina mensubiyetê jî “-yî” bistînin (FKKyî)¹⁴³

Aydogan ji bilî van behsa kurtkirinên tîp bi tîp yê navneteweyî jî dike û dibêje em wan bi awayê orjînal an bi hûrdekan an bi girdekan binivîsin.

Nimûne:

PDF an pdf (Portable Document Format)¹⁴⁴

2.20.1.2 Kurtkirinên tîp bi tîp yê ku wekî bêjeyan tên nivîsîn

Weke ku ji nav jî diyar e ev kurtkirin bi awayî bêjeyî tên bilêvkin û Aydogan kurtkirina wan bi hûrdekan pêşniyar dike.

Nimûne:

aids (acquired immune deficiency syndrome)

hiv (human immunodeficiency virus)

Aydogan ji bilî vê behsa kurtkirinên sernavên wekî bêjeyan dike û van mînakên dide.

CAK (Civata Akademîsyenên Kurdistanê)

Unesco (United Nations Educational, Scientific and Cultural)¹⁴⁵

2.20.2 Cureyêke din, kurtkirinên ku wekî bêjeyan tên bilêvkin

Aydogan bo vê cureyê mînakên modem (modulator – demodulator) û transponder (transmitter – responder) dide.

2.20.3 Birîn (kurtkirinên birî)

Birîna bêjeyekê an frazeyekê ye. Aydogan bo vê xalê dibêje qaîdeya sereke ew e ku ji bilî navên kesan berî dengdêrekê pêk bê.

Nimûne:

¹⁴³ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 142-143.

¹⁴⁴ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 143.

¹⁴⁵ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 144.

av. (avûkat)

prof. (profesor)¹⁴⁶

Aydogan bo navên kesan jî mînakên E. Xanî, F. Teyran û C.A. Bedirxan, G.H.W Bush dide.

2.20.4 Kurtkirina têgihên rêzimanî yên kurdî, yên latînî û navên zimanan

Aydogan vê mijarê bi sê sernivîsan bi nav dike û dibêje divê bi rêya birînê bîna kurtkirin û li dawiya wan xalekê dideyne.

Nimûne:

navd. (navdêr)

rengd. (rengdêr)

abl. (ablatîf)

abstr. (abstrakt)

alm. (almanî)

as. (asûrî)¹⁴⁷

2.20.5 Kurtkirinên civandî

Ew kurtkirin in ku ji tîpa bêjeyan ya destpêkê û ya dawiyê pêk tên. Hem di bêjeyên sade de hem di bêjeyên hevedudanî de tê kirin û li dawiya wan xal nayê danîn.

Nimûne:

dr (doktor)

tfn (telefon)¹⁴⁸

Li gel vê Aydogan bo telefonê dibêje dikare bi awayê birînê jî bê kurtkirin û weke “tel.” bê nivîsîn.

¹⁴⁶ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 145.

¹⁴⁷ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 146-147.

¹⁴⁸ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 148.

2.20.6 Kurtkirênên navên pîvanan

Derbarê vê xalê Aydogan standardên navneteweyî bo nivîsînê pêşniyar dike û bo bilêvkirinê jî kurmancî nîşan dide û di dawiyê de xalê bi kar nayîne.

Nimûne:

dm

cm

A (amper)

B (bayt)

Gb

kB û lîsteyeke gelekî berfireh rêz dike.¹⁴⁹

Di heman demê de Aydogan dibêje hin kurtkirin derî qaîdeya jorîn in û mînakên weke dam (dekametre), GHz (gîgahortz) dide.

2.20.7 Di kurtkirinê de xalên ku divê mirov bala xwe bide wan

Di kurtkirinê de mijareke girîng jî ew e ku di hin cihan de kurtkirin nav e. Di vê mijarê de Aydogan balê dikişîne çend xalên girîng û wan weha rêz dike.

- a- Heger kurtkirin ji herfên destpêkê pêk bên divê xal neyê bikaranîn
- b- Piştî navekê kurtkirî xalek tê dayîn û divê navbirek hebe
- c- Di navbera navên pêşiyê yên kurtkirî de divê valayî tune be
- d- Piştî kurtkirinê “rûpel” û “cild” xal tê dayîn
- e- Di xebatê akademîk de gava ku kurtkirinên xerîb hebin divê di serî de bên nivîsîn

ê- Gava ku kurtkirin cara yekem hat nivîsîn ya baş ew e ku kurtkirin bi awayê dirêj jî bê nivîsîn.

- f- Di kurtkirinan de kitekirin nabe.
- g- Di nivîsîna tarîxê de beşê salê nayê kurtkirin
- h- Kurtkirinên navneteweyî (FIFA, UEFA û hwd) dikarin di kurmancî de jî bên bikaranîn.
- i- Di nivîsên edebî de kurtkirin ne di cih de ye.¹⁵⁰

¹⁴⁹ Aydogan, **Rêbera Rastnivîsînê**, r. 149.

Bo vê xalê pêwîst e em nêrînên Zêrevan jî binirxînin lewra bi hûrgilî li ser mijare rawestiye. Li gor Zêrevan hêj kurtkirin di kurdî de rûnenîştîye û her nivîskar li gor zanîna xwe bêjeyan kurt dike. Zêrevan xwe dispêre swêdî û fransî û di kurmancî de jî carinan li pişt bêjeyekê û carinan li dawiya kurtekê xalê bi kar tîne.

Nimûne:

hw.d: (herwekî dî)

w.d: (wekî dî)

b.nim: (bo nimûne)

b.m.î: (berî milada îsayî) û weke “lîsteya kurtekên adetî” gelek mînakan rêz dike. Lêbelê bo awayê van kurtkirinan tu agahiyan nade.¹⁵¹

Arîf Zêrevan ji bilî van behsa hevenavên pîvanan dike û dibêje divê li gor lêhatina navneteweyî bê xal bîn nivîsîn û çend nimûneyan pêşkêş dike:

km (kilometre)

m (metre)

dm (dehêkmetre)

Di van kurtkirinan de di kevanekê de bilêvkirin jî hatiye nivîsîn (dm=dehêkmetre, dl=dehêklître) diyar e dixwaze bi kurmancî nav li awayê wan ê dirêj bê kirin.

Li gel xalê jorîn Zêrevan “kurtekên bigirdek” û “hinek kurtekên dî” jî dinirxîne:

Nimûne:

UN (United Nations)

USA (United States of America)

anat. (anatomî)

¹⁵⁰ Aydogan, **Rêbera Rastnivîsînê**, r. 152-153.

¹⁵¹ Zêrevan, **Bingehên Rastnivîsandina Kurdiyê**. r. 91.

ereb. (erebî)

Herweha Zêrevan di bin binnivîsa “kurtekên bigirdek” de behsa çend kurtkirinên bi hûrdekan jî dike.

Nimûne:

mc (motorsiklet)

tv (televizyon)

aids (acquired immune deficiency syndrome)

Bo kurtkirinên wekî Unesco, Unicef jî balê dikşîne ser tîpa pêşî û dibêje hewce ye bi girdekê dest pê bike.¹⁵²

2.21 Tewang

Tewang taybetmendiyek e girîng a kurmancî ye û hertim tevliheviyekê çêdike. Bi vê mebestê her sê berhemên mijara teza me jî berê xwe daye vê xalê û bi hûrgilî li ser sekinîne. Di vê xalê de jî agahî û nimûneyên Aydogan û Komxebatê kêm zede weke hev in û ji ber vê pêşî ez ê behsa xebata Aydogan bikim û li dawiyê heke agahiyên cuda hebin berhema Komxebatê binirxînim. Helbet ez dê nêrînên Zêrevan jî paşguh nekim û behsa xebata wî jî bikim.

Aydogan piştî ku behsa tewang û pirtikên tewangê (bo tewangê navdêrên nêr yê binavkirî û nebinavkirî “-î”, bo tewanga navdêrên mê yê binavkirî û nebinavkirî “-ê” û bo tewanga her du zayendên yê binavkirî û nebinavkirî “-an”) dike, xal bi xal cihên tewangê destnîşan dike. Herçiqasî Aydogan gelek mînak dabin jî ez dê hemûyan rêz nekim lê bo her xalê mînakekê bidim.

2.21.1 Tewanga navdêrên nêr yê yekhejmar

Aydogan li gel hin agahyan bi nimûneyên jêr dixwaze mijarê zelal bike.

Ez hespî dibinim (bo navdêrên nêr yê yekhejmar û binavkirî)

Ez Şêrkoyî dibinim (bo navdêrên ku dengdêran diqedin)

Ez derîyekî dibinim (bo navdêrên nêr yê yekhejmar û nebinavkirî)

¹⁵² Zêrevan, **Bingehên Rastnivîsandina Kurdiyê**. r. 92-94.

Aydogan dibêje: “Ji ber ku rêzimana kurmanciyê tewandinê ferz dike, di nivîsîna kurmanciyê de tewang esas e. Loma nivîsîna kurmanciyê ya ku pêgiriya vê yeke neke û di van rewşan de navdêrên nêr netewîne, ji aliye rêzimanî ve nivîsîneka şaş e.

Û van mînakên dide:

Ez Şêrkoyî dibînim.

Ez xanîyî ava dikim.

Herweha Aydogan balê dikşîne ser tewandina “a/e”yê ya bi awayê “ê”yê û vê weke qaîdeyeke giştî nabîne:

Ez nêr dixwim

Ez mêst dixwim.¹⁵³

2.21.2 Tewanga navdêrên mê yêr yekhejmar

Aydogan bi van nimûneyan vê xalê zelal dike:

Ez mehîne dibînim (mê, yekhejmar, binavkirî)

Ew kayê difroşe (mê, yekhejmar, binavkirî û bi dengdêrê diqede)

Ez mehînekê dibînim (mê, yekhejmar, nebinavkirî)¹⁵⁴

2.21.3 Tewanga navdêrên her du zayendan yêr pirhejmar

Hem Aydogan hem Komxebat bi heman awayî nimûneyan rêz dikin û mijarê li gor wan hewce ye wisa be:

Nimûne:

Ez hespan dibînim (pirhejmar, binavkirî)

Ez nameyan dişinim (pirhejmar, binavkirî û bi dengdêrê diqede)

hin hesp -----hespin (pirhejmar, nebinavkirî)

hin perde -----perdeyin (pirhejmar, nebinavkirî û bi dengdêrê diqede)

¹⁵³ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 155.

¹⁵⁴ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 157.

Bo vê xalê Aydogan balê dikişîne tîpa pevgirêdanê “y”yê k udi cihê wê de “n”jî tê bikaranîn (pencerenin) lê bo standardê piştgiriya vê nake.

Herweha Aydogan û Komxebat behsa Celadet Bedirxan jî dikin ku piştgiriya fikra bi vî awayî dike:

Ez hin hespan dibinim ----- Ez hespina dibinim.¹⁵⁵

Ne Aydogan ne Komxebat vê dipejirînin lewra dibe sedema tevliheviyê.

2.21.4 Navdêrên ji yek mêjerê lê ji zayendên cuda

Aydogan û Komxebat bi wê re ne di vê rewşê de navdêra dawiyê li gor zayenda xwe bê tewandin.

Nimûne:

Ez nêrî û bizinê dibinim.

Ez meh û beranî dibinim.¹⁵⁶

2.21.5 Navdêrê ji yek mêjer û zayendê

Pêşniyara berhemana di vê rewşê de ew e ku tene navdêra dawî bê tewandin.

Nimûne:

Ez nêrî û beranî dibinim.¹⁵⁷

2.21.6 Navdêrên mêjercuda

Bi Aydogan û Komxebatê di vê rewşê de hewce ye her navder li gor zayenda xwe bê tewandin.

Nimûne:

Ez mehîne û beranan difroşim.¹⁵⁸

¹⁵⁵ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 159; Komxebat, r. 123.

¹⁵⁶ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 160.

¹⁵⁷ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 160; Komxebat, r. 124.

¹⁵⁸ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 160; Komxebat, r. 124.

2.21.7 Bêjeyên ku bi “-an”ê diqedin

Di vê xalê de Aydogan û Komxebat bi bêjeyên “duryan, Botan, Mîran, gulan, Şêxan”ê dixwazin mijarê zelal bikin. Li gor wan hin îdîa hene¹⁵⁹ ku hin bêjeyên bi “-an”ê diqedin jixwe tewîyane û “-an” nişana tewangê ye. Lê helbet ew ne di wê baweriyê de ne û dibêjin ku leksemên kurmancî yên serbixwe ne di halê tewandî de ne. Hin bêje hene piştî qonaxa leksîkalîzebûnê bûne leksemên nû û herweha zayendên nû werdigirin. Herweha hem Aydogan hem Komxebat van bêjeyan li gor halê wan yên dawî û peywendê ditewînin û bi nimûneyên jêr dixwazin mijarê zelal bikin:

Nimûne:

Ez li duryanê li benda te me. (duryan navê cih e)

Ez Mîranî dibinim. (Mîran navê kesekî ye)

Ez dê biçim Botanê. (Botan navê cih e)

Ez ji Şêxanê me. (Şêxan navê cih e)

Min ji Gulanê re got. (Gulan navê kesekê ye)¹⁶⁰

2.21.8 Bêjeyên ku xwedyên referantên cuda

Di vê mijarê de jî Aydogan û Komxebat balê dikşînin ser çend bêjeyan (Selahedîn, Gundik, Cîhan, Jîyan, Ferat, Mirad, Zagros) Komxebatê di cihê “Ferat”ê de “Dijle” bi kar aniye) û dibêjin divê li gor peywendê bên tewandin.

Nimûne:

Ez Selahedînî dibînim.

Ez diçim Selahedînê

Çemê Miradê

Ew negihîşt Miradê xwe.¹⁶¹

¹⁵⁹ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 161; Komxebat, r. 124.

¹⁶⁰ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 161-163; Komxebat, r. 126.

2.21.9 Bêjeyên zayendnêr gava bibin navên rojname û kovaran

Bo vê xalê hem Aydogan hem Komxebat li aliye referanta nû ne û li gor wê “mê” bi kar tînin.

Nimûne:

Kovara Welatê derket¹⁶²

2.21.10 Bêjeyên ji cureyên wekî navên rojname û kovaran

Bo vê xalê jî Aydogan û Komxebat balê dikşînin ser bêjeyên “nû” û “serbixwe”yê û dibêjin gava bibin navê rojname û kovaran divê li gor “me” bên tewandin.

Nimûne:

Hejmara Nûyê ya nû derket

Ew nivîskarê Serbixweyê ye¹⁶³

Bo vê xalê pewîst e em behsa Zêrevan jî bikin lewra Zêrevan di hin xalan de derveyî Aydogan û Komxebatê hinek agahiyan dide. Zêrevan pêşî pênc xalên ku divê tewang bê kirin (Di dema niha de bireser gava lêker gerguhêz be, di dema borî de kirde gava lêker gerguhêz be, gava daçek bikeve pêşiya navdêrê, di ravekan de û navdêr gava bo gazîkirinê tên bikaranîn) û piştê tewanga cînavan, navdêrên binavkirî û navdêrên nebinavkirî peşkeş dike.¹⁶⁴

Li gor Zêrevan cînavên xweser û tewandî ev in:

Cînavên xweser	Cînavên tewandî
Ez	Min
Tu	Te
Ew	Wî/Wê
Em	Me

¹⁶¹ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 164-166; Komxebat, r. 128-129.

¹⁶² Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 167; Komxebat, r. 130.

¹⁶³ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 168; Komxebat, r. 131.

¹⁶⁴ Zêrevan, *Bingehên Rastnivîsandina Kurdiyê*, r. 80.

Hon

We

Ew

Wan¹⁶⁵

Zêrevan cînavên pirsyarî jî rêz dike:

Cînavên pirsyarî yên xweser

Cînavên pirsyarî yên tewandî

Kî

Kê

Kîjik/Kîjan

Kîjikî/Kîjanî

Kîjik/Kîjan

Kijikê/Kîjanê

Kîjik/Kîjan

Kîjikan/Kîjanan¹⁶⁶

Herweha Zêrevan bo bêjeyên wekî “serhedan, botan, şêrwan û hwd” dibêje divê bi tu awayî neyên tewandin ku di vir de ji Aydogan û Komxebatê cuda difikire.

Nimûne:

Îdrîs ji Botan têt.

Reşo çûye Xerzan.¹⁶⁷

Dîsa di vê xalê de Zêrevan bo bêjeyên ku “e” û “a”yê vedihewînin dibêje bi “ê”yê jî dikarin bên tewandin û ne weke Aydogan û Komxebatê hişk e.

Nimûne:

Em ji xênî derketin (xanî)

Gurgîn çû êş (aş)¹⁶⁸

Di van xalan de pêdivî bi çend gotinan heye. Berî her tişî rêberên rastnivîsînê, divê ne qaîdeyên rêzimanê, qaîdeyên nivîsînê destnîşan bikin. Lêbelê her sê berhemên me di cihê ku berê xwe bidin vê yek bi yek qaîde û pirtûkên tewangê nîşan dikin û paşê helbet pêşniyarên bo nivîsînê jî cih digirin.

¹⁶⁵ Zêrevan, **Bingehên Rastnivîsandina Kurdiyê**. r. 81.

¹⁶⁶ Zêrevan, **Bingehên Rastnivîsandina Kurdiyê**. r. 81.

¹⁶⁷ Zêrevan, **Bingehên Rastnivîsandina Kurdiyê**. r. 81.

¹⁶⁸ Zêrevan, **Bingehên Rastnivîsandina Kurdiyê**. r. 82.

Xalek ji van tewanga navdêrên nêr e. Wekî ku tê zanîn bo tewanga navdêrên “nêr” “î” tê bikaranîn. Rast ev qaîdeyeke giştî ye lê ma hewce ye bo hemû navdêrên nêr bê ferzkirin. Wekî ku hin zimannas jî balê dikşînin ser mijarê, hin herêm gava di bêjeyan de dengê “a” û “e”yê hebin, “a” û “e” ya kîteya dawîn dikin “ê” û ditewînin yan jî di navdêrên nêr de tewangê nakin:

Nimûne

Bozên nan xwar

Berzan çû ber pêz

Eyşan çû ser xanî¹⁶⁹

Herçî Zêrevan e wekî me li jorê jî nimûne dabûn, vê bikaranînê jî diyar dike. Lêbelê her du rêber xwe ji vê re kerr dikin. Jixwe Mistefa Aydogan di hevpeyvîneke xwe de bi gelek nimûneyan nêrînê diparêze û dibêje ku ew ne behsa rêbereke rastnivîsînê ya devokan dikin û bo pirsê standardîzebûnê pêdivî bi tewanga navdêrên nêr li gor qaîdeyê heye.¹⁷⁰

Herçiqasî ew li dijî wê ye ku di hevoka “Osmên got” de “a” veguhere “ê”yê jî dibe ku carinan ne bikaranîneke wisa be em nikaribin wateya hevokan fêhm bikin. Bo nimûne, gava em bêjin “Kincên Osmanî kevn in.” Osman weke kesekî tê bîra kê? Lê heke bi awayê “Kincên Osmên kevn in” bê gotin helbet dê her kes di wateyê bigihîje û tevlihevî jî ji holê rabe. Rewşeke wisa jî wê diyar dike ku di zimên de -çi gotin, çi nivîsîn- îstîsna hene û divê neyên paşguhkirin.

Di vê xalê de pirseke din jî tewandina navên zimanan e. Helbet navên zimanan jî ji aliyê zayendê ve “mê” ne:

Kurdiya min

Erebiya Mêrdînê û hwd.

¹⁶⁹ Samî Tan, **Rêzimana Kurmancî**, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Çapa Duyem, Stenbol, 2011, r. 92.

¹⁷⁰ Ferîd Mîtan, Hevpeyvîneke taybet li ser Rêbera Rastnivîsînê ji bo Ria Taza - [3, https://krd.riataza.com/2019/04/17/hevpeyvîneke-taybet-li-ser-rebera-rastnivîsîne-ji-bo-ria-taza-3/](https://krd.riataza.com/2019/04/17/hevpeyvîneke-taybet-li-ser-rebera-rastnivîsîne-ji-bo-ria-taza-3/) Nêrîna Dawî: 12.05.2019.

Lêbelê gelo ne hewce ye em balê bikşînin çêkirina navên zimanan jî. Wekî ku tê zanîn “î” tê pey navê netewe/gelan û navê zimên ava dibe:

kurmanc + î: kurmancî

tirk + î: tirkî

alman + î: almanî

Herçiqasî “î” carinan wateya dirûvê jî (kincên kurmancî) bide di nimûneyên jorîn de dikeve cihê bêjeya zimên ku êdî pêwistî bi bikaranîna zimên neyê û di gelek cihan de navê zimên bi serê xwe bê bikaranîn. Bo nimûne gava em bêjin “Ez bi kurmancî dizanim.” em dixwazin bêjin “Ez bi zimanê kurmancan dizanim.” û jixwe tu tevlihevî nîne û wate heşkere ye. Lê dîsa em dibînin ku tercîha rêberan û Zêrevan jî ew e ku navên zimanan bitewin û wekî “zimanê kurmanciyê, zimanê tirkîyê û hwd bê bikaranîn. Herwekî din divê neyê jibîrkirin ku navê rojnameya taybetî ya Enstîtuya Kurdî ya Parîsê jî “Kurmancî” bû û di logoyê de “..... zaravê kurmancî” digotin û neditewandin.

2.22 Veqetandek

Veqetandek an jî gotina Komxebatê îzafê mijareke ku dibe sedema tevliheviyê. Bi vê mebestê hem Aydogan û Komxebat pêdiviyê bi zelalkirina vê xalê dibinin û pêşî pirtikên (gire, parkît) veqetandekê peşkeş dikin ku bi pirtikên tewangê re tevlihev nebin. Derbarê pirtikên veqetandekê Zêrevan jî cuda nafikire û her sê berhem jî bi navlêkirinên cuda pirtikan wisa rêz dikin:

-ê: Bo navdêrên nêr, binavkirî û nebinavkirî û yekhejmar

-a: Bo navdêrên mê, binavkirî û nebinavkirî û yekhejmar

-ên: Bo her du zayendan, binavkirî û nebinavkirî û pirhejmar

Helbet hem Aydogan hem Komxebat balê dikşînin ser wê ku gava navdêr bi dengdêrê biqede “y”yek bo pevgirêdanê tê bikaranîn.¹⁷¹

Zêrevan bixwe bo pirtikên “yê”, “ya” û “yên” serî li Celadet dixe û dibêje ev pronavên îşarkî ne û di bikaranînê de bi navderan ve dizeliqin.

¹⁷¹ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 169.

Nimûne:

Hesp yê di Keremî

Hesp yê Keremî

Hespê Keremî¹⁷²

Aydogan û Komxebat bi rêzê veqetandekan bi awayê jêr rêz dikin:

a.Hespê malê

Gayê pîr (Navdêrên nêr, yekjimar û binavkirî)

b.Hespekê malê

Diranekê min (Navdêrên nêr yên yekjimar û nebinavkirî)

c.Mehîna malê

Pencereya odeyê (Navdêrên mê, yekjimar û binavkirî)

ç. Hespên min

Berûyên min (Navdêrên ji her du zayendan, pirhejmar û binavkirî)

d. Hin hespên wan... hespînên wan

Hin pencereyên malê... pencereyînên malê (Navdêrên ji her du zayendan, pirhejmar û nebinavkirî)¹⁷³

Aydogan herweha balê dikişîne ser mînakên xala “f”yê û bi ravekirina Celadet Bedirxan dibêjê hinek “hin hespên wan” bi awayê “hespînên wan” dinivîsin lê tercîha wî bi xema rêzimanê ew e ku “-(y)ên” bê bikaranîn.¹⁷⁴

Li ser vê mijarê tiştêkî din ku divê bê gotin ew e ku komxebat bo navdêrên nêr, yekjimar û nebinavkirî “deriyek mezin, diranek min” qebûl nake lê “deriyekê mezin, deriyekî mezin” ji tercîha mirov re dihele. Dîsa bi heman awayî bo navdêrên mê, yekhejmar û nebinavkirî awayê “goreyek min, mehînek malê” qebûl nake lê “mehîneka malê, goreyeke min” jî tercîha mirov re dihêlê.¹⁷⁵

Di dawiya vê mijarê de tiştê ku dixuye ew e ku di her sê berheman de jî - navlêkirin ne te de- lihevkirinek heye. Aydogan û Komxebat mijarê bi heman

¹⁷² Zêrevan, **Bingehên Rastnivîsandina Kurdiyê**, r. 84.

¹⁷³ Aydogan, **Rêbera Rastnivîsînê**, r. 169-174.

¹⁷⁴ Aydogan, **Rêbera Rastnivîsînê**, r. 173.

¹⁷⁵ Komxebat, r. 133-135.

nimûneyan zelal dikin lêbelê nimûneyên Zêrevan cuda ne û bo ravekirina mijarê serî li klasîkên kurdî û devokên cuda dide.

2.23 Di navdêran de parastina koka bêjeyê

Di rastnivîsê de xaleke binîqaş jî parastina koka bêjeyê ye. Li ser vê xalê Aydogan û Komxebat bi heman sernivîs û ravekirinan dixwazin mijarê zelal bikin û rê li ber sergejiyan bigirin. Her du jî pêşî bi sernivîsa “prensîpa sereke” dibêjin “gava ku pirtikên (gireyên) tewang û veqetandekê(îzafeyê) bi navdêran ve dibin prensîpa sereke ew e ku koka bêjeyê bê parastin.”¹⁷⁶Piştî vê jî zimanê axaftinê çend nimûneyan(awarta qanûne, awê gotinê, baxçê me û hwd) didin û dibêjin divê heman nimûne bi awaye “awarteya qanûne, awayê gotinê, baxçeyê me” bên nivîsin.

Herweha Aydogan û Komxebat bi sernivîseke din balê dikişînin ser “navdêrên biker û bireserên hevokan” û dibêjin gava navdêr di demên borî de bikera lêkera gergûhêz be divê ku di rewşa tewandî de bê nivîsîn:

Nimûne:

Şerkoyî xezal dît

Xezalê Şerko dît¹⁷⁷

2.24 Nivîsîna Cînavan

Di nivîsîna cînavan de herçiqasî qebûleke giştî hebe jî ev mijar jî ji aliye Aydogan û Komxebatê weke xaleke serbixwe hatiye hilbijartin û weha hatiye rêzkirin.

Cînavên kesî

Grûpa xweser

ez

tu

ew

Grûpa tewandî

min

te

wî/wê

¹⁷⁶ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 175.

¹⁷⁷ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 176.

em

me

hûn

we

ew

wan

Cînavên pirsyarkî

Grûpa xweser

Grûpa tewandî

Kî

Kê

Kîjan

Kîjanî

Kîjan

Kîjanê

Kîjan

Kîjanan¹⁷⁸

Zêrevan bixwe vê xalê di tewangê de ravê dike û bo “hûn”ê hon; û li gel kîjan, kîjanî “kîjik û kijikî” jî bi kar tîne.¹⁷⁹

2.25 Nivîsîna rengdêran

Nivîsîna rengdêran jî gelek caran serê mirovên bi nivîsê eleqedarê dieşîne û hem Aydogan hem Komxebatê bi sernivîsên cuda bin jî qaîdeyên nivîsîna rengdêran destnîşan kirine û li gor her du berhemana jî divê rengdêrên hevedudanî ango ne sade gava ku bi “bi-“, ”be-“ û “ne-“yê çebibin bi hevdu ve bînin nivîsîn.

Nimûne:

bîra bêbinî

çaya bêşekir

ava nezalal

Herweha her du berhem ji bo peyvên durengdêrî jî wê qayideyê pêşniyar dikin ku rengdêra hejmara kiteyên wê kêmîr li pêşî û ya pir li dawiyê li pey “û” yê bê nivîsîn

Nimûne:

¹⁷⁸ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 177; Komxebat, r. 140-141.

¹⁷⁹ Zêrevan, *Bingehên Rastnivîsandina Kurdîyê*, r. 81.

baş û xerab

dûr û dirêj¹⁸⁰

2.26 Nivîsîna lêkeran

Di nivîsê de (herweha di axaftinê de) zêdetirîn curebêjeyên ku tên bikaranîn lêker in. Lewma beyî wan komek ava nabin. Lêker ji aliyê binyadê ve ne cureyek tenê ne. Yên sade hene, yê hevedudanî hene, bi curbecur awayan pêk tên û li gor demê bikaranîna wan diguhere. Ji ber vê di rastnivîsê de dibin sedema sergêjî û tevlihêviyê. Herçî Zêrevan e wekî xalekê li ser vê mijarê nenivîsiye lê Aydogan û Komxebat bi hûngulî û gelek binnivîsan pêşniyarên xwe bo rastnivîsînê pêşkeş kirine.¹⁸¹ Di vê xalê de em ê dîsa li gor rêzkirina Aydogan pêşniyarên wî diyar bikin û heke Komxebatê derveyî Aydogan tiştek gotibe rave bikin û nimûneyan bidin.

2.26.1 Nivîsîna lêkerên sade

Aydogan pêşî bo lêkera “hebûn”ê nimûneyan dide û cuda destnîşan dike:

Ez Kurd im

Ez Swêdî me

Tu Kurd î

Tu Swêdî yî

Ew Kurd

Ew Swêdî ye û hwd.

Bo lêkerên sade jî dibêje ji parçeyên axaftine yê din cuda tên nivîsîn:

Ez deriyî digirim

Ez bi wî dikenim¹⁸²

2.26.2 Nivîsîna lêkerên hevedudanî

Aydogan van dabeşî du grupa dike û bi hevdu re dinivîse

a. Pêşgir+lêkera sade

daxistin, hilgirtin, rabûn, rûniştin û hwd.

b. Bêjeyên din + lêkera sade

¹⁸⁰ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 179; Komxebat, r. 143.

¹⁸¹ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 35.

¹⁸² Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 181.

çêbûn, derxistin, derketin û hwd.¹⁸³

2.26.3 Lêkerên hevedudanî yên ku ji hevdû cuda tên nivîsîn

Aydogan dibêjê ku ev lêker di kategoriyeke din yên hevedudanî ne û cuda tên nivîsîn:

Av dan, avjenî kirin, dev jê berdan, ji ber kirin û hwd.¹⁸⁴

2.26.4 Nivîsîna “bi” yê di deman bê de

a. Bi lêkerên sade re “bi” tê pêşiya lêkeran û bi wan vê tê nivîsîn

Ez dê biçim

Ez dê biêsim

Herweha lêker ji çend bêjeyan pêk hatibê jî “bi” lêkera sade re tê nivîsîn:

Ez dê ser jê bikim

b. Bi lêkerên hevedudanî re

Di vê rewşê de jî pêşniyara Aydogan ew e ku li pêşiya lekera sade bê nivîsîn û awayê “ ez ê birûnim” berbelav be jî xelet e

Ez dê dabigirim (awayê rast)

Ez dê çêbikim (awayê rast)

Aydogan herweha balê dikişîne ser piraniya lekerên hevedudanî ku dêrî qaîdeyê (Ez dê rawestim, ez dê vexwim, ez dê rûnim) bêyî “bi-“yê tên bikaranîn lêbelê pegiriya vê nake û dibêjê divê “bi-“ bê bikaranîn:

Ez dê rabiwestim

Ez dê vebixwim û hwd.¹⁸⁵

¹⁸³ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 183.

¹⁸⁴ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 183.

¹⁸⁵ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 126.

2.26.5 Nivîsîna dema bê

Hem Aydogan hem Komxebat bo awayê nivîsîna dema bê li gor kesê duyem balê dikişînin ser pênc awayê bikaranînê lê tercîha wan ew e ku “dê” bê bikaranîn:

Tu dê bibînî

Tu ê bibînî

Tu wê bibînî

Tu yê bibînî

Tê bibînî

Tercîha Aydogan û Komxebatê ew e ku bi awayê jêr bê bi kar anîn.

Tu dê bibînî¹⁸⁶

2.26.6 Nivîsîna “di-“ya dema niha

a-Bi lêkerên sade re

Aydogan li pêşiya lêkeran pêşniyar dike û dibêjê divê her bê bikaranîn.

Ez diçim

Ez diafirînim¹⁸⁷

Herweha Aydogan awayê “Ez karim, ez zanim” xelet dibîne û “Ez dikarim, ez dizanim” pêşniyar dike û dibêjê heke lêker ji çend bêjeyan pêk hatibe divê “di-” bi lêkera sade re bê nivîsîn:

Ez ser jê dikim¹⁸⁸

b-Bi lêkerên hevedudanî re

Hem Aydogan¹⁸⁹ hem Komxebat¹⁹⁰ balê dikişînin ser awayê hin bikaranînan (Ez dirûnim, ez divexwim) û dibêjin bo standardê divê ne wisa lê bi awayê jêr bê nivîsîn:

¹⁸⁶ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 187; Komxebat, r. 146.

¹⁸⁷ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 190.

¹⁸⁸ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 190-191.

Ez rûdinim

Ez vedixwim.¹⁹¹

2.26.7 Nivîsîna morfema neyîniyê

Li gor Aydogan¹⁹² û Komxebatê¹⁹³ sê guherteyên wê hene (ne-, na-, ni-) û “ni-” bo du lêkeran(karin, zanîn), “na-” tenê di dema niha de guherteya “ne-”yê di hemû demên din de tê bikaranîn:

Ez nikarim

Ez naxwim

Ez dê nexwim

Ez neçûm¹⁹⁴

2.26.7.1 Nivîsîna morfema neyîniyê bi lêkeren hevedudanî re

Bo vê xalê jî Aydogan¹⁹⁵ û Komxebatê¹⁹⁶ bi awayê “pêşgir+na+lêkera sade” destnîşan dikin:

Ez çênakim

Ez hilnakim

Ez ranawestim¹⁹⁷

Herweha her du berhem pêgiriye bi wê dikin ku qaîdeyên “na-”yê jî derbasdar in.

Li gel van xalên jorîn bo neyîniyê Aydogan û Komxebat balê dikişînin ser “ne”ya tamamkera lêkerê û “ne”ya çêkera rengdêran û dibêjin divê “ne”ya

¹⁸⁹ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 191.

¹⁹⁰ Komxebat, r. 150-151.

¹⁹¹ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 191.

¹⁹² Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 192.

¹⁹³ Komxebat, r. 151.

¹⁹⁴ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 192; Komxebat, r. 151.

¹⁹⁵ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 191.

¹⁹⁶ Komxebat, r. 153.

¹⁹⁷ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 191; Komxebat, r. 153.

temamkera lêkerê cuda (Fransa ne germ e);”ne”ya çêkera dengdêran bi bêjeya ku tê pêşiyê re bizeliqê.(ev jin neyara te ye).¹⁹⁸

2.26.8 Nivîsîna lêkera tebatî

Di vê xalê de Aydogan û Komxebat bi awayekî rêzimanî balê dikşînin ser lêkerên negerguhêz ku nabin tebatî û bi nimûneyên “li ser vê pîrse hat sekinin.” “Av hat kelîn” şaşiyê diyar dikin û rastiya wan weke “Li ser vê pîrsê hat sekinandin.” “Av hat kelandin” destîşan dikin. Herweha li ser “di avakirina awayê tebatî de nivîsa lêkera gerguhêz” jî radiwestin û dibêjin lêkera gerguhêz ji çend parçeyan pêk hatibe jî divê bi hevdû re bê nivîsîn û nimûneya “hatin pêşkêşkirin” didin.

Herweha Aydogan û Komxebat bo vê mijarê behsa “parçeyê awayê tebatî yê nekişandî û navdêra lêkerî jî” dikin û dibêjin divê lêkera gerguhêz bi tu awayê netewe lê gava navdêra lêkerî be li gor zayenda “mê” bê tewandin:

Nimûne:

Ew hat dîtin. (hevok tebatî ye û “dîtin” netewiyaye)

Ew hat dîtîne. (Dîtin navdêra lêkerî ye û tewiyaye)¹⁹⁹

2.26.9 Nivîsîna parengên dema borî

Ev mijar weke parengên ji lêkerên sade û ji lêkerên hevedudanî (yên tewandî û yên netewandî) hatiye raçavkirin û pêşniyarên wan ew in ku parengên sade neyên tewandin (malen **firotî**, ava **kelandî**), yên hevedudanî bi hevdû ve û netewandî (çarşiya **sergirtî**, dewarên serjêkirî...) û heke beşeke lêkerên hevedudanî tewandî be (top li malê ketî, ji bîrê çuyî...) ji hev cuda bîn nivîsîn.²⁰⁰

2.26.10 Nivîsîna dema borî ya nediyar

Ev xal di berhema Komxebatê de tune ye. Aydogan bo yên ku bi “-în”ê diqedin pêşniyar kiriye ku “î”ya raderê bê parastin û bo yên ku bi “-în”ê diqedin dîsa “î” bê parastin.

Nimûne:

¹⁹⁸ Aydogan, **Rêbera Rastnivîsînê**, r. 193; Komxebat, r. 154.

¹⁹⁹ Aydogan, **Rêbera Rastnivîsînê**, r. 207; Komxebat, r. 160.

²⁰⁰ Aydogan, **Rêbera Rastnivîsînê**, r. 210.

Min biriye (birin)

Ew gerîyaye (gerîn)²⁰¹

2.26.11 Nivîsîna “hatin” û “anîn”ê

Aydogan vê xalê bi sernivîsa “hîlbijartina ji hin lêkerê hevmane” dide. Behsa “helan û hiştin, hatin û werîn, înan û anîn, çûn û hêrîn”ê dike. Ez ê tenê li ser “hatin” û “anîn”ê rawestim lewra derbarê wê nîqaş hene. Aydogan di cihê “anîn”ê “înan”; “hatin”ê tercih dike lewra bo hemû deman tên kişandin.

Nimûne:

Ez dînim

Ez dihêm

Ez dê bînim

Ez dê bihêm

Min îna

Ez hatim

Min îna bû

Ez hatime

Bîne!

Ez hatibûm²⁰²

Zêrevan herçiqasî weke xalekê li ser nivîsîna van raneweste jî Komxebat du forman nîşan dide. Li gor wan bo dema niha û dema bê formên lêkera “hatin”ê yên bingehîn ev in:

Nimûne:

Yekjimar (dema niha)

Dihêm

Dihêyî

Dihê

Dihên (pirhejmar)

Yekjimar (dema bê)

Bihêm

²⁰¹ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 211-212.

²⁰² Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 213-214.

Bihêyî

Bihê

Bihên (pirhejmar)

Herweha Komxebat van forman jî qebûl dike:

Bo kesên yekjimar di dema niha de: têm, têtî, têt

Bo kesên pirhejmar di dema niha de: tên

Bo kesên yekjimar di dema bê de: bêm, bêyî, bê

Bo kesên pirhejmar di dema bê de: bèn²⁰³

Bo ravekirina vê xalê dixwazim serî li Öpengin bidim ku dibêje ji vê rewşê re hypercorrection (zêde-rastî)²⁰⁴ Awayê ku “rêber” pêşniyar dikin kêşana lêkerê li gor rewşa wan ya birist e û ev tiştêkî rêzimanî ye. Lêbelê di nav gel de di gelek devokan de rewşa “bêrist” têt bikaranîn û di nivîsê de jî têt xwe cih girtiye. Piştî vê, gava kitêbên rêzimanê û kitêbên weşandî li ber çavan neyên girtin dê serê nivîskar û xwendevanan tevlihev bike. Ango rêberên rastnivîsînê divê ji bikaranîna zimên ya giştî sûd wergirin. Bo mînak, herçiqasî lêkera “hatin”ê bo dema bê, kesê duyem li gor rêzimanê bi awayê “tu dê bêyî” bê kişandin jî bi demê re pêdivî bi “î”yê nemaye û ketiye rewşa “tu dê bê, tu yê bê, têt bê û hwd.” Helbet bo rastnivîsînê divê yek ji wan bê pejirandin lê ne ya bilêvkirina wê herî zor. Li gel vê gava em li pirtûkên rêzimanê jî binêrin kêşana lêkera “hatin”ê bo dema bê, bi awayê ku rûniştîye hatiye bikaranîn.²⁰⁵

2.26.12 Nivîsîna navdêrên lêkerî

Hem Aydogan hem Komxebat wê pêşniyar dikin ku bi çî awayî hatibin çêkirin navdêrên lêkerî bi hevdû ve bèn nivîsîn:

Nimûne:

²⁰³Kom.r. 158

²⁰⁴Öpengin, *Pirsên Rênivîsa Kurmancî: Pêdeçûneke Rexneyî li ser Rêbera Rastnivîsînê ya Mistefa Aydogan*, r. 193.

²⁰⁵Birahim Xelîl Taş, *Kêşana Lêkeran bi Zaravayê Kurmancî*, Lîs, Çapa Yekem, Ankara, 2011, r. 74.

Ji lêkerên sade;

kuştin

dîtin

Ji lêkerên hevedudanî;

guhdarîkirin

xeberdan

Ji lêkerên sêbêje;

serjêkirin

pêvekirin

Ji lêkerên ji sê bêjeyan zêdetir;

liberxwedan

biserxwevehatin²⁰⁶

Herweha Aydogan û Komxebat bi sernivîsa “zayenda navdêrên lêkerî” pêşniyar dikin ku navdêrên lêkerî ji aliye zayendê ve “mê” ne û divê li gor wê bîn tewandin û nivîsîn.²⁰⁷

2.26.13 Tewanga navdêrên lêkerî û veqetandek û navdêrên lêkerî

Herçiqasî bi nimûneyan ev xal ji aliye Aydogan û Komxebatê ve bi hûrgilî hatibe raçavkirin jî bi kurtasî dibêjin hemû qaîdeyên tewangê û veqetandekê û îzafeyê bo navdêrên lêkerî jî derbasdar in.²⁰⁸

2.27 Nivîsîna daçekan

Nivîsîna daçekan jî gelek caran serê kesên bi nivîsê re eleqedar diêşîne û van salên dawî nîqaş li ser çêdibin. Ji ber vê ye ku hem Aydogan û hem Komxebatê wekî xalakê cih dane vê mijarê jî. Her du xebat jî pêşî du qaîdeyên sereke dideynin û

²⁰⁶ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 215-216; Komxebat, r. 164.

²⁰⁷ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 216; Komxebat, r. 164.

²⁰⁸ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 216; Komxebat, r. 166.

dibêjin daçek bi bêjeyên din ve nayên nivîsîn û tu carî neyên tewandin. Piştî vê jî du cure daçekan destnîşan dikin û awayê nivîsîna wan pêşkêş dikin.²⁰⁹

2.27.1 Nivîsîna pêşdaçekên kurmancî

Pêşdaçekên sade: Cuda hatine nivîsîn. “Bi, bê, ji, li, berî, piştî” hinek ji wan daçekan in.

Awayê nivîsînê

bi kêrê

bê xezalê

ji Mêrdînê û hwd.

Pêşdaçekên nesade: Dîsa cuda hatine nivîsîn. “Li, ser, li, bin, li ber, li ba, li gel, li gor” hinek ji van daçekan in.

Awayê nivîsînê

li ser maseyê

li bin maseyê

li ber malê

li gel grûpê û hwd.²¹⁰

2.27.2 Nivîsîna bazinedaçekên kurmancî

Hem Aydogan hem Komxebat balê dikişinin ser wê ku bazinedaçekên bingehîn ji du beşan pêktên û her du beşên wan bi hevdû re bazinedaçekan çêdikin û ev cure bazinedaçek bêjeyan dixin navbera xwe lêbelê bazinedaçek ji sê beşan pêk hatibe, her du beşên li pêşiya bêjeyan tên danîn û beşe sêyem li paşiya bêjeyan tê danîn. Herweha her du berhem jî li gel wê ne ku bêjeya di navbera bazinedaçekên de bê tewandin.

Di vê xalê de tiştê ku balê dikîşîne lihevnekirina Aydogan û Komxebatê ya li ser nivîsîna bazinedaçekan e.

²⁰⁹ Aydogan, **Rêbera Rastnivîsînê**, r. 221; Komxebat, r. 168.

²¹⁰ Aydogan, **Rêbera Rastnivîsînê**, r. 222; Komxebat, r. 169.

Aydogan bazinedaçekan wisa destnîşan dike:

di.....de	di berîkê de
di.....re	di çarşiyê re
i.....re	ji dibistanê re
ji.....ve	ji aliyekî ve
di ber.....de	di ber malbatê de
di bin.....de	di bin xanîyî de
di ber.....re	di ber dibistanê re ²¹¹

Tercîha Komxebatê jî bi awayê jêrîn e lê dibêjin bi awayê “bi...re, di...de, ji...re û di...re” jî dikarin bên nivîsîn:

bi.....ra	bi Xezalê ra
bi.....ve	bi dîwarî ve
di.....da	di berîkê da
di.....ra	di çarşiyê ra
ji.....ra	ji dibistanê ra
ji.....ve	ji aliyekî ve
ber bi.....ve	ber bi malê ve
di ber.....da	di ber malbatê de
di bin.....da	di bin xanîyî da
di ber.....ra	di ber dibistanê ra ²¹²

2.28 Nivîsîna hejmarnavan

Nivîsîna hejmarnavan jî di rastnivîsînê de mijareke girîng e û derbarê wê tevlihevî heye. Ji ber vê ye ku hem Aydogan û Komxebat û hem jî Zêrevan li ser vê

²¹¹ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 224.

²¹² Komxebat, r. 170.

xalê bi kitekit rawestiyane. Di bin vê sernivîsê de dê pêşî nêrînên Aydogan û Komxebatê piştre nêrîna Zêrevan bê pêşkêşkirin.

Di vê xalê de jî berhema Komxebatê hema bêje dubarekirina berhema Aydogan e. Loma dê nimûne ji wî bên standin û ravekirin bi heman awayî bê kirin.

Aydogan di serî de cihê bikaranîna tîp û reqeman rêz dike û pênc xalên sereke destnîşan dike:

a-Hejmarnavên heta duwazdehan (Komxebat bi heta dehan dibêje)²¹³

b-Divê mirov heta ku mecbûr nemîne tîp û reqeman têkilî hev neke.

c-Pewîst e problemên matematîkê, tarîfeyên demê, bihayên tiştan, encamên pêşbaziyên sporê, karên statîstîkê gava di nivîsê de hejmar pir girîng bin, nimreyên tişt, dever û kategoriyan û hwd, hejmarên li gel nîşanên “% û ‰”ê (%25), hejmarên dehekî (3,14), li gel kurtkirinên bêjeyên mîna rûpel û cildê (r.21), li gel kurtkirinên pîvanan (500 GB, 100 Hz) û gava ku hejmarnaveke ji “13an” piçûktir li gel hin hejmarên mezintir bên nivîsîn (Komxebat di cihê 13an de 10an dipejirîne) û Aydogan û Komxebat heman nimûmeyê nîşan didin.

“Em dê roja 10an, 17an û 25an de li ser hevûdin 3 caran bicivin.”

Divê hejmarnavên heta duwazdehan (Komxebat heta dehan dibêje)²¹⁴, meqbûz, peymanên ticarî, protokol, belgeyên resmî, hejmarên tam yê mezî (du milyar), hejmarên teqrîbî, nivîsînaqanûnan bên nivîsîn.

d-Divê di nivîsîna hejmarnavan de mirov bi reqeman dest bi hevokê neke, di hevokê de carekê bi tîpan carekê bi reqeman nenivîse, di bikaranîna xêzikê (-) de rê nede şaştegihiştinan (Meaşê wî 4-500 ewro ye), gava ku xêzik di navbera reqeman de bê bikaranîn navber neyê dan, piştî reqema hezarî navber hebe (3 950) û hejmarên teqrîbî bi nivîskî bên nivîsîn.

²¹³Komxebat, r. 171.

²¹⁴Komxebat, r. 173.

2.28.1 Grûpkirina hejmarnavên bi reqeman nivîsandî

Bo vê xalê Aydogan û Komxebat hemfikir in û dibêjin gava ku bi reqema hejmareke mezin bê nivîsîn divê mirov ji dawiyê dest pê bike û reqeman sê bi sê bike grûp.

Nimûne:

2.500

12 245

212 345 û hwd.²¹⁵

2.28.2 Nivîsîna hejmarên telefonê

Her du behrem jî bi heman awayî hejmarên telefonê disenifnin û li gor ku hêsanî bîn jiberkirin nivîsîna wan wisa pêşniyar dikin:

Hejmarên telefonê:

Nimûne:

313 23 (hejmarên pêncreqemî)

31 32 32 (hejmarên şeş reqemî)

Hejmara telefonê li gel koda welat û bajaran:

Nimûne:

+468313 323 23

Hejmara telefonê li gel koda welat û bajaran:

Nimûne:

0482 313 23 23

Hejmara telefonê li gel koda welat û bajêr û nimreya girêdanê:

Nimûne:

²¹⁵ Aydogan, **Rêbera Rastnivîsînê**, r. 230.

+46 8 313 323 23/47²¹⁶

2.28.3 Nivîsîna saet, deqîqe, saniye û salîseyê

Ev xal jî ji aliyê her du berheman ve bi hûrgulî hatiye zelalkirin û li gor hilbijartina xalbendiyê di tixûbên wan de û bikaranîna wan di hevokê de hatine senifandin û ev xalên jêrîn tên pêşniyarkirin.

a-Divê tixûbên saet, deqîqe û saniyeyê bi xalê bê nîşandan

Nimûne:

06.25 (Nivîsîn)

Sifir şeş û bîst û pênc deqîqe (Bilêvkirin)

b-Divê tixûbê salîseyê bi bêhnokê bê nîşandan:

Nimûne:

06.25.45,24 (Bilêvkirin bi sifirê dest pê dike)

c-Li gel van bo sih û panzdeh deqîqeyên ku bi hejmareke saetê tên nivîsîn jî van nimûneyan didin.

Nimûne:

06.30 (Nivîsîn)

Sifir şeş û sih deqîqe û sifir şeş û nîv (Bilêvkirin)

06.15 (Nivîsîn)

Sifir şeş û çaryek (Bilêvkirin)²¹⁷

Bo vê xalê Komxebat “sîstema analog” jî destnîşan dike û behsa têgihên “berî nîvroyê” û “piştî nîvroyê” dike û nimûneyên jêrîn dide.

Nimûne:

6:30

Bilêvkirin: **1-Şeş û nîvê berî nîvroyê**

2-Şeş û nîvê beneyê (Şeş û sihê beneyê)

3-Şeş û nîv bn

Nimûne:

²¹⁶ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 231;Komxebat, r. 177.

²¹⁷ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 232;Komxebat, r. 178.

6:30 pn

Bilêvkerin: **1-Şeş û nivê piştî nivroyê**

2-Şeş û nivê peneyê (Şeş û sihê peneyê)

3- Şeş û niv pn²¹⁸

Xaleke din ku Aydogan û Komxebat li ser radiwestin jî nivîsîna saetê li ge bazinedaçeka “di.....de”yê ye û pêşniyara wan ew e ku saet di navbera “di.....de”yê de bê nivîsîn û gotin:

Nimûne:

Di saet çaran de²¹⁹

An jî bi gotina Komxebatê “Di saet çaran da”²²⁰

2.28.4 Xêzik di nivîsîna demê de

Bi hevokekê ev mijar hatiye ravekirin ku gava pêwîst be di nivîsîna demê de xêzik bê bikaranîn.

Nimûne:

Pirtûkxane di saet 12-18an de vekiriyê²²¹

2.28.5 Hejmarnavên bingehîn

Aydogan û Komxebatê di vê xalê de hejmarnavên bingehîn rêz dikin û heman awayî destnîşan dikin. Aydogan bo “du”yê “dudu”, bo “sê”yê “sisê” jî dinivîse²²² lê komxebat vê rewşê bi jêrenotekê ku dibêje awayên cuda jî hene nîşan dide.²²³ Tişteki din ku berhem balê dikşînin ser ew e ku ji hejmarnava bîstî heta dawiyê gihaneka “û”yê bikeve navbera wan.

²¹⁸Komxebat, r.178.

²¹⁹ Aydogan, **Rêbera Rastnivîsînê**, r. 233-234.

²²⁰Komxebat, r. 179.

²²¹ Aydogan, **Rêbera Rastnivîsînê**, r. 234.

²²² Aydogan, **Rêbera Rastnivîsînê**, r. 234.

²²³Komxebat, r. 179.

2.28.6 Tewanga hejmarnavan

Wekî ku tê zanîn di nivîsîna hejmarnavan de tevlihevî zêde ye. Sedema vê tevliheviyê jî helbet zayenda wan e. Gava zayend pirsgirêk be, tewandina wan jî dibe pirsgirêk. Di vê mijarê de hem Aydogan hem Komxebat balê dikşînin ser vê pirsgirêkê û xal bi xal pêşniyarên xwe rêz dikin. Heçî Aydogan û Komxebat in hejmarnavan “nêr” dihesibînin²²⁴ lêbelê qenaeta Arif Zêrevan ew eku hejmarnav “mê” ne.²²⁵

Aydogan û Komxebat bo zelalkirina mijarê serî li Hawarê û zaravayê kirmanckî didin û bi pêgiriya wan tercîha nêrbûna hejmarnavan dikin û van xalên jêrîn derdixin pêş.

a-Ji bilî “yek”ê hemû hejmarnavên kurmancî “nêr” in.

b-Ji “du”yan heta nozdehan hemû hejmarnav bi “-an”ê tên tewandin.

Nimûne:

Ji duyan, ji sêyan û hwd.

c-Hejmarnavên ji duyan heta nehan, di dawiya kîjan hejmarnavên mezin de bin dîsa bi “-an”ê tên tewandin.

Nimûne:

Îsal gihişte çil û çaran

ç-Hejmarnavên ji duyan heta nozdehan ku bi “-an”ê tên tewandin, navdêran li gor xwe ditewînin:

Nimûne:

Bi du zêran

Bi sê dolaran û hwd.

d-Hejmarnavên bîst.....not, sed, hezar, milyon, milyar û hwd. Bi “-î”yê tên tewandin û ku pêwîst be ji bo pevgerêdanê “-y-“tê bikaranîn.

Nimûne:

Ji bîstî

²²⁴ Aydogan, **Rêbera Rastnivîsînê**, r. 235.

²²⁵ Zêrevan, **Bingehên Rastnivîsandina Kurdiyê**. r. 72.

Ji sîhî

Ji pêncîyî û hwd.

Herweha navdêrên ku li gel van hejmarnavan tên bikaranîn jî li gor wan dikevin û tên nivîsîn.

Nimûne:

Ji bîst û yekê

Ji çil û çaran

Ji hezar û sedî û hwd.

e-Hejmarnavên “hezar”î û “mîlyon”ê gava bi serê xwe bin bi “-î”yê, gava bi hejmarnaveke din re bin û li paşî bin li gor wê hejmarnavê tên tewandin.

Nimûne:

Ji sê hezaran

Ji çar hezaran

Ji bîst hezarî

Ji sih hezarî

Ji du mîlyonan

Ji bîst mîlyonî û hwd.

Aydogan û Komxebat vê qaîdeyê bo hejmarnavên milyar, trilyon, trilyar, katrilyon, katrilyar, kentrilyon jî derbasdar dibînin.²²⁶

f-Hejmarnava yekê “mê” ye û bi “ê”yê tê tewandin û tesîrê li navdêrên li pey xwe nake.

Nimûne:

Ji yekê

Pêlika bîst û yekê

²²⁶ Aydogan, **Rêbera Rastnivîsînê**, r. 238; Komxebat, r. 184.

Ji yek jinê

Ji yek kurî²²⁷

g-Bêjeya “nîv”ê gava ku bi serê xwe be bi “-î”yê tê tewandin lê gava li gel hejmarnavên din bê bikaranîn li gor wan ditewe.

Nimûne:

Ji nîvî

ji yek û nîvê

ji du û nîvan û hwd.

2.28.7 Nivîsîna pirtika tewangê

Di vê xalê de jî Aydogan û Komxebatê hemfikir in û pêşniyara wan ew e ku gava pirtika tewangê li gel hejmarnavên bi tîpan an jî bi reqeman hat bikaranîn ji hejmarnavan venaqete û bi wan ve bêyî ku apostrof, bendik, navbir bî bikaranîn bê nivîsîn.

Nimûne:

Ez çaran nahesibînim

Sala 60î

Ji 17an

Ji 21ê²²⁸

2.28.8 Nivîsîna veqetandekê ya li gel hejmarnavan

Di vê mijarê de jî Aydogan û Komxebat qaîdeyê bi heman awayî nîşan didin ku zayenda hejmarnavan nêr e divê pirtika veqetandekê “e”yê bistînin.

Nimûne:

Yekê gulanê

²²⁷ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 239.

²²⁸ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 240-241; Komxebat, r. 185-186.

Duyê mehê

Dehê tebaxê²²⁹

Di vê xalê de bo yekê dijîtiyek xuya dike û her du berheman jî bi jêrenotekê ev diyar kiriye.

2.28.9 Hejmarnavên rêzîn

Di vê xalê de A. Zêrevan hejmarnavan li gor zayenda “mê” rêz dike²³⁰ lêbelê Aydogan û Komxebat balê dikşînin ser wê ku hinek hejmarnavan “mê”; hinek jî “nêr” dihesibînin û divê standardek bê peyda kirin. Di vî warî de tercîha wan ew e ku hejmarnav bi “-em”ê bînin nivîsîn –wekî ku gelek wisa dikin- û rê li ber aloziyan bê girtin.

Nimûne:

yekem, duyem, sêyem, yazdehem, duwazdehem û hwd.²³¹

2.28.10 Nivîsîna hejmarnavên dehekî, sedekî, hezarekî, dabeşî û peyvên duhejmarî

Ev xal jî di nivîsê de gelek caran mirov dudilî dike ku dê çawa binivîse û hem Aydogan hem Komxebatê bi berfirehî nivîsîna van xalan jî destnîşan kiriye. Li gor wan, hejmarên dehekî bi reqeman û bêyî navbirê (nimûne: 4,25, ji yekê kêmtir be 0,75), hejmarên sedekî û hezarekî piştî nîşana (% , ‰ bi reqeman tên nivîsîn û di navbera nîşanê û hejmaran de navbir tê bikaranîn.

Nimûne:

%35 (ji sedî sih û pênc)

‰ 5 (Ji hezarî pênc)

Herweha bo hejmarnavên dabeşî tenê nimûneyan didin û bo nivîsîna du hejmarnavan jî wê qaîdeyê dideynin ku hejmarnava piçûktir pêşî û ya mezintir dawî bê nivîsîn û navbir bê bikaranîn.

²²⁹ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 242; Komxebat, r. 187.

²³⁰ Zêrevan, *Bingehên Rastnivîsandina Kurdiyê*, r. 74.

²³¹ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 244; Komxebat, r. 188.

Nimûne:

½ ji duyan yek (duyek), nîv

1/3 ji sêyan yek (sêyek)

3/5 ji pêncan sê (pêncsê)

Du sê kes

Sê çar meriv

Çil pêncî sal²³²

2.28.11 Reqemên romayî

Wekî gelek xalên din Aydogan û Komxebat li ser vê xalê radiwestin û Zêrevan derbarê wê tiştê nabêje. Aydogan û Komxebat diyar dikin ku reqemên romayî ji tîpan pêk tên, heft in (I, V, X, L, C, D, M) û bi giştî bi girdekan tên nivîsîn û bo sifirê tu reqem nîne. Herweha ew balê dikşînin ser wê ku reqemek nikare ji sê caran zêdetir bi dû hevdû ve bê nivîsîn.

Nimûne:

“III” bo sêyê rast e lê “IIII” bo çarê nabe û awayê wê yê rast “IV” e.²³³

Li gel vê, Komxebat balê dikşîne ser tewanga reqemên romayî jî û dibêje bo berlêgirtina tevliheviyan bendik (-) dikare bê bikaranîn.

Nimûne:

Hesoyê XV-an

Ehmoyê XII-an²³⁴

Wekî ku me di serê vê xalê de jî gotibû, Zêrevan jî li gor xalên din cihekî fireh bo mijarê veqetandiyê. Zêrevan bi sernivîsên “reqem yan tîp, senifandina hejmarên mezin, senifandina nimre û hejmaran, nêvber, reqem û tîp pêk ve, jimarnavên bingehî, tewanga jimarnavên bingehî, jimarnavên rêzê, nîşandeka

²³² Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 245-246; Komxebat, r. 190-192.

²³³ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 246-247; Komxebat, r. 191-192.

²³⁴ Komxebat, r. 193.

dehekê, agahdariyên demî, miqdar û pêknivîsandina hejmar û bêjeyan” pêşniyarên xwe rêz kirine ku ji Aydogan û Komxebatê cuda ne.

Li gor Zêrevan;

a- Ededên bi dehek

Nimûne:

2, 5, 3, 4

b- Kertên ededan

Nimûne:

21/2 yan dido û nîvek

1/3 yan sêyek

c- Hejmara pîvanan bi kurdî û piştî saetê

Nimûne:

10 m, saet 20.00

d- Di nimrekirinê de

Nimûne:

Sinif 5, Hejmar 56 û hwd reqem tên bikaranîn.

Herweha Zêrevan qaîdeyek wisa jî tîne zimên ku heta hejmara yazdehem bi tîpan û ji hejmara 12em pê de bi reqeman û ededên mezin yê bêkert bi tîpan û bi hevdû ve bî nivîsîn.

Nimûne:

Li meydana Çarçirayê bi hezaran mirov kom bûbûn, dor pêncsed ji wan hatin girtin.²³⁵

Li gel van di vê xalê de Zêrevan balê dikşîne ser wê ku komek bi reqeman dest pê neke û pêwîst be bi tîpan û bi hevdû ve binivîse.

Nimûne:

²³⁵ Zêrevan, **Bingehên Rastnivîsandina Kurdiyê**. r. 67.

Di bin şapeyê de 356 kes man

Sêsedûpêncîûşêş kes di bin şapeyê de man.²³⁶

Zêrevan bo senifandina hejmarên mezin jî weke Aydogan û Komxebatê dibêje gava bi reqeman tên nivîsîn ji paşiyê bi grûpên sêreqemî bên rêzkirin.

Nimûne:

27985 368

1 056 925

Herweha dibêje ku hejmarên mezin dikarin bi tîpan û hejmarên yê din bin hezarî re bi yek bêjeyê bîn nivîsîn.

Nimûne:

Notûpênc hezar, neh milyon, bîstûpênc²³⁷

Du sê xalên din ku di vê mijarê de Zêrevan destnîşan dike nivîsîna çekên pereyan (hemû reqem weke yek bêjeyê), hejmarên girover ku ji hezarî pirtir (Nim., 20 hezar), hejmara salê bi tîpan û wekî yek bêjeyê jî.

Nimûne:

1939 (hezarûnehsedûsihûneh)²³⁸

Li gel xalên li jorî bo zêrevan senifandina nimre û hejmarên salan in û bo hejmarê salê (Nim: 1639), bo nûmreya telefonê ku bi awayê kevn e (Nim. 412-342345/234), numreya kolanê (Nim. Kamûran Alî Bedir-Xanî 68), nûmreya posteyê (Nim. 746 93 Dêrsim), numreya postûrojê (Nim. Pc.67-9, numreya bankûrojê (Nim. Bc.785-3498), numreya xwedêdemê (Nim. 651227 yan 27.12.1965 yan 27/12/1965yan jî 27.xii.1965) û numreyên ISBN û ISSNê (Nim. ISBN 918773067 yan jî 91-8773-067-7) jî²³⁹

Herweha bo navbirê jî dibêje divê reqem neyên kurtkirin

²³⁶ Zêrevan, **Bingehên Rastnivîsandina Kurdiyê**. r. 67.

²³⁷ Zêrevan, **Bingehên Rastnivîsandina Kurdiyê**. r. 67.

²³⁸ Zêrevan, **Bingehên Rastnivîsandina Kurdiyê**. r. 69.

²³⁹ Zêrevan, **Bingehên Rastnivîsandina Kurdiyê**. r. 70-71.

Nimûne:

2-300 kesan (2 ta 300 kesan)

200-300 kesan (200 ta 300 kesan)

Lêbelê mirov dikare di navbera salan de kurtkirinê bike.

Nimûne:

1950-1952ê 1950-52.

Wekî Aydogan û Komxebatê xalake din ku Zêrevan rave dike hêjmarnavên bingehîn û tewanga wan e. Bo hejmarnavên bingehîn yên ku ji Aydogan û Komxebatê cuda ev in.

Zêrevan²⁴⁰

Diwazdeh

Sizdeh

Pazdeh

Şêstî

Heftî

Heştî

Not

Aydogan û Komxebat²⁴¹

duwazdeh

sêzdeh

panzdeh

Şêst

Heftê

heştê

nod

Li gel vê Zêrevan wekî me berê jî gotibû hêjmarnavan li gor zayenda “mê” bi “-ê”yê ditewîne.

Nimûne:

Yekê, didoyê, bîstê, pênciyê, şêstiyê, hezarê û hwd.

Ez yekê dibînim

Ez çarê dibînim

²⁴⁰ Zêrevan, **Bingehên Rastnivîsandina Kurdiyê**. r. 77.

²⁴¹ Aydogan, **Rêbera Rastnivîsînê**, r. 254.

Ez heştiyê dibînîm

Ez sala 1997-ê bû 32-salî²⁴²

Zêrevan bo vê mijarê zelal bike serî li Celadet Bedirxan dixwe ku dibêje zayenda “çar”ê gelejmar e û navdêran li gor xwe ditewîne lê ew bixwe ne di wê baweriyê de ye û hemû hejmarnavan yekhejmar dihesibîne û dibêje ancax navdêrên li pey wan an pêşiya wan pirhejmar an yekhejmar bên bikaranîn. Li gor wî gava “Ez çaran dibînîm” bê gotin an nivîsîn ne rast e lewra “çar” bêyî navdêrê hatiye bikaranîn û “mê” ye û yekhejmar e û hewce ye bi awayê “Ez çarê dibînîm” bê nivîsîn²⁴³

Di berhema Zêrevan de hejmarnavên rêzê jî cihekî berfireh digirin ku ew dibêje divê bi alîkariya cînavên îşarkî bên çêkirin.

Nimûne:

Yê yekê, yê didoyê, yê pênciyê, yê hezarê û hwd.

Zêrevan di vir de jî bi serîlêdana nimûneyên ji Ehmedê Xanî û Mele Mehmûdê Beyezidî ku li dijî nêrîna Celadet hejmarnav rêz kirine dixwaze piştrast be û hejmarnavên rêzê wisa destnîşan dike:

Nimûne:

Cara sedê

Hilbijerê şeşê²⁴⁴

Herweha Zêrevan dibêje di vê sedsala paşiyê de hinek kurmanc bi tesîra soranî “em”ê û “emin” dinivîsîn²⁴⁵ ku Aydogan û Komxebat jî bo standardbûnê “em”ê pêşniyar dikin lêbelê divê mirov wekî wan neke.

Zêrevan bo nîşandeka dehekê jî bêhnokê bê valahî pêşniyar dike:

Nimûne:

3,1415926535

²⁴² Zêrevan, *Bingehên Rastnivîsandina Kurdiyê*. r. 74.

²⁴³ Zêrevan, *Bingehên Rastnivîsandina Kurdiyê*. r. 74.

²⁴⁴ Zêrevan, *Bingehên Rastnivîsandina Kurdiyê*. r. 74.

²⁴⁵ Zêrevan, *Bingehên Rastnivîsandina Kurdiyê*. r. 75.

0,75

Ji bilî van du xalên din ku Zêrevan nîşan dike miqdar û pevvenivîsîna hejmar û bêjeyan e û dibêje miqdara bihayê tiştan bi gelek awayan (Nim.: 5 banqenot û 90 qurîş, 5,90 banqenot) tê nivîsîn û mirov dikare hejmar û bêjeyekê bi bendikekê (-) ve jî bi kar bîne.

Nimûne:

35 – salî²⁴⁶

2.29 Nivîsîna tarîxê

Nivîsîna tarîxê jî carinan dibe pirsgirêk lewra gelek awayên wê hene. Aydogan û Komxebat piştî ku balê dikşînin ser çend curenivîsînê (Nim.: 03/09/11, 2011.03-21, 011-03-21 li gor ISOyê û hwd) weke standardê bi awayê “21.03.2011” pêşniyar dikin û dibêjin ev ya herî berbelav û bikarîner e.

Herweha dibêjin divê di tarîxê de mirov beşê salê kurt neke û bêyî xaldanînê (Nim.: 09 08 2011) û bi hev ve (Nim.:09082011) neyê nivîsîn.

Her du behrem bo nivîsîna tarîxê ya bi herfan “di bîst û yekê adarê de/da”, bo nivîsîna tarîxê ya bi reqem û tîpan “Di sala 1975an de”, bo veqetandinekê “bîstê mehê, 20ê mehê”, bo tewangê “di sala 1914an de/da” pêşniyar dikin.²⁴⁷

Herçî Zêrevan e vê mijarê bi nivîsîna hejmarnavan re bi navê “agahdariyên demî” dide.

Zêrevan di heman demê de balê dikşîne ser wê ku hejmara salê neyê kurtkirin lê heke pêwîst be mirov reqemên paşiyê biparêze û bi bendikê (-) bitewîne (Nim.: havîna 95-ê) û bikaribe tarîxê bi gelek awayan binivîsîne:

Nimûne:

21-ê adara 1967-ê (tewandî)

27/1 1967

²⁴⁶ Zêrevan, **Bingehên Rastnivîsandina Kurdiyê**. r. 76-77.

²⁴⁷ Aydogan, **Rêbera Rastnivîsînê**, r. 249-253; Komxebat, r. 194-197.

27.1.1967

1967-01-27

Herweha Zêrevan bo periyodên demê jî çend mînakên wisa rêz dike.

6-27 gulana 1995-ê

6 gulan – 20 hezîrana 1994-ê

6 gulana 1993 – 8 tebaxa 1994-ê²⁴⁸

2.30 Xalbendî

Mijareke din jî ya rastnivîsînê xalbendî ye. Wekî ku Aydogan û Komxebat jî bi heman awayî behs dikin²⁴⁹ xalbendî xwendinê hêsantirr dike û rêli ber şaştêgihîştinê digire û metnê zelal dike.

Ji ber vê ye ku Aydogan, Komxebat û Zêrevan jî cih dane xalbendiyê û bi kitekit rave kirine, nimûne dane. Lêbelê wekî ku di rêbaz û armanca tezê de jî hatibû gotin em ê bi hûrgilî li ser berawirdkirina vê xalê ranewestin lewra di warê bikaranîna nîşanên xalbendiyê de tevliheviyeke zêde tune ye û jixwe ji bilî navlêkirina xalan bi giştî lihevhatinek heye. Loma em ê tenê behsa çend xalên ku li ser wan lihevhatinek tune ye, bikin. Li gor vê xalên derdikevin pêşberî me ev in.

a-Di navbera Aydogan û Komxebatê de hem ji aliyê binavkirinê hem ji aliyê bikaranînê hemfîkrî heye lêbelê Komxebatê bo “xalbang”ê “bangnîşan”, bo “kemerkevanekê” “kevanbend” gotiye û “xwarexêz ” “stêrk”, “çikexêz”, “jêrexêz ()”, “aksana grav (‘) jî li xalbendiyê zêde kiriye.

b- Aydogan û Komxebat balê dikîşînin ser bêhnoka berî “ku”ya gîhanek û dibêjin divê neyê bikaranîn.

Nimûne:

Azad dibêje ku Dilşa dersa xwe dixwîne

Min got ku ez li kitêbxaneyê dixebitim.²⁵⁰

²⁴⁸Zêrevan, **Bingehên Rastnivîsandîna Kurdiyê**. r. 78.

²⁴⁹Aydogan, **Rêbera Rastnivîsînê**, r. 254; Komxebat, r. 198.

Zêrevan wekî têbîniyekê behsa vê xalê nake.

c- Xaleke ku balê dikşîne jî bikaranîna “bendik”ê (-) ye. Ji bo vê xalê Zêrevan dibêje, divê her tim bendik di navbera pêvegirêdanên û tevandinên ji reqem û bêjeyan çêbûyî herweha navbera pêvegirêdanên ji kurtekan jî bê bikaranîn.

Nimûne:

70– salî

Sala 1987- ê²⁵¹

Aydogan û Komxebat di vê rewşê de hewcedariyê bi “bendik”ê nabînin.

Nimûne:

Di salên 70yî de gelek kes marksîst – lenînîst bûn.²⁵²

Herweha di xala xalbendiyê de Zêrevan cih dide nîşandekên matematîkî jî.²⁵³ Lê Aydogan û Komxebat pêdiviyê bi wan nabînin.

Wekî ku me li jor jî behs kir di bikaranîna nîşandekên xalbendiyê de bi giştî lihevkirinek heye û di nivîsê de ev, nebûye pirsgirêkek. Lewra me jî ev mijar kurt birî û li ser hûr nebûn.

²⁵⁰ Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 261; Komxebat, r. 204.

²⁵¹ Zêrevan, *Bingehên Rastnivîsandina Kurdiyê*. r. 120.

²⁵² Aydogan, *Rêbera Rastnivîsînê*, r. 272; Komxebat, r. 214.

²⁵³ Zêrevan, *Bingehên Rastnivîsandina Kurdiyê*. r. 138.

ENCAM

Di vê xebatê de me hewl da xebatên rastnivîsînê bidin nasîn, têkiliya zimên û nivîsê raxînin ber çavan û sê berhemên rastnivîsînê berawird bikin. Wekî ku tê zanîn her xebat hin encamên xwe hene û bi vê xebatê, em gihîştin hin encamên sereke ku em dê li jêrê pêşkêş bikin.

1. Ji salên 80yî û vir ve çî dezgehî çî şexsî xebat li ser rastnivîsînê hatine kirin. Pêşî rojnameya Kurmancî ya Enstîtûya Kurdî ya Parîsê paşê di sala 1997an de Arif Zêrevan û kesên din hewl dane qaîdenan deynin û îrroj berhemên Aydogan û Komxebatê di qada rastnivîsînê de berbiçav in. Lêbelê bi van hemû hewlan ve hê jî standardizasyonêk ava nebûye û curbecur awayên rastnivîsînê derdikevin pêşberî me.

2. Rêberên rastnivîsînê ji qaîdeyên rastnivîsînê bêhtir berê xwe didin ravekirina qaîdeyên rêzimanê. Meseleya ku her sê berhemên mijara xebata me, bi berfirehî cih dane tewangê, veqetandekan, çêkirina lêkeran, nîşaneyê vê ye lewra tewang û veqetandek mijarê zimên in. Ev kêmasî û xaleke neyînî ya van xebatan e.

3. Di rastnivîsînê de armanc ew e ku bi hin qaîdeyan, nivîsînê hêsan bike. Ji ber ku ziman zindî ye, bi demê re di bêjeyan de deng diguherin, hin bêje winda dibin û bêjeyên nû derdikevin. Di berhema Aydogan û Komxebatê de parastina koka bêjeyê, tewandina navên zimanan, tewandina bêjeyên wek “botan”, “şêxan”, tewandina paşnavên kesan ew xal in ku xwendinê zor dikin. Bi vê em dikarin bibêjin ku armancên rastnivîsînê li ber çavan nehatine giritin.

Di zimannasiyê de bi navê “qanûna hewldana kêmtirîn” rêbazek heye ku dibêje ziman her tim li aliyê sivikayiyê ye û li gor wê bêje çawa rehet e wisa tê gotin. Bo nimûne, herçiqasî li gor rêzimanê di raveka “Feqiyê Teyran” de “an” pirtika tewanga pirhejmar be û divê bê nivîsîn jî gel, “n”yê diavêje û bi awayê “Feqiyê Teyra” dibêje. An jî “min”, weke “mi” bi lêv dike. Lê berhemên mijara xebatê (Aydogan, Komxebat) “î”yekê jî pê ve dikin. Ev jî nîşanek e ku ziman ber bi zorkirinê ve hatiye birin.

4. Encameke din ji xebata me tevliheviya termînolojiya rêzimanê/zimannasiyê ye. Termînolojiyeke hevpar hêj nehatiye pejirandin û avakirin. Di warê termînolojiyê de her kes li gor zanîna xwe navlêkirinan dike û bi kar tîne. Ev

jî serê xwendevanan pir diêşîne. Bêjeyeke ku duh hatiye bikaranîn tu dibîne îro bi navekî din hatiye bikaranîn. Bo nimûne bêjeya “gergûhêz” bi awayekî rûniştibû. Nexasim piştî perwerdehiya bi kurdî li zanîngehan. Li awayê îro di cihê wê de “têper” tê bikaranîn.

Herweha tê dîtin ku Aydogan bo “affix”ê “pirtik”, Komxebatê “gire”, Zêrevan bo “suffix”ê gotiye “parkît” û di cihê “affix”ê de jî bi kar aniye. Dîsa ev jî mînakeke bo zelalkirina tevliheviya termînolojiyê.

5. Di xebata me de herweha encameke wisa jî diyar e. Herçiqasî Komxebatê di pêşgotinê de gotibe me rêbera Aydogan bingeh girtiye jî, rewş zêdetirî wê ye. “Rêbera Rastnivîsînê” ya Komxebatê bi pêşgotinê, bi hejmar û rêzimana beşan, bi ravekirin û mînakan ji her alî ve weke kopyayeke “Rêbera Rastnivîsînê” ya Mistefa Aydogan e.

6. Li gel encamên jorîn yeke din jî ew e ku zimanê rojname, kovar, malpêr û kitêbên gelek weşanxaneyan û yê rêberên rastnivîsînê hevdû nagire. Loma heke armanc standardîzasyona rastnivîsîna kurmancî be, divê mîrasa kurdî ya nivîskî neyê paşguhkirin û zimanê rojname, kovar, malper û pirtûkên weşandî jî li ber çavan bê girtin.

7. Herçiqasî rewş wisa be jî mînaqeseyên li ser rastnivîsînê berdewam in. Rêberên rastnivîsînê yên Mistefa Aydogan û Komxebata Kurmanciyê encamên vê berdewamiyê ne. Kitêbên navborî ne tenê serê xwe bi rastnivîsê re diêşînin, ji wê bêhtir rêzimanê derdixin pêş û tevliheviya qadê bi vê re girêdayiye. Helbet mirov dikare derbarê rastnivîsîn û rastnivîsîna kurmancî bêhtir tiştan bêje. Lê bawerim bo ravekirina mijarê xalên diyarkirî yên herî pêwîst in ku hatin pêşkêşkirin.

Hêvîdar im di pêşerojê de kedkarên zimên bala xwe bidin van xalan û berhemên ku mijarê zelal radixînin ber çavan zêde bibin.

ÇAVKANÎ

- Akkurt, Nîzametîn, *Kurdiska Pedagogisk Centrum*, Stockholm, 2013.
- Aksan, Doğan, *Her Yöniyle Dil Ana Çizgileriyle Dilbilim*, Atatür Kültür, Dil ve Tarih Yüksek Kurumu Tür Dil Kurumu Yayınları, 3. Baskı, Ankara, 1998.
- Alan, Remezan, *Bendname*, Avesta, Çapa Yekem, Stenbol, 2009.
- Altinkılıç, Ümran, *Waneyên ziman*, Lîs, Çapa yekem, Diyarbakır, 2016.
- Aydoğan, Mistefa, *Rêbera Rastnivîsînê*, Çapa Yekem, Rûpel, İstanbul, 2012.
- Banguoğlu, Tahsin, *Türkçenin Grameri*, Türk Dil Kurumu Yayınları, 8. Baskı, Ankara, 2007.
- Baran, Bahoz, *Rêzimana Kurdî*, Çapa Yekem, Belkî, Stenbol, 2012.
- BEDIR-XAN, C.A., *Bingehên Gramêra Kurdmancî*, Hawar, Belkî, Çapa Duyem, İstanbul, 2012.
- Bedir-Han, Celadet Ali & Lescot, Roger, *Kürtçe Gramer*, Avesta, 2. Baskı, İstanbul, 2004.
- Bilbil, Mîkaîl, Bahoz Baran (Ed.), *Rêzimana Kurmancî*, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Amedê, Stenbol, 2008.
- Deumert, Ana and Vandenbussche, Wim, *Research directions in the study of language standardization*,
<https://pdfs.semanticscholar.org/ae6d/7b6d23faace417b9e485278f86e7a6b60ac7.pdf> 2019.
- Ebdulfettah, Deham, *Zimanê Kurdî/Rênivîs*, Kawa, Beyrût, 1998.
- Ferhenga D. Îzolî, *Ermenî*, Deng, Çapa 8'an, Stenbol, 2013.
- Jaferzadeh, Mehdî, *Analîza Kurmanciya Deregeza Xorasanê li gor Hêmanên Zimannasiyê*, Yüksek Lisans Tezi, Mardin Artuklu Üniversitesi, Yaşayan Diller Enstitüsü, Mardin, 2017.

- Kıran, Zeynel & Eziler Kıran, Ayşe, *Dilbilime Giriş*, Seçkin Yayınları, 5. Baskı, Ankara, 2018.
- Kıran, Zeynel, *Dilbilim Akımları*, Onur Yayınları, 2. Baskı, Ankara, 1996.
- Komxebata Kurmancîyê, *Rêbera Rastnivîsînê*, Weqfa Mezopotamyayê, Stenbol, 2019.
- Mehmed, Osman, *Gulûcinûkavil*, Avesta, Çapa Yekem, Stenbol, 2002.
- Öpengin, Ergin, *Pirsên Rênivîsa Kurmancî: Pêdeçûneke Rexneyî li ser Rêbera Rastnivîsînê ya Mistefa Aydogan*, Derwaze, Hejmar 1, İstanbul, 2017.
- Özmen, Fevzi, *Dersên Hînbûna Rêziman Kurdî (Kurmancî)*, Çapa Duyem, Weşanên Înstîtûta Kurdî ji bo Lêkolîn û Zanist, Herêma Kurdistanê, 2013.
- Porzig, Walter, *Dil Denen Mucize 1*, Wergêr: Vural Ülkü, Kültür ve Turizm Bakanlığı Yayınları, 1. Baskı, Ankara, 1985.
- Saussure, Fernande de, *Genel Dilbilim Dersleri*, Wergêr: Berke Vardar, Multilingual, 1. Baskı, İstanbul, 1998.
- Seyfettin, Ömer, *Yeni Lisan*, <http://edebiyatsultani.com/yeni-lisan-makalesi-omer-seyfettin/> 2019.
- Tan, Sami, *Rêzimana Kurmancî*, Enstîtuya Kurdî, Çapa Duyem, Stenbol, 2011.
- Taş, Birahim Xelîl, *Kêşana Lêkeran bi Zaravayê Kurmancî*, Lîs, Çapa Yekem, Ankara, 2011.
- Taş, Çetin, *Waneyên Ziman û Rastnivîsîna Kurdî*, Çapa Duyem, Dîwan, Stenbol, 2013.
- Xelîl, Têmûrê, *Pêwendiyên Ermenî û Kurdî yê Zimên*, Rojnameya Kurmancî, Hejmar 41.
- Xelîl, Têmûrê, *Peyvên Kurdî û Îranî di Ermenî de*, Rojnameya Kurmancî, Hejmar 39.

Yeni Yazım Kılavuzu, Türk Dil Kurumu Yayınları, Dokuzuncu Baskı, Ankara, 1977.

Yıldırım, Kadri, *Temel Alıştırma ve Metinlerle Kürtçe Dil Bilgisi (Kurmanci Lehçesi)*, Mardin Artuklu Üniversitesi, 1. Baskı, Mardin, 2012.

Zêrevan, Arif, *Bingehên Rastnivîsandina Kurdiyê (Kirmancî)*, Çapa Yekem, Nefel, Stockholm, 1997.

Zîlan, Reşo, *Reformek Pêwîst e*, Bergeh (Kovara Siyasî, Çandî, Lêkolînî), Hejmar 1, Sweden, 1989.

Zivingî, Mela Ehmedê, *Gerdeniya Gewherî (Şerha Dîwana Melayê Cizîrî)*, cild I, Çapa Yekem, Avesta, Stembol, 2013.

T.C.
MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ
TÜRKİYE'DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANA BİLİM DALI

Yüksek Lisans Tezi

**ARIF ZÊREVAN'IN KÜRTÇE KURMANCİ LEHÇESİNİN YAZIM
TEMELLERİ VE MISTEFA AYDOĞAN İLE MEZOPOTAMYA
VAKFI İMLA KILAVUZLARI ESERLERİNİN
KARŞILAŞTIRILMASI**

Abdulsıttar ÖZMEN
13711030

Danışman:
Doç. Dr. Mustafa ÖZTÜRK

Mardin, 2019

T.C.

MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ

YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ

İNTİHAL RAPORU

Tez Başlığı : **BERAWIRDKIRINA SÊ BERHEMÊN RASTNIVÎSÎNA KURMANCÎ**

**(BINGEHÊN RASTNIVÎSÎNA KURDIYÊ YA ARIF ZÊREVAN-RÊBERA
RASTNIVÎSÎNÊ YA MISTEFA AYDOGAN-RÊBERA RASTNIVÎSÎNÊ YA
KOMXEBATA KURMANCIYÊ)**

Yukarıda başlığı gösterilen tez çalışmamın kapak sayfası, giriş, ana bölümler ve sonuç kısımlarında oluşan toplam XIV+107 sayfalık kısmına ilişkin 25/07/2019 tarihinde tez danışmanım tarafından **Turnitin** adlı intihal tespit programından aşağıda belirtilen filtrelemeler uygulanarak alınmış olan orijinallik raporuna göre, tezimin benzerlik oranı alıntılar dahil % 4

Uygulanan Filtrelemeler:

Kaynakça hariç

Alıntılar dâhil

5 Kelimeden daha az örtüşme içeren metin kısımları hariç açıklamalar

Açıklamalar: Benzerlik oranının %3'ü internet kaynakları %1 ise öğrenci ödevleridir.

Mardin Artuklu Üniversitesi **Turnitin** adlı intihal tespit programı sonucunda; azami benzerlik oranlarına göre tez çalışmamın herhangi bir intihal içermediğini; aksinin tespit edileceği muhtemel durumda doğabilecek her türlü hukuki sorumluluğu kabul ettiğimi ve yukarıda vermiş olduğum bilgilerin doğru olduğunu beyan ederim.

Adı Soyadı: Abdulsittar Özmen

Öğrenci No: 13711030

Programı: Kürt Dili ve Kültürü

Statüsü: Yüksek Lisans

Tarih ve İmza

25.07.2019

Danışman Onayı

Doç. Mustafa ÖZTÜRK

A.B.D. Başkanı Onayı

Prof. Dr. Abdurrahman ADAK